

K.T
ZANİNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YİLÊ
ENSTİTÛYA ZİMANÊN ZİNDÎ
ŞAXA MAKEZANİSTA ZİMAN Û ÇANDA KURDÎ



DÎ ROMANÊN FERHAD PÎRBAL DE ŞOPÊN BÊCÎWARÎYÊ

TEZA LÎSANS A BİLİND



AMADEKAR

Meki AĞDAL

ŞÊWİRMEND

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN - 2022

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI



**FERHAD PÎRBAL'IN ROMANLARINDA YERSİZYURTSUZLUK
İZLERİ**

YÜKSEK LİSANS TEZİ



HAZIRLAYAN

Meki AĞDAL

DANIŞMAN

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN - 2022

KABUL VE ONAY SAYFASI

..... tarafından hazırlanan “.....” adlı tez çalışması aşağıdaki jüri tarafından OY BİRLİĞİ / OY ÇOKLUĞU ile Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak kabul edilmiştir.	
Danışman: Unvanı Adı SOYADI Anabilim Dalı, Üniversite Adı Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum	
Başkan: Unvanı Adı SOYADI Anabilim Dalı, Üniversite Adı Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum	
Üye: Unvanı Adı SOYADI Anabilim Dalı, Üniversite Adı Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum	
Yedek Üye: Unvanı Adı SOYADI Anabilim Dalı, Üniversite Adı Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum	
Yedek Üye: Unvanı Adı SOYADI Anabilim Dalı, Üniversite Adı Bu tezin, kapsam ve kalite olarak Yüksek Lisans Tezi olduğunu onaylıyorum/onaylamıyorum	
Tez Savunma Tarihi:	/...../.....
Jüri tarafından kabul edilen bu tezin Yüksek Lisans Tezi olması için gerekli şartları yerine getirdiğini ve imzaların sahiplerine ait olduğunu onaylıyorum. Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü	

ETİK BEYAN SAYFASI

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü **Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;**

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Meki AĞDAL

(Teza Lîsansa Bilind)
Meki AĞDAL
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜYİLÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ
Gulan, 2022
DÎ ROMANÊN FERHAD PÎRBAL DE ŞOPÊN BÊCÎWARÎYÊ

KURTE

Gîles Deleuzeyî, yek ji navdartirîn filozofê serdema sedsala bîstemîn e ku bigel Felîks Guattarî li ser nîfşên 68an xebat û vekolînên zanistî û civakî kirine. Li gorî Deleuze felsefe hilberandina têgehane e û li dor vê peywendê têgehên wek bêcîwarî, makîneyên şer, rhîzom, makîneyên arezuyê, koçberî hwd hilberandine û li dor gelek ramyaran ev têgehe nîrxandine. Wan ev tegehane di çarçoveyekê epîstemalojîk de gehiştandine statûyekî post-modern û li ser van têgehane nîrxandinên gelek serkeftî û girîng kirine.

Ferhad Pîrbal, yek ji mezintirîn edeb, vekoler, ressam û akademîsyenekî kurd e. Li rex xebatên xwe yên akademîk û zanyarî, gelek berhemên edebî û hûnerî jî li lîteratûra kurdî ya nivîskî zêde kirîye. Pîrbal, berhemên xwe yên edebî pîranin li ser temayên wek koçberî, mişextî, penabertîyê hûnandine û bigel van jî pîrsgirekên civakî û takekesî navenda berhemên wî de cihekî girîng digire. Di berhemên xwe de bi wêrekî karîye hemû otorîteyên totalîter, hişkebawerîyên takekesan rexne bike û rêyeke alternatîfî nîşan bide.

Ji ber ku xebata me li ser romanên Ferhad Pîrbal bûn û roman jî çejnekê nû edeba modern e. Me hem wek çejneke nû roman û hem jî cihê romanê di ebebîyata kurdî de nîrxand. Li dor lêkolînên me jî di edebîyata kurdî de agahîyên me li ser edebîyata mişextîyê civîyan.

Di vê xebatê de me hewld da em li dor felsefeya Deleuzyen, berhemên Ferhad Pîrbal yên edebî binîrxînin. Her wiha me mijarên ku îro wek pîrsgirekên sedsala bîst û yekemîn têne qebulkirin penabertî, penaxwazî, koçberî, mişextî, bêcîwarî hem di çarçoveya civakî û ontolojîk de hem jî di çarçoveya Deleuzyen de

nirxand. Di beşa duyemîn de jî me li ronîya van agahîyan de çarçoveya Deleuzyen de şopên bêcîwarîyê li ser karakterên romanên Pîrbal ve eşkera kirine.

Peyvên Sereke: Gilles Deleuze, Bêcîwarî, Koçberî, Ferhad Pîrbal, Mişextî.

Hejmara Rûpelan: VI + 107

Şêwimend: Doç. Dr. Nesîm SÖNMEZ



(Yüksek Lisans Tezi)
Mekî AĞDAL
VAN YÜZÜNCÜYIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

2022

**FERHAD PİRBAL'IN ROMANLARINDA YERSİZYURTSUZLUK
İZLERİ**

ÖZET

20. yüzyılın önemli filozoflarından olan Gilles Deleuze, Felix Guattari ile birlikte özellikle 68 kuşağı üzerine yaptıkları önemli çalışmalarıyla günümüzde adlarından söz ettirmektedirler. Deleuze'ye göre felsefe kavram üretme sanatıdır ve bu çerçevede yersizyurtsuzluk, rizom, savaş makineleri, arzu makineleri, göçebelik gibi kavramları türetmiş ve birçok yazar, filozof ve edebî eser ekseninde bu kavramlar üzerine çalışmışlardır. Deleuze ve Guattari, bu kavramları epistemolojik bir düzlemde post-modern bir statüye kavuşturmuştur.

Ferhad Pirbal, büyük bir kürt ressam, araştırmacı akademisyen, ve Edibidir. Akademik ve bilimsel çalışmalarının yanı sıra edebî eserleriyle Kürt yazılı edebiyatına büyük katkılar sunmuştur. Pirbal edebi eserlerinde genellikle, mültecilik, göçebelik, sürgünlük temaları üzerinde durmuştur. Bunun yanı sıra edebi eserlerinin içeriği toplumsal ve kişisel sorunlar açısından önemli bilgiler sunmaktadır. Eserlerinde her türlü totaliter otoriteleri ve kişisel bağınazlıkları cesurca eleştirebilmiş ve bunlara alternatif yollar gösterebilmiştir.

Ferhad Pirbal'ın romanları çalışmamızın ana eksenini oluşturduğundan ve roman türü de modern edebiyatın yeni bir türü olduğundan; yeni bir edebî tür olarak romanı ve romanın kürt edebiyatındaki yeri hakkında bilgiler sunmaya çalıştık. Araştırmamız ekseninde romanın kürt edebiyatındaki yeri, sürgün edebiyatında birleşti.

Bu çalışmamızda, Ferhad Pirbal'ın romanlarını Deleuzyen felesefesî çerçevesinde değerlendirmeye çalıştık. Bunun yanında günümüzün büyük sorunları arasında kabul edilen mültecilik, iltica, göçebelik, sürgün ve

yersizyurtsuzluk olgularını ontolojik ve Deleuzyen bir çerçevede irdelemeye gayret ettik. Çalışmamızın ikinci kısmında ise bu bilgiler ışığında Pîrbal'ın roman karakterlerinde Deleuzyen bir çerçevede yersizyurtsuzluğun izlerini bulmaya çalıştık.

Anahtar Kelimeler: Gilles Deleuze, Yersizyurtsuzluk, Göçebelik, Sürgün, Ferhad Pirbal.

Sayfa Sayısı: VIII +107

Danışman: Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ



(M.Sc. Thesis)
Meki AĞDAL
VAN YÜZÜNCÜYIL UNİVERSTY
İNSTUTİTE OF LİVİNG LANGUAGES
MAY, 2022
TRACES OF DETERRİTORİALİZATİON İN FERHAD PİRBAL’S
NOVELS

ABSTRACT

Gilles Deleuze, one of the important philosophers of the 20th century, is known today with his important studies, together with Felix Guattari, on the 68 generation. According to Deleuze, philosophy is the art of producing concepts, and in this context, they coined such concepts as homelessness, rhizome, war machines, desire machines, nomadism and many writers, philosophers and literary works have worked on these concepts. Deleuze and Guattari have given these concepts a post-modern status on an epistemological level.

Ferhad Pirbal is a great Kurdish painter, academic researcher, and writer. In addition to his academic and scientific studies, he made great contributions to Kurdish written literature with his literary works. In his literary works, Pirbal generally focused on the themes of refugee, nomadism and exile. In addition, the content of his literary works presents important information in terms of social and personal problems. In his works, he was able to boldly criticize all kinds of totalitarian authorities and personal bigotry and show alternative ways to them.

Since Ferhad Pirbal's novels constitute the main focus of our study and the novel genre is a new genre of modern literature; we tried to present information about the novel as a new literary genre and its place in Kurdish literature. In the context of our study, the place of the novel in Kurdish literature was united in exile literature.

In this study, we tried to evaluate Ferhad Pirbal's novels within the framework of Deleuzian philosophy. In addition, we have tried to examine the phenomena of refugee, asylum, nomadism, exile and homelessness, which are

considered among the major problems of today, in an ontological and Deleuzian framework. In the second part of our study, we tried to find the traces of deterritorialization in Pîrbal's novel characters in the light of this information.

Keywords: Gilles Deleuze, Deterritorialization, Nomadism, Ferhat Pirbal, Exile.

Quantity of Page: X +107

Supervizor: Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ



Naverok	
KURTE	V
ÖZET	VII
ABSTRACT	IX
KURTEBÊJE	XIII
DESTPÊK	1
Mijar	2
Armanç	2
Girîngîya Vekolînê	3
Sînorên Vêkolînê	3
Rêbaz	3
1. BÊCÎWARÎ	5
1.1. Edebîyata Mînor	6
1.1.1. Bêcîwarbûna Zimên.	7
1.1.2. Polîtîkbûna Kirdeyê.....	9
1.1.3. Nasnameya Kollektîv	12
1.2. Xetên Revê	13
1.3. Bîcîwarbûn	15
1.4. Di Peywenda Felsefeya Deleuzîyen de Bêcîwarî.	19
1.5. Koç	22
1.5.1 Penaber, Penaxwaz, Koçber.	32
1.6. Mişextî.	34
1.6.1. Mişextîya Rewşenbîr.....	37
1.6.2. Edebîyata Mişextîyê.	42
2. WEK CUREYEKÎ EDEBÎ: ROMAN	50
2.1. Di Edebîyata Kurdî de Cihê Romanê:	55
2.2. Jiyana Ferhad Pîrbalî.	60
2.2.1. Berhemên Wî	61
2.3. Di Romanên Ferhad Pîrbal De Şopên Bêcîwarîyê.	63
2.4. Hotel Europa.	63
2.4.1. Di Romanê de Şopên Bêcîwarîyê.	65
2.5. Santiago Del Compestelo.	79
2.5.1. Di Romanê Şopên Bêcîwarîyê.	80

2.6. Ekan.....	84
2.6.1. Di Romanê de Şopên Bêcîwarîyê.....	85
2.7. Heft Wêney Rûtî Jînî Cenabî Wezîr.....	88
2.7.1. Di Romanê de Şopên Bêcîwarîyê.....	89
2.8. Penaberek Fransî li Kurdistanê.....	91
2.8.1. Di Romanê Şopên Bêcîwarîyê.....	93
ENCAM.....	96
ÇAVKANÎ.....	100



KURTEBÊJE

HWD.	HER WEKÎ DÎN
H.	HEJMAR
NQL.	NEQÎL
ÛYND.	Û YÊN DÎN
R.	RÛPEL
SS.	SEDSAL
S.S	RÛPÊLÊN
B.Z	BERÎYA ZAYÎNÊ
KBPNY	KOMÎSYONA BÎLÎND YA PENABERAN YA NETEWEYÊN YEKBÛYÎ
U.N	UNITED NATIONAL (NETEWEYÊN YEKBÛYÎ)

PÊŞGOTÎN

Ferhad Pîrbal di sala 1961an de li Hewlêrê ji dayîkbûye. Bi kesayetîya xwe cihêrengî, li ser qada kurdnasî û edebîyata kurdî gelek xebatên hêja û girîng kirîye. Pîrbal niha jî xebat û lêkolînên xwe yên akademîk û afirandina berhemên edebî berdewam dike.

Ev xebata me ya bi navê “Di Romanên Ferhad Pîrbal de Şopên Bêcîwarîyê” hewl daye xebatekî din li qada xebatên kurdnasî û Edebîyata Kurdî zêde bike. Bi vê xebatê, em armanc dikin ku di çarçoveyekî Deleuzyenî de romanên Pîrbal binirxînin û şopên têgehên Deleuze û Guattari nemaze bêcîwarîyê di van romanên de diyar bikin.

Bi mijarê ra eleqeder berîyê me romanên Ferhad Pîrbal paşî jî bi taybetî berhemên Deleuze û Guattari ber dest kirin. Paşî li dor pêdivîyên xebata xwe bi şîretên şewirmendê xwe, çî pirtûk, gotar, nivîs hebin me arşîva van berheman yên bi xebata me ra têkildar arşîva wan çêkir. Disa bi rêberîya şewirmendê xwe, bi xwendina van berhemên mijarê ra têkildar me agahî û xetên xwe diyar kirin. Xebata me ji “destpêk”, “beşa yekem”, “beşa duyem” û ji “encame” pêk tê.

Di “destpêkê” de me, bi awayekî sade û kurt bêcîwarî û çêkerên têgeha bêcîwarîyê anîye ziman. Her wiha bêtî em nekevîne hûrgilîyên xebata xwe me “sedema vekolîna tezê”, “gîrîngîya tezê”, “sînoren tezê û gîrîngîyên tezê” diyar kirine. Di beşa yekem de em di peywenda modernîteya kapîtalîst de li ser bêcîwarîyê sekinîne. Çendîn jî destê me hat em li ser teorîyên Deleuze û Guattari sekinîn û li dor vê hêlê da em li ser “edebîyata mînor” jî rawestin. Bi dû edebîyata mînor me bal kişande li ser “koç û koçberîyê” ku ev yek jî di felsefeya Deleuzeyî de bi gel bêcîwarîyê gelek hatîye vegotin. Me peywendîyên navbera koç û koçberîyê têgehên penaber, penaxwaz û koçberê zelal kirin da ku nirxandina romanên de em cîyewazîya karakteran baştir bînin ziman. Li dû vê di beşa yekemîn de mişextî û mişextîya rewşenbîrî bi hurgilî hatîye vegotin. Di vê deqê me pêwîstîyekê ravekirina edebîyata mişextîyê jî dît û me agahîyên derheqê edebîyata mişextîyê de jî vegotine. Di beşa “duyem” de berî li pey ketina şopen bêcîwarîyê me, li ser roman û romana kurdî bi awayekî kurt çend agahî û şîrove

dan. Piştî van jî bi rêze ve di romanên Ferhad Pîrbal de li ser karakter û nivîskarî ketine pey şopên bêcîwarîyê.

Li vir, di serî de ez spasîyên xwe ji şêwirmendê xwe Doç. Dr. Nesîm SÖNMEZ ra dikim ku ji destpêka xebatê heya dawîyê piştgirî û zanînên xwe li ber min negirt. Û di proseya amadekirina tezê bi bêhnfirehî û dilovanî kêmasîyên min dîyar kirin û rê li ber min vekir. Her wiha spasîyên mamosteyê Hîndekar Hacı YILMAZ ra dikim ku çavkanîyên xwe ji min ra vekir û di serdema dersan de min gelek sûd jê wergirt. Ji bo Felemez BOZKURT û Nacî ERDAŞ re spasîyên xwe dikim.

Dixwazim xalekî taybet ji bo cihwarê ku min li wir tez nivîsandî “SACES LANGUAGE HOUSE” ra vekim ku wan jî ji destpêka xebatê heya dawîya xebatê cih ji min ra vekirin û bi mêvanperwerî ez li kursê hebandin. Her wiha ji Mamostê min î ingîlîzî Orhan AYNA, Metîn DEMİRAĞAÇ û gerînendeyê kursê Cemal GÖKÇE ra sipasîyên herî ji dil dikim.

Ez vê tezê dîyarîyê dayîka xwe Feyrûze Siltanê dikem ku çi kesê hindê wê qehra min nekêşaye.

Meki AĞDAL

VAN-2022

DESTPÊK

Bêcîwarbûn çi ye? Çi taybetîyên mirovên bêcîwar hene? Mirovên li sikakan dijîn gelo bêcîwar in? Kesên bê mal û bê hal, dibin bêcîwar? Ger em wek tegeheka morfolojîk li bêcîwarbûnê binihêrin em ê kêr zêde bersiva van pirsên xwe bibînin. Mirovek bê cî û bê war. Di wateya xwe ya rastîn û peyvî de, dihête wateya miroveke bê mesken û bê cî. Mirovek ku stareka wîlê nîne û miroveke kuçeger. Li gorî Arslan Topakkaya “Mirovek ku stareka wêlê heye û mukîm e; yanê li cihekê, li derekê runiştîye. Bi kurtasî mirovên girêdayê kokê xwe ne û li cih û warê xwe kok berdayî xwedî cih û warekê ne jî dibin bicîwar. Bêcîwarbûn jî dijberê van e.” (Topakkaya, 2018:67). Ev wateya Topakkayayî li vê têgehê barkirî di peywendekî şênber de bi me, wateya mişextîyê, ji welêt dûrbûnê rave dike. “Bêcîwarbûn arezûya malê gûr dike û arezûya bê dawî ya vegeerîna li ser kokên windayî ji nû ve diafirîne, ji nû ve bi dayikê ra dibe yekpare, vegera li ser destpêkê”. (nql. Galip, 2014:144. Hall, 1992:236) Lê bêcîwarbûn bi me, têgehekî ne bi tenê bi gel mişextî, koçberî û ji welêt û kokan dûrbûnê ve girêdayî ye. Rewşeke derûnî ye û bi gel psîkanalîzê û dorhêla kompleksa Odîpûsê ya Deleuze û Guattarî de jî çerx dizivire. Mirovekî li mala xwe de jî be dibe ku bêcîwar be. Lewra bêcîwarî; têgeha cîhûwarê jî di xwe da dihevine û cîhûwar jî bi me, ne bi tenê peywendekê şênber e. Cih û war dibe ku bibe mekanekî hiş û derhişê merivan de jî. Em ê van hevok û daneyên xwe di beşên pêş me de bi teferuhatan ve binirxînin û bînin ziman.

Di prosesa lêkolînan de me dît ku bêcîwarbûn, têgehekî bigel postmodernîzmê derketîye pêşîya me û bi aqilmendîya postmodern ve geştiye statûyek têgehî. “Merhaleya kapîtalîzmê ya îro, pergala hilberandinê û aboriya kadîbûyî, bi rêya ji nû ve înşakirina bajar û cihwaran de bandora xwe li ser jîyana mirovan ya rojane de dide hîskirin”. (Berber 2010:143). Ev hevok me rasterast dibete bandora kapîtalîzmê ya li ser mekan û cihwaran. Di vê peywendê de jî em dikarin bibêjin sermayeya vê sedsalê ku li ser mekanan dişuxile; wan diguherîne û vediguherîne; bigel van, bandora vê jî li ser takekesan û civakan rû dide. Yanî em dikarin bibêjin ku kapîtalîzm di vê serdemê da ji bo berdwama heyîna xwe, avahîya mewcûd belav dike û bêcîwar dike, di nava pergala xwe de takekesan ji

nû ve bicîwar dike. Ger bi gotineke din bibêjin, nîrxên serdema post-modern, têne bêkokîkirin û di nava pergalê de ji bo berdewamîya kapîtalîzmê ji nû ve li gorî pergalê têne bicîkirin.

Ji destpêka şoreşa endîstrîyel ve hem di jîyana rojana de hem jî di gelek qadên din de pêşketinên gelek mezin çêbûne. Her weha van pêşketin û guherînan xwe di edebîyatê de jî daye nîşan. Her ku em di edebîyatê de destpêka çejna romanê bigel Don Kişot ve biden jî em dikarin vejîna romanê bi gel belavbûna împeratoriyan bidene destpêkirin. Piştî şoreşa endîstûrîyê wekî gelek mîletên din, kurdan jî ev çejna nû di edebîyata xwe hebandin û bi vê cejnê gelek berhemîn dan. Ferhad Pîrbal jî yek ji van nivîskaran e ku di salên dawîn de romanên xwe li dor temayên wek koçberî, penaberî, pîrsgirekên penaberan ve hûnandî derxistine. Di romanên xwe de li gel problemên koçberî skruktura civaka ewropayê û di şexsê karakterên romanên xwe de taybetîyên rojhilat bi awayekî serketî anîye ziman.

Mijar

Bê guman wekî ya gelên din, mîletê Kurd jî di warê edebîyatê bi çejna romanê gelek berhemên taybet û serkeftî dane. Ji ber ku îro roman, çejna rewacê de ye ji aliyê gelek nivîskaran ji bo ragihandina fikr û ramanan, îdeolojî û bûyeran tê tercîh kirin. Ji ber ku di romanên de em dikarin li rastê her cure tiştan bîn ji aliyê xwîneran ve jî ev celeb gelek tê tercîhkirin. Di romanên Ferhad Pîrbal de jî pîrsgirekên takekesî yên penaberan û koçberan mijarên sereke ne. Ji bo ku em van pîrsgirekan sereke ya sed sala me bigehînine çarçoveyekê akademîk me têkildarê vê babeta xwe mijara xwe kire “Di Romanên Ferhad Pîrbal de Şopên Bêcîwarîyê”

Armanc

Xebata me di Romanên Ferhad Pîrbal de Şopên Bêcîwarîyê vedikole. Bêcîwarî ji ber ku têgehekî gelek berfireh û bi gel têgehên wek penaber, koçber, şer peywendîyekî xurt heye. Me bi vê xebatê armanc kir ku sedemên koçberî û encamên wê hem bi takekesî hem jî civakî bigehînin çarçoveyekî zanistî. Di vir de bi gel vê armancê em ê sedemên tundîya li hemberî koçber û penaberan dîyar bikin û dîtina çarenûsa vê yekê armanc bikin. Her weha têkildarê babeta me,

bêcîwarî xetên wek azadbûn û serwerîya takekesî vedigire hêvî dîkin bibe rêgezek.

Girîngîya Vekolînê

Her weha weha dîyar e ku ji şixulîna sedsala 21. yekemîn sedsala penaber û koçberan e. Ev maweynê em tê de dijîn ji ber ku gelek bûyerên kaotîk di xwe de dihevine bûye sehneya gelek bûyerên trajîk jî. Yek ji van trajedîyên mirovan jî trajedîyên koçber û penaberan e. Di vê vekolînê de ji ber ku me ev trajedîyên mirovahîyê bigel sedem û encamên wan ve nixandî ev xebata me dê ji bo çareserîya van bûyerên giran ra bibe rêgezekî akademîk û zanistî. Her weha lîteratûra Edebîyata Kurdî de heya niha xebatekî bi vê hawî nehatîye çêkirin dê ev vekolîna me bibe çirûskekî ewilî û ji bo xebatên peyrevên xwe bibe mînak.

Sînorên Vêkolînê

Me romanên Ferhad Pîrbal yê ku van bîst salên borî de nivîsîndine şopên bêcîwarîyê pêşkêş kir. Di vir de sînorên lêkolînê me her pênc romanên wî bûn. Ji ber ku bêcîwarî têgehekî berfireh û ji şîroveyên cihêreng ra vekirîye me sînorên lêkolîna xwe di çarçoveya Deleuze û Guattarîyê de dîyar kir û em li ser Deleuze û Guattarî nêzê lêkolîna xwe bûn.. Lê di naveroka lêkolînê de jî dê dîyar be ku Bêcîwarî ji ber ku têgehekî post-modern e bi gel psîkanalîzê, bi gel koçberîyê ve jî eleqedar bû me ev mijare jî kirine nava lêkolîna xwe. Bi taybetî di beşa duyem de me bi tenê bi vê çarçoveya Deleuzyen de analîzên berheman kir. Lê ji ber ku temayên berheman piranîn li dor jîyana penabertî û koçberîyê hatibûne hîlbijartin me gelek têgehên penatîyê jî rave kirine.

Rêbaz

Me wek rêbaz her pênc romanên Ferhad Pîrbal ji serî heta binî xwendin. Pê ra me tema û rêzebûyerên berheman tespît kirin. Bi gel vê me pasajên ku romanê de li dor bêcîwarîya Deleuze de , nixandî. Me bi tenê pasajên ku li dor van deqan hîlbijartin bi tenê cih da wan.

Di vekolîn û dahûnera me de pênc romanên wek bi navê *Heft Wêneyî Rûti Jinî Cenabî Wezîr, Ekan, Penaberekî Fransî Li Kurdistanê, Santiago De Compestela, Hotêl Europe* Ferhad Pîrbal ku ji Weşanên Avestayê di salên ji hev cihê de deketine me wek çavkanî bo xwe girtin. Ji bo cihêkirina berhemên di heman salan de hatine çapkirin me tîpên (a,b,c) danîne. Di akademîya tirkî de gelek makale û pirtûk li ser Deleuze û Guattari hatine nivîsandin û hema hema hemû pirtûk û xebatên Deleuze jî bo tirkî hatine wergêrandin. Me piranîya van çavakanîyan jî xwend. Her weha me ji wan jî sûdwegirt lê ji bo Deleuze û têgehên wî çavkanîya me ya sereke kovara *Toplumbîlim Deleuze Özel Sayısı* (1996) bû. Her weha me, rêbaza nîrxandina metnên edebî ji aliyê bêcîwarîyê ji pirtûka Deleuze û Guattari ya ji weşanên Dadalusê 2015an de derketî ya bi navê *Kafka: Minor Bir Edebîyat İçin* wergirt.

Her weha ji bo nivîsandina vê xebatê *Rebêra Rastnivîsê* ya Weşanên Weqfa Mezopotamyayê referans girt.

1. BÊCÎWARÎ

Em ê di vê beşa xebata xwe de li ser bêcîwarîyê rawestî û di çarçoveyekê zanistî de bêcîwarbûn û proseya bêcîwarîyê bînin ziman. Her weha ji ber ku bêcîwarî têgehekî berbelav û bi têgehên wek koçberî, mişextîyê ve têkildar e em ê van têgehan jî di bin çend serenavan de bigehînine çarçoveyekî zanîstî. Ji bir ku tegeha bêcîwarîyê têgehekî Deleuzyen e, em ê di peywenda felsefeya Deleuzyenî de vê têgehê û babetên têkildarê tegeha xwe binirxînin.

“Hereketa bêcîwarkirinê ya mezin bigel bikodkirina hişmendîya dewleta despot ve derketîye holê. Lê ev hereketa bêcîwarkirinê bikodkirina bizavan û çêbûna hereketên nû, li hemberî pêla nû ya bicîwarîyê wek dilopekî biçûk maye”. (Deleuze û Guattari, 1996:81). Yanî li hemberî kodkirinê dewletê û kapîtalîzmê bizavên bê kod û kod nexwaz çêbûne. Ev bizavên, bi bêkodbûnê xwe, bi sînor nenasîyên xwe dewled û sermayeyê bêkod kirine. Di vir de em bigel tegeha “bi kodkirinê” pîvanên ji mirovan ra, ji pergala ra hatine çêkirin tînin ziman. Lewra sermayeya kapîtalîst de divê her tişt li cihê xwe û di raya xwe de be. Ev yek jî mirovên wek makîneyên bi rêkûpêkî dişuxilin tîne bîra me. Bi vê yekê jî kontrolkirina her tiştê hêsanîr dibe û kapîtalîzm heyîna xwe xurttir dike û bi hêztir dibe. Li gorî Deleuzeyî bêcîwarî mîna tevgerên sermayeyê li ciheke asê namîne û ji pêvajoyeke heyînîyê ya dînamîk tê. Yanî ew pirjimarîyek e ku di nava nasnameya xwe ya domînant de bicîhkirina ya din e. “Bi yek zimanî jî rewşa du zimanîbûn e. Bêyî darê zorê di nav bizaveke herikbar de derdikeve holê”. (Deleuze, 2005:36). Yanî rewşeka wisa ye ku serdestî û navendparezî tê da nîne. Em dikarin vê danasîna Deleuzeyî ligel navend-mirovî, navend-takekesî binirxînin. Yanî bêcîwarbûn têgehek e ku rewşa azadî û nirxdayîna mirovan rave dike û heyîna mirovan li hemberê pergalên totalîter û kedmij diparêze û wan jî van pergalên otorîter dûr dixê, heyîneke azad bexşê mirovan dike. Li ser van gotinên me, divê bêcîwarî wek mekanîzmeyeke zîndewar neyê fêmkirin. Mirov piştî bikeve nava pêvajoya vê mekanîzmayê, pêvajoyeke wisa dest pê dike ku mirovan azad û parastî dike. Lewra bêcîwarî li dijî serdestîyê parastin û çêkirina mînorîteyê ye. Di vir de em qesta jî nû ve çêkirin û afirandîneka kêmnîyeyê nake. Mebesta jî vê gotinê, kêmnîyên hatinê bi kodkirin û bi cîhkirin xwe bi rêya bêcîwarbûnê dikarin jî nû ve biafirînin û taybetîyên xwe yê civakî, şexsî,

zimanî, nasnameyî bi rêya bêcîwarbûnê bi dest bixin. Ji nû ve destxistina van taybetîyan de bi gelek hêmanên bêcîwarîyê hene ku vê proseyê didene destpêkirin; bo mînak bi xetên revê, bi derketina derveyê otorîteyê û bi edebîyatekî bêcîwar. Di vê peywendê de em dixwazin edebîyata bêcîwarîyê, yanî edebîyata mînor bînin ziman.

1.1. Edebîyata Mînor

“Di sedsala 19. de piştî belavbûna împêratoriyan bigel têgeha netewewletan têgeheka bi navê edebîyata netewî jî derketîye. Edebîyatên netewî ku bi zimanê netewî ve hatîye peçavtin zimanê kêmnîyan red kirîye.”(Kaplan, 2019:1). Edebîyatên, li dor hişmendîya nijadperwerîyê hatine çêkirin heya xwe li ser înkâr û redkirina edebîyat û zimanê kêmnîyan ve domandine. Bi rêya înkarkirina edebîyata kêmnîyan ve zimanê kêmnîyan jî hatîye red kirin. Yanî edebîyatên serdest û netewî, edebîyata kêmnîyan bi rêya înkârê bêcîwar kirîye û bi vê awayî jî xwe, bicîwar bûye.

Di vir de em dixwazin peywendê navbera ziman û bêcîwarîyê binirxînin û çawanîya bêcîwarbûna zimên, di çarçoveya edebîyata mînor de parve biken. Deleuze û Guattarî gelek caran xeta bêcîwarîyê ya ku ber neguherîyên zimên ve hatine daxistin bi têgeha “edebîyata mînor” ve rave kirine. Deleuze û Guattarî ev têgeh bi tehlîlên xwe yên dorhêla ramyarîya xwe de li ser Franz Kafka bi teferuhat rave kirine. Têgeha “mînor” yek ji têgehên Deleuze û Guattarî ye ku ji destpêka nivê ss.20. heya niha bandorê nîqaşên li ser filozofîyê û edebîyatê dike.

Minor, wateya major nebûne radigire. Bi wateya sade ve em dikarin wek kêmnîyê jî biden. Yanî di heman demê de cihêbûn e; dijraberbûna kanonên pergala zimên û fikran e. Deleuze û Guattarî ji bo edebîyata mînor dibêjin “Edebîyata mînor, ji edebîyata zimanê kêmnîyekê zêdetir; edebîyata kêmnîyekê ye ku bi zimanê majorî çêkirine.” (Deleuze û Guattarî, 2015: 45). “Mînorî û majorî bi çendanîyê re têkildar nîne. Komeke biçûk dibe ku major be û ji alê çendanîyê ve komeke mezin dibe ku mînor be yanî çareserkirina vê algorîtmaya bi çendanîyê ra ne têkildar bi kanonê ve girêdayî ye.” (Kılıç, 2021:269). Deleuze û Guattarî balê dikêşin li ser sê taybetîyên edebîyata mînor. Ev her sê taybetîyên

edebîyata mînor jî ev in: “bêcîwarbûna zimên, polîtîkbûna zimanê edebîyata mînor û ragirtina nasnameyeka kollektîv e.” (Deleuze û Guattari, 2015:49).

Edebîyata mînor, bê hemdî, bi pratîkên marjînal û nelihev li hemberî majorîteyê, hilberandina makîneyên şer îfade dike. “Ev hilberandina dirînde û bêcîwarkirina peywendîyan, afirandina bêcîwarî, vektorên hêzê, xetên revê û polîtîkîyên nû ne”.(Kara, 2019:272). Yanî edebîyata mînor çav nadete modelên nişteci; îddaya nûnertîya van modelan jî nake. Di halê hazir de tiştê ku pergala haj pê nîne hildiberîne. Yanî bi tenê berhemekî nadete kanonekê di heman demê de wê kanonê xirab dike, pergala kanonê cih de dihejîne û li ser kevneşopîya rûniştî; çand, ziman, nasname, liv û tevgerên mînorîteyê bicî dike. Ji ber vê jî edebîyata mînor metaforên runiştî napejirîne û li hemberî sembolîzmê ye li şûna van metaforan metamorfozan diafirîne. Yanê mijarên ji rêzê, temayên klîşe di edebîyata mînor de nîne lewra edebîyata mînor bi xwe fonksîyonekî li gorî kanonê marjînal hildibijêre û bi rexnekirina wê kanonê edebîyata major û avahîya major bilav dike. Ev yek jî di berhemên Franz Kafka de gelek têne ber me (Deleuze û Guattari, 2015:56). Pekî çî ye nivîskaran an jî hûnermendan teşvîqê edebîyata mînor dike? Li gorî me, edebîyata mînor, di edebîyata major de xwesteka dîtina pêşveneçûyîya xwe, devoka xwe ya taşrayî û cîhana xwe ya sêyemîn e. Nivîskar ji bo ku van hêmanên xwe bibîne, bide nasîn û bicîwar bike; bigehînite statûyekî, edebîyata mînor ji xwe ra dike wesaît.

1.1.1.Bêcîwarbûna Zimên.

“Yekem taybetîya edebîyata mînor ku Deleuze û Guattari di pirtûka *Bîn Yayla* de pêşxistine bêcîwarbûna zimên e” (Guattari û Deleuze, 1990:29). Yanî berî her tiştê edebîyata mînor zimên bêcîwar dike. Ger em bi bergeheka Deleuzyenî li bêcîwarbûnê binihêrin di vê peywendê de em dikarin bibêjin ku çêkirina zimanekê ye. An jî xeteka nû ye bo zimên. Pekî kî kê çawa bêcîwar dike? Gelo zimanê majorîteyê zimanê mînorîteyê bêcîwar dike an rewş bereksê vê ye? Li ser vê têgeha edebîyata mînor Deleuze yek ji nivîskarên Anglo-Sakson li ser Lawrance mînameke weha dide: “Lawranceyê zimanê wî yê edebî ku îngîlîzî ye di nava xeta xwe ya revê de ton û dengên erebî têxe nav zimanê xwe û wê bi kokên wê ve diqetîne û bêcîwar dike.”(Akay, 1996b:20). Em di vê mînakê de dibînin ku

Lawrenceye ku zimanê wî yê domînat îngîlîzî ye di nava tekst û zimanê xwe de cih dide zimanê erebî û zimanê xwe ji kokên xwe diqetîne û bi vê hawî jî edebîyateke mînor diafirîne. Yanî di nava nasnameya xwe û zimanê xwe yê domînant de cih dide tişteke kêmnê. Niha ji derveyê çêbûnên dîrokî em dikarin bêcîwarbûnê di peywenda edebîyat an jî hûnerê de bifikirin. Ev yek jî bi mînakên Deleuze yên li ser edîbên ku xeta xwe ya revê an ku ya bêcîwarîyê çêkirine çetir e. Zimanê gelek zimanekî çêkirî û dijberê zimanê wan yê standart û domînant e. Sentaks û rêzepeyvên zimanê xwe yê domînant perçe perçe diken û ji nû ve diafirînin. Yanî edîbên ku xeta bêcîwarîya xwe çêdiken gelekê wan du an jî sê zimanî ne. Kafka di nameyekê xwe yê ji Max Brodî re nivîsandî de sê negengazîyên cihûyên bi elmanî dinivîsin weha tîne ziman: “Negengazîya nivîsandina bi elmanî, negengazîya nenivîsandinê û ji van cîyewaz negengazîya nivîsandinê.” (Bogue, 1996: 126). Di vê nameya Kafkayî de em tê derînin ku cihûyên Pragê di navbera çend zimanan de mane lê di yekê de jî xwe di mala xwe de hest pê nekirine. Makaleya Ronald Bogue ku alê Nazlîm Arıca yê ve hatîye wergerandin ya Kovara *ToplumBilim* (1996) de di derheqê elmanîya Pragê de weha dibêje:

“Xelet bikaranîna daçekan: li şuna “daran denken” bikaranîna “darauf denken”; xelet bikaranîna cînavan: li şuna “spielen” bikaranîna “sich spielen”; ji bo gelek têgehan bikaranîna yek lêkerê: lêkera “geben” hem fonksîyona xistin, sazîkirin, cîhîkirin, rakirinê bi kar anîn.” (Bogue, 1996:126).

Kafka zimanê elmanî ku zimanê wî yê major e; bi emilandînekî mînorî, rê li ber lalkirin û nalîna wê zimanî vedike bi vê hawî jî ji wê zimanê major girînan, qêrînan, kirpandinan derdixe. “Yanê zimanê mînor bi zorê, zimanê major ber tişteke din vediguherîne û wê bêcîwar dike.” (Guattari û Deleuze, 1990:104). Ji senteza van her du zimanan jî zimanekî nû û edebîyatekî nû derdikeve. Deleuze û Guattari li ser xelet bikaranîna zimên dibêjin ku “Dengên hatine girêçkirin bêcîwarîya xwe di wateyê de vediguherînin bicîwarîyê.” (Deleuze û Guattari 2015:53). Yanî peyvên bîyanî di sentaks û rêzimanê de dibe ku bêcîwar xuya biken lê wexta tene telefuzîkirin di peywenda wateyê de cih û warê xwe dibînin.

Di vê deqê de em dikarin bibêjin ku zimanê mînorîte û zimanê majorîteyê du zimanên ji hev cîhê nînin. Yek sepana du zimanan e. Wisa xuya dike ku taybetîya zimanê mînorîteyê ya bi awayek menayî û îfadeyî hatîye amadekirin, qayîdeyên zimanê majorîteyê dihejîne û wê bêcîwar dike. Lewra zimanê mînor bi

taybetî û avahîyên peyv û dengên xwe dikeve nava zimanê major û wê zimanî perçe perçe dike, têxe nava formeke nû. Wê zimanî ji binyada wê diqetîne û her ku diçe wê zimanî ji kokên wê dûr dixê bi vê hawî proseya bêcîwarbûna zimên dest pê dike. Em vê yekê dikarin di peywenda Tirkî û Kurdî de bi mînakekê ragihînin. Bo mînak di civaka kurdî de gelek kes hene ku di navbera zimanê xwe û zimanê tirkî de mayî û bi zimanê majorîteyê de berhem afirandine. Di nav van de nivîskar, senarîst, şair û hwd hene. Îro di zimanê tirkî de, em ê vê wek zimanê major bi nav bikin, gelek peyv hene ku ji alê vegotin telefuz û wateyê ve bi xwerû Kurdî ne lê di hevokên, sentaksên, rêzepeyvên tirkî de cih digirin. Bo mînak “tirs”, “gundî”, “barzan”, “ya herru ya merru”, “kirve”, “keko”, “heval”. Em van peyvên hem di hem nivîsên bi tirkî de hem jî di raya giştî de di gelek axaftinên bi tirkî de dibihîzin û dibînin. Ev peyvên bi pêvajoyeke dûv û dirêj û bi encama danûstandinên navbera du zimanan de neketine zimanê tirkî ji alê nivîskar, senarîst, edîbên kurd ve di peywenda edebîyatekî mînor de hatine çêkirin û bi vê awayî jî ketine nava zimanê tirkî. Bikarhênerên zimanê tirkî jî van peyvên di nivîs, senaryo, zimanê rojane de bi kar tînin. Eger ev edebîyata mînor bi vê hawî berdewam bike dê hem zimanê tirkî hem jî zimanê kurdî ji taybetîyên xwe yê lînguîstîk bêcîwar bin û zimanekî nû û çêkirî derkeve holê. Her wiha ev yek bikeve nava raya Tirkîyê û civaka Tirkîyê navbera her du gelan de dê pîrgirêkên ragihandina zimanî ji kêmtir be. Bi vê hawî şayanê gotinê ye ku bêcîwarbûn cihêyîyan û yek-tîpîyên civakî û serdestîyan kêmtir dike. Bêcîwarbûn eger bigehêje asteka civakî û di nava tevahîya civakê de cih bigire dê civak rengorengir be.

1.1.2. Polîtîkbûna Kirdeyê

Li Gorî Deleuze û Guattarî (2015) duyemîn taybetîya edebîyata mînor; polîtîkbûna wê ye. Di van edebîyatên de her tişt polîtîk e û her bûyerekî takekesî jî rasterast bi sîyasetê ve tê girêdan. Deleuze û Guattarî vê yekê weha tînin ziman:

“Di edebîyatên mezin de pîrgirêkên takakesî meylê pêvekbûna pîrgirêkên zewac, malbatê ne ku ev pîrgirêk piçek di ji pîrgirêkên takekesî mezintir in û di van edebîyatên mezin de qada civakî, der û dor tînin piştguhkirin. Lê di edebîyata mînor de ev yek jî serî heya binî cîyewaz e. Qada edebîyata mînor ya teng, rasterast hemû pîrgirêkên takekesî bi sîyasetê ve girê dide.” (Deleuze û Guattarî, 2015:46).

Di edebîyatên mînor de navbera tiştê taybet û polîtîk de sînor daîma tê parastin lê di edebîyata major de cihêyîya di navbera qada taybet û qada polîtîk;

tişta taybet, tişta polîtîk; hindir, derve; takekes, polîtîk hatîye rakirin û vê yekê jî di edebîyatên mînor de rewşên takekesî bi xwe bi xwe polîtîze kirîye. Yanî em dikarin bibêjin ku di edebîyata mînor de ji bo karakterên edebîyata mînor cihekî, malekî ku xwe tê de ewle hîs bikin negengaz e. Ev karakterên edebîyata mînor piranîn li taxên ji rêzê, li xerîbîyê û li mekanên kerebalix de tene pêşîya me. Ji ber van jî bigel van nîrxên li mala xwe de hîn bûne nikarin qadê dewletê an ku qadên sazîyî de bijîn. Her tim di bin nêrevanîya hêzên kontrolkerên otorîteyê de ne. Bo vê yekê jî hemû tevger û livên wan ji ber revîna van qadan, polîtîze dibin. Îro di edebîyata majorî de rêyek bi awayên rûxsarî ve dibe ku bihête şayesandin lê di edebîyatên mînor de rê û rêwîti bi tevlibûna otorîteyê berdewam dike. Di edebîyata major de rawestgeha an jî cihê bêhnvedanê benzîngehek be di edebîyata mînor de ev cih qereqol an jî noktayekî kontrolê ye.

“Peywendîya edebîyat û îdeolojîyê li gorî estetîka Marksîst ya edebîyatê, berhema navbera bînesazî û îdeolojîyê ye.” (Moran, 2003:65). Hin kes vê têkîliya navbera edebîyat û îdeolojîyê wek dîyalektî; hin kes jî vê têkîliyê wek têkîliyê mekanîk fêm diken lê ya gelemberî û muteber fonksîyona edebîyatê ev e ku edebîyat bigel navbera hêzên pevdîçîn û îdeolojîyê; rastîya civakê radigire. Li gorî Althusser mirov bigel îdeolojîyên xwe yê pejirandî dijîn. Yanî şûna rastîyan, di navbera jîyana xwe û xetên xwe yê heyînê, xetên xeyalî an ku xeyalên xwe têxinê. Yanî tiştên ku dixwazin bikin an ku armancên xwe bi rêya edebîyatê aşkera diken. Bi me xwesteka çêkirina edebîyata mînor jî ji vir dertê. Di vê peywendê da jî em dikarin edebîyata mînor di çarçoveya estetîka marksîst ya edebîyatê de binirxînin û bibêjin ku: taybetîya edebîyata mînor ya polîtîkbûna kirdeyê bingeha xwe ji fikrên bêcîwarîyê distine.

Li gorî Veysel Lîdar “Taybetîya edebîyata mînor ya polîtîkbûna kirdeyê, ji tişta heyî zêdetirî, tişta ber heyînê îfade dike”. (Lidar, 2021: 1429) berhemekî mînor, guherîn û veguhezînên hem takekesî hem jî polîtîkî vedigire bi vê awayê jî rê li ber çêbûn û derketina tiştên nû vedike. Ev tiştên nû û taze derketî jî ji ber ku cihê tiştên berê digire wan bêcîwar dike. Bi gotîneke din em dikarin dubare biken ku nivîskarên edebîyata mînor xetên xwe yê pêşerojê, xeyal, armanc û saîqên xwe bi rêya nivîs û berhemên xwe tînin ziman. Nivîskarên edebîyata mînor bixwe kirdeyekî polîtîk û bêcîwar in bi van jî nivîskar xwe ji qaîdeyên zimên û têkîliyên

îktîdarê razdiberînin û bi rêya berhemên xwe avahîya zimên û zimanê îktîdarê, otorîteyê xirab dikin. Xwe ji têkîliyên statûkoyê, otorîteyê, jîyana derve û ji navenda hêzê dûr dikin. Dibin yeke din, xwe aidê civakê nabînin. Ne zimanê otorîteyê ne jî sinifê wan dipejirînin. Ji her awayê otorîte û şahîyê aciz in Bi gel van hestan jî di berhemên xwe de gelek caran wek ajalekî, gîyayekî û caran jî bi tenê şeklê tîpekî derdikevine pêşîya me. Evî rewşê Hakan Çörəkçioğlu(2016) weha tîne ziman: “Di peywenda edebîyata mînor da hilberandina karakteran, li ser temayên heywan, gîya, jin, tîp hwd. têne çêkirin.” (Çörəkçioğlu, 2016:83). Ev agahî me rasterast dibete bêtîwarbûnê. Lewra îro di pergalên totalîter de, di netewe-dewletan de heywanek, gîyayek, jinek, tîpek xwedî ti nirxekî nînin yanê bêtîwar in. Nivîskarên mînor ji bo çêkirina nirxekî, van têgehan hildibijêrin û di berhemên xwe de cih didene van têgehan. Jixwe estetîkbûna vê edebîyatê ji vê tê. Lewra nivîskarên ku rasterast pîrsgirêkên civakî û siyasî di berhemên xwe de vedibêjin bi me dibine sîyasetmedar û berhemên wan jî dibine tekstên siyasî û manifestoyên ajîstasyonê. Lê edîbên rêya edebîyata mînor hilibijartî mirovên baqil in. Lewra ew, di şexsê kêzîkekê de hemû pîrsgirêkên civakî û malbatî bi rêyekê edebî dikarin bi şewazekî xwedî bandor vebêjin.

Edebîyata mînor li ser tiştê ber heyînê çêdibe. Em dikarin vê hevokê bi fonksiyona bêtîwarîyê ya afirîner ra girê biden. Lewra nivîskarê edebîyata mînor ew kesê pergal red kirîye ew e. Jixwe xwe aidê nirxên majorîteyê nabîne. Di nava têkîliyên jîyana modern da wek bîyanîyekî ye. Li dor van peywendan jî berhema xwe li ser kodên jîyana modern naafirîne û temayên ji rêzê naxe nava edebîyata xwe û mebest dike ku pê tiştê biafirîne kodên pergalê, kodên edebîyata major bihejîne. Li dor van temayan di edebîyatê de çêjneke bi navê edebîyata mînor î nû dertê holê. Di edebîyata mînor de bi vê awayî jî polîtîzebûna zimên tê holê. Deleuze û Guattarî vê yekê weha tînin ziman:

“ Di edebîyatên mezin de qeta bodrumê ji bo bînahîyekê tişteke zêde girîng nîne. Belkî bi tenê axaftine tê da derbas be lê ev yek ji bo edebîyatên biçûk weha nîne. Tiştên di edebîyatên mezin de bi tenê dibine sahneya axftinekê; di edebîyatên biçûk de dibe ku bibe sedema mirin û mayîna herkesê.” (Deleuze û Guattari, 2015: 47).

Ev yek jî di edebîyatên mînor de polîtîkbûna ziman û bi rêya wê polîtîzebûna her tiştê rave dike. Yanî her tişt polîtîk e û bi tiştê polîtîk ve dihête girêdan ziman jixwe bigel bêtîwarbûna xwe hem kirdeya hem jî lebata polîtîzebûna her tiştê ye.

1.1.3. Nasnameya Kollektîv

Edebîyat di çêbûn û veguherandina nasnameyê da fonksîyoneke xwedî bandor e. “Çêjnên edebîyatê yên wek roman, çîrok, helbest diyarkerê nasnameyê yên bingeîn in.” (Alver, 2006:32). Nivîskarên du zimanan diaxivin di zimanekî de, bi axaftina mîna bîyanîyekî dikare xwe biken du zimanî. Bi vê hawî jî hem bi yek zimên ve xwe asê nahêlin û hem jî ji berbendîya serdestan ku li ser zimên dişuxile rizgar dibin. Em dikarin vê taybetîya edebîyata mînor wek nîrxê kollektîv jî biden. Lewra di edebîyatên mînor de nivîsar her çî qas jî temayên xwe li dor bûyerên tekîl de biafirîne di eslê xwe ew bûyeran, nîrxekên kollektîv û çalakîyên hevpar in. Li gori Deleuze û Guattarîyî; “qada sîyasî tevî her cure tiştê bûye. Hişmendîya kolektîv û netewî li ber belavbûnê ye di vê xetê de jî rola şoreşgerîyê edebîyat digire ser xwe.” (Deleuze û Guattari, 2015:47). Ev yek rê li ber derketina pîrjimarîyên, cîherengîyên nû vedike û ev jî bêcîwarkirina zimên e. Ev fikra ku li dijî navendparêzî û bingeşparêzîyê derketî, em dikarin bi peyva bêkokîyê berfirehtirîn wateyê lê bar bikin. Bêkokî yanê mirovekî\a xwe aîdê ti derêkê nabîne. Fehmayê rêwîtiya xwe ye; rêwîtiya ku dawî lê nîne. Mirov bi kokên xwe, bi axa xwe; xwe dide nasîn. Lewra mirov cihê kokê xwe vedayî de xwe di ewlehîyê de dibîne û bi qasê xwe ewlehîyê de bibîne ew qasê jî aram û şad e. Piştî guherandina metînenegerîyan xakên mîna bihuştê hatine mezixandin û sînoren welatan ji nû ve hatine xêzkirin heya niha li ser herkesê hîssa telkînîya vê rewşê heye. Kokên me aidên me ne lê cihê em lê disekinin aidê dinyayê ne. Cihên ku wateya wan, girîngîya wan, taybetîyên wan bi awayeke domdar diguhere. Dinya ji valahîyan pêk tê mirov jî bi bedenên xwe, bi kokên xwe yên gerok van valahîyan tije dîkin. Di vê çarçoveyê de em dikarin bêcîwarbûnê bi gel koçberî û fikra koçberîyê binirxînin. Yanî mirovekî ji civakê veqetî, peywendîyên navbera ziman û welatê xwe qetandî de proseyeke takekesbûnê despê dike. Di vê rewşê de jî subject (kirde) girêdayê taybetîyeke neguher namîne; di wateya herî razber da li cihwareka guherbar de qîma xwe bi tiştên destê xwe de tine. “Ger em bifikirin mirov wek dîrokî û civakî wekî xwe namînin, bigel perçeyên xwebûna xwe yên destê wan de mayî nîv-nasnameyekê ji xwe ra çêdikin”. (Akay, 1996a:72) Yanî em dikarin têgeha bêcîwarbûnê bi gel têgehên din li serê sekinin: bêcîwarbûn di heman demê de têgehekî politîk, hem hûnerî û hem edebî ye. Mînakên Deleuzeyî

yên li ser bêcîwarbûnê piranîn ji edîban e. Mînakên Godardî jî ji hêla pirçandî û pîrzimanîyê ve bi gel mînakên Deleuzeyî yên li ser edîban ve wekhev in Ali Akay di xebateke xwe de têgeha bêcîwarbûnê bi gel Hegeltîyê, bi gel skrukturalîzmê û di heman demê de bi gel psîkanalîzê re wek tegehêka hesab dîtîne rave dike (Akay, 1996b: 20). Yanî bêcîwarbûn bi temamî li dijberê van nebe jî çend tiştên van napejirîne.

1.2. Xetên Revê

Giles Deleuze û Felîks Guatarî vê fonksîyona bêcîwarbûnê wek xeta revê yanî çalakîya terkkirina kesekê\î pênase dikin. Ev terkkirina ku em behsê diken li dor babeta me bi tenê ne cihgûzê ye. Dibe ev terkkirin nepejirandinê jî di xwe de bihewîne. Ji bo em têgeha “xeta revê” baştir têbigehijîn divê em van gotinên Ali Akay(1996b) yên li ser vê mijarê bînin ber çav.

“Teorîya binehişîyê ya klasîk teorîyeka Freodî ye ku teorîyeka li rabirdûyê dinihêre, aidê bîranîn, hiş û binyadê ye. Tebeqeyên binehişîyê hebûna xwe bidomînin jî, tevgera van tebeqeyan xetekî jî jor ve ber bi jêr e. Bi gotinekî dî em rave bikin hişê mirovan an jî kesa di nava van tebeqeyên binehişê de di rabirdûyê de heyberên xwe digere û bigel vê hiş ber bi rabirdûyê ve dikeve nav tevgerêkê genealocîkal e. Lê di mentalîteya Guattarî ya binehişîyê de ku wî navê binehişîya makîneyî lê kirîye weha nîne. Guattarî weha rave dike: Xeta tevgerên binehişîya makîneyî bo rabirdû, bîranîn û hişê ber bi jêr ve nîne bereks ber bi jor e. Ger em navekê bidine vê tevgerê em dikarin jê ra bêjin xeta revê. Guattarî navê ku Nexşeya sîzonalitîk - schizoanalytic map- lê kirîye weha rave dike: Xetekî ber bi jor ku bigel bîranîn û bellekê, bigel bûyer û xetên genealocîkal naşixule û wek nexşevanîyekê û wek kartografiyekê tîne berçav. Xeteka esl û revê ku ber bi jor ve diçe. Li gorî Deleuzeyî jî ev xet tevgerên takekesîbûna me ne û dîsa li gorî Deleuzeyî ferd ji cewherekî tevayî nînin ji xetan pêk dihên. Rehên me, lîfên me ji me ra dibêjin jixwe em ji van xetan pêk hatine. Wek disîplin fikirin Erdnîgarî mîna dîrokê nîne. Erdnîgarî xetekê rast e lê jeolojî wisa nîne; dîrok wek bellekê dişixule lê bîranîn wek kronolojiye dişixule”. (rp. 19-20)

Li gorî Deleuze xetên revê, bêcîwarbûn û koçber bûn li hemberî bedenên ji aliyê pergala kapîtalîst ve hatine kodkirin, rêya çarenûsê ye. Teorîya koçberîyê ya takekesî ya Deleuzeyî skrutkura takekes ya erênî dikirpîne û felsefeya “Deleuze ji reflekseke zêdetir li ser vesazkirinên deshilatdarîyê yên hevdem û li ser formên berxwedanê yên ku di rejîma post-pîşesazîyê ya aborîya cîhanî de peyda dibin.” (Braidotti, 1996:305) Lewra kapîtalîzm li ser bedena mirov dişuxile, jîyanê li ber çavê wan xweş dike û enerjîya mirov jê distîne. Kapîtalîzma ku li ser bedena mirovan dişuxile wan bedenên di peywenda azadîyeka dilxwe da serbest dihêle lê di binyada xwe de bedenên mirov têxe nav teşeyên xwe; bo mînak îro di reklameke rîkurkirinê de jinek dikare bileyzê û aktorên van reklaman piranîn jî jin

in; ev yek jî bandora kapîtalîzmê ya li ser bedena mirovan tîne ber çav. Li gorî Deleuze li hemberî bedenên kodkirî rêya xilasîyê “bedena bêorgan e. “Bedena bêorgan, bigel îfadekirina rewşeke kaotîk û anarşîk; di heman demê de nasnameya li ser wê bedenê hatîye çêkirin jî diavêje. “Yanî nasnameya nêrîtî û mêyîtîyê jî nahewîne. Bi vê hawî jî ferqîyetên wek zayend, etnîsîtî jî ji holê radike.” (Guattari û Deleuze, 1990:85) Ji van gotinan em dikarin bibêjin ku xeta bêcîwarbûnê di binyadê de xeteka bûyînê ye. Seyehateka ber bi pêşerojê ve hatîye avêtin e. Di vir de bi qesta pêşerojê xwe pêkanîn e, xwe çêkirin e. Yanî kesên ji pergala kapîtalîst, serdestên totalîter, patronên tundker, axayên zilimkar, malbatên feodal hwd revîne di xetêke bêcîwarbûnê de xwe ji nû ve çêdikin û bi vê hawî jî xwe ji talûkeyên van pergalan îzole dikin. Di van xetên revê de em dikarin şopên serhildêrî û anarşîmê jî bibînin. Lewra nepejirandin û serî lê rakirina sistemeke bi xwe anarşîzm nîne çî ye? Ev xetên revê ji bo Deleuze û Guattariyî xetên takekesî ne. Lê ev xetên takekesî bi rêya rîzoman vediguhezine xetên pirjîmar “Ev xetana qasê erdnîgarîbûnê hewqas jî dîrokî û arkeolojîk in.” (Akay, 1996b:20). Ji ber vê jî zimanê me van xetana bi gel xwe digerîne. Di heman demê de jî dîroka me, tiştên ku em ji dibistanê fêr bûne, tiştên me bihîstîne û tiştên ku me nejiyane jî bi gel me tên. Yanî di navbera têgehiştinên me yên îro û serpêhatiyên me yên berê de peywendîyeke xurt heye û bîr jî ji bo teşedayîna jîyana îro hêzeka bi bandor e. Bo mînak Mehmed Uzun destana Evdalê Zeynîkê ne dîtîye, ne jî jîyaye lê belê dîsa jî di nêv bîra xwe da ew destan gerandîye û romana *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynîkê* nivîsandîye. Destana Evdalê Zeynîkê ji Mehmed Uzunî ra bûye xetekî reaksiyonê û ev xeta reaksiyonê di bêcîwarbûnê da jê ra bûye wek xeteka revê û vê xeta revê ew ji nû ve çêkirîye. Lewra Mehmed Uzun di vê romana xwe de ji serî heta binî bi tenê girêdayê destanê nemaye. Di destanê de xetên xwe, nasnameya xwe, reaksiyonên xwe jî xistinê. Ji ber vê jî bi gel berhemê, nivîskarî kokên xwe şax vedandine. Xeta Mehmed Uzunî xetekî revê û takekesî bûn lê ji ber ku wî berhema xwe li dor edebîyatekî mînor de afirand berhema xwe de zimanê serdest bêcîwar kir û di naverokê de nasnameya kollektîf çêkir bû mînakê peyrevên xwe ev xete vegugerî pirjimariyekî.

1.3. Bicîwarbûn

Guattarî û Deleuze (2015) di *Kafka: Minor Bir Edebîyat İçin* da îfade dikin ku: “bêcîwarbûn û ji nû ve bicîwarbûn di heman demê de çêdibin û bêcîwarbûn di heman demê de herêmêkê çêdike û berfireh dike.” (Deleuze û Guattari, 2015: 37). Deleuze û Guattarî, ji nû ve bicîwarbûnê li ser Kafka weha tînin ziman: “Babê ji bo koçî bajêr bike terkê gundê xwe kirî bê guman di xeteka bêcîwarbûnê de ye lê di malbata xwe de, di danûstandinên xwe de, di pergala otorîte û îtaetên xwe de, bê rawest xwe ji nû ve bicîwar dike.” (Deleuze û Guattarî, 2015:37). Ger em li ser vê gotina Deleuzeyî û Guattariyî rawestin em dikarin bibêjin ku bavê Kafkayî ku ji deverêke piçûk xwedî taybetîyên civaka pederşahî û feodal de derketî, li erdeke modern û mezin; nikare taybetî, tevger, kirinên xwe yên berê, em dikarin bibêjin xetên xwe yên berê jî, zêde bi kar bîne lê di nava malbata xwe da xetên xwe yên berê dide jîyîn xwe bi vê hawî jî di nav malbata xwe da bicîwar dike. Yanî tevgera bavê Kafkayî bi gel bellek û nostaljiyê ber bi jêr ve çûye. Di bajarê ku bar kirnê de bêcîwarek e lê di malbatê de bicîwarek e. Lewra bajarên modern, pêşketî û mezin de bi saya sazîyan, komên jinan, sazîyên sîvîl hwd. tundîyên feodal û tevgerên pederşahî tînin mînimîlîze kirin. Ji ber vê jî bavê Kafkayî di wê bajarî de bêcîwarek e. Lê di nava malbatê de ji ber ku pergalek an ku sazîyeke bi wê hawî nînin bi awayeke rihet dikare xetên xwe yên berê li ser malbata xwe bide jîyîn û xwe di malbatê de bicîwar bike. Em dikarin bibêjin ku sazîyên sîvîl, komên jinan, sazîyên din li wê bajarê ku malbata Kafkayan barkirinê , di bin temsîliyeta serdestîyê da xetên feodal û pederşahî bêcîwar kiriye lê bavê Kafkayî li hemberî vê otorîteyê bi pêkderxistina xetên xwe, xwe bicîwar kirîye.

Ger em li ser vê mijarê gotinên xwe bêjin dê em dikarin mînakeke bi vê hawî biden. Wekî her civakê, îro di civaka kurdan de jî modeya cil berkirinê heye. Li gorî serdemê di konteksta cil berkirinê de em dikarin bêjin kurd civakeka modern û nûjen in. Di vê heyama hilberandinê de, heyama tekstîlê da gelek celebên cilan hene û hîlbijartina cilan de vebijêrkeke cihêreng û dewelemend heye. Lê em gelek caran lê rast tînin ku hin kes bi cilên xwe yên kevneşopî qey dijî serdema xwe ne, digerin. Heya niha ev yek ber bi şovenîzm û partîgirîyê dihate şîrovekirin. Lê bi me di nava civaka posmodern de berkirina cilûbergên kevneşopî bi partîzantîyê ve bi şovenîzmê ve hêj bi çandê ve ti eleqeya wê nîn e. Belê

cilûbergên kurdan yên kevneşopî perçeyêke ji çanda kurdan e. Lê berkirina wan cilan di peywenda binehişîyê de bi çandê ve girêdayî nîne. Berkirina cilûbergên kevneşopî bi gotina Guattarîyî berhemeke ji binehişîya makîneyî tê. Yanî di serdema nûjen de xeteka revê ye. Kurdên ku cilûbergên wan ji aliyê endîstûrîya tekstîlê, otorîteyê ve di vê serdemê da hatîne bêtîwarkirin, dixwazin xwe di serdema nûjen de bi cilûbergên xwe ji nû ve xwe bicîwar bikin. Ger ku em ji hêla Freudî ve lê binêrin em dê bibêjin ku cil berkirina wan kesan ji daxwaza nostaljiyê ye, bêtîkirina demên xwe yên berê tê. Lê divê em bala xwe baş bidene terzê wan. Lewra dema ew kes wan cilan li xwe diken, di dîmenê de, ji bilî cilûbergan, xetên serdema modern jî hene. Bo mînak telefonê, pêlaveke nûjen, an ku porekê çekirî. Ev yekana jî teorîya Guattarîyî ya ku fragmantal û ne temam rast derine. Û wexta em li dîmenê binihêrin em xetêke rast nabînin lewra dîmeneke tapografîk û perçe perçe di holê de heye. Cilûbergên kevin, amûrên nûjen. Ger em li ser koçberên, penaberên sûrîyeyî jî bifikirin, li ser wan jî em dikarin heman encamê derxînin. Eba û entarîyên wan jî xeteka wan ya revê ye di vê konteksê da jî ev xet bo wan xeteka bêtîwarbûnê ye. Di dorhêla felsefa Deleuze û Guattarîyî de em dikarin bibêjin ku kurdên cilûbergên xwe yên kevneşopî werdigirin di pergala kapîtalîzmê de li hemberî bedenên kodkirî di xetêke revê de bêtîwar in. Li hemberê bedenên bi mode û xetên kapîtalîzmê ve hatîye dorpeçkirin û peçavî kurd bi wergirtina cilên xwe bedenên xwe ji organên kapîtalîzmê dîrevînin û di vê xeta revê de bi xetên xwe, bi bedenên bê organ ji xwe ra çêdikin. Penaber û koçberên surî jî di peywenda koçberîyê de makîneyên şerî û bêtîwar in. Lewra li ser sînorenaskirina xwe qadeke ji alê îktîdarekê ve , dewletekê ve hatîye çekirî de bi xetên xwe, bi nenaskirina wan sînoren û yaseyên îktîdarê, xwe bêtîwar dikin.

Ev bêtîwarbûn çawa di heman demê de vediguhêre ji nû ve bicîwarbûnê? Di vir de bi gotina di heman demê de em qesta veguherînek tews û ji nişkê ve naken. Qesta me di vir de ev e ku: bêtîwarbûn û bêtîwarbûn du prosesên hev sopîner in. Mirovekî ketî ber xeta bêtîwarbûnê dibe ku ew xeta wêî bişkê û ji nû ve veguhere bicîwarbûnê. Lê ev bicîwarbûn, çekirina xetên nû û nasnameyekê azad di xwe de vedigire. Bi me ev yek jî bi afirandina hin tiştan, wek nivîs, hilberîn, amûr, terz, hûner û edebîyatê gengaz e. Dîdier Gazagnadau (1996) li ser mişextîya Freudî danasîneka weha dike: “Mişextî ji bo afirandinê dibe ku veguhere dewlemendîyeke gîyanî. “Afirandin ne ew tişt e ku meriv ji bo tiştên

xwe yê wendakirî ra ku telafîya wan ne mimkun e bigirî; afirandin li şuna wan tiştan berhemek çêkirin e.” (Gazagnadau 1996:62). Di wexta çêkirinê da jî mirov bi gel wê berhemê xwe jî ji nû ve çêdibe û bicîwar dibe”. Hunermend an ku takekes heyîna xwe dide wê berhemê û xetên xwe yê revê û yê heyînê di wê berhemê de diafirîne. “Deleuze van her du proseyan kê zêde bi dualî rave dike. Ya yekê erênîkirin ya duyê nerênîkirin e.” (Akay, 1996b:20) van her du vebijêrkan weha rave dike: “Di vebijêrka nerênîkirinê de xeta revê a ku bêcîwar bûye; dibe ku bişkê û ber bi dayikê, bavê, neteweyê, nasnameyê, kokê, xakê, cemaetê ve vegere. Lê vebijêrka erênîkirinê (affirmative) xetê bêcîwarbûnê heye ku ji berê ve ev xet fragmantal, fraktal (parçe parçe, netemam) jihevderketî ye. Ev xeta perçeyî têgeha bûyînê di xwe da dihevinê û paşvegerînê tê da nîne. Em dikarin bibêjin jî ew xetên şikestî û parçebûyî çêtir dikarin me pêşvetir biben û me ji nû ve bicîwar biken. Lewra xeta erênîkirinê xetekê ber bi rabirdûyê ye, bi van hemanên rabirdû wek dayîk, bav, netewe, nasname, kok hwd.. takekes dikeve nav nostaljiyekê û tê da asê dimîne. Lê di xetên perçe, netemam de takekes xwe bigel cihwarê xwe yê nû ji nû ve diafirînê.

Li jorê me bal kişande li ser pêvajoyên bicîwarbûnê. Lê di vê pêvajoya ji nû ve bicîwarbûnê de gelo çi faktor hene ku vê proseyê didine dest pê kirin? Bi me medyâtîzasyon yek girîngtirîn faktor e ku merivan ji nû ve bicîwar dike. Li dor vê hêlê da divê em bandora medyâtîzasyonê jî bikirpînin.

Di van demên modern de bi taybetî jî di pêvajoyên koçên takekesî de, ferd ji bo aîdeyeteke bo cihê xwe yê nû çêken pêdivîya wan bi komelbûyînê çêdibe. Di cihê xwe yê nû de ji bo ku bigehijne mirovên wekî xwe pêdivîya wan bi amûrên ragihandinê çêdibe. “Xebata komelnasê Emrîkî Robert Park ya di derheqê di entegrebûna koçberan de bandora rojnemayan yekem xebata ragihandinê tê qebulkirin.” (Ünlü û ydn., 2018:20). Yanî di qada ragihandinê de yekem xebata sistematîk di heman demê de xebatekî koçê ye jî. Medyâtîzasyon yek van amûrên ragihandinê yê girseyî ye û bigel vê jî yek girîngtirîn faktoreka ji nû ve bicîwarkirinê ye. “Medyâtîzasyon di tecrubeyên çandî û nûjen de li her derekê dinyayê mewcud in ji ber vê yekê jî di çandên hatine bêcîwarkirin de bi awayekê vekirî diyar e.” (Tomlinson, 2004:95). Tecrubeyên ku behsê dikin bi me ev e: Bi rêya amûrên kadîbûyî yê girseyî yê ragihandinê qesta berfirehkirina asoyên

çandî ye. Yanê ev kadîbûyîn têkîliyên navbeyna cihê ku em lê dijîn, çalakîyên me ên çandî, serpêhatî û nasnameyên me vediguherîne. Divê em kevanekê bo fonksîyona medyatîzasyonê ra veken. Medyatîzasyon bi gotinekê sade em dikarin wek bandor û şêwedana medyayê ya li ser qadên civakî, çandî û sazî pênase bikin. “Serdema ku em tê da dijîn medyatîzasyon, li ser çandê û civakê; hêj yekeya herî biçûk ya civakê -li ser ferdan,- fonsîyonek çalak û bi bandor e.” (Suyolcubası 2017:3). Ev çalakî û bandora medyatîzasyonê çawa ye? Bo mînak bîst sal berê kuçe û kolanên taxan bi zarokan teji bûn. Kurikan topanê dileyistîn û keçikan jî malmalok dileyîstin. Bigel avahîyên betonermê û koçên zêde û qerebalixîyê ew kuçe û kolanên leyîstkên zarokan hatine dagirkirin û qada leyîstkan xilas bûn. Bi gotinekê sade em dikarin bibêjin ku zarok ji cihwarên xwe yê leyîstkê hatine bêcîwarkirin. Lê îro zarokan ji bo qadên xwe yên leyîstkê ji nû ve bicîwar kirine. Çawa? Zarok bigel berbelavbûna amûrên teknolojîk û ragihandinê li şûna kolanên senterê leyîstkan tercîh diken. Êdî topanê wekê berê li kolanên nayê leyîstin, li internet cafeyan tînin leyîstîn yanî cih û warê leyîstkê bi faktora medyatîzasyonê ber bi senterê leyîstkan ve guherîye. Ger em têkîlîya ji nû ve bicîwarbûnê û medyatîzasyonê bixwazin biken dê pêwendîyekê weha derkeve. Mirovekîlê ku ji kokê xwe qetîyayî û dûrketî cihê xwe yê nû de bi faktora medyatîzasyonê zûtir entegreyê çanda nû, civaka nû dibe, xwebûna xwe ji nû ve diafirîne û bêcîwarî vediguhere ji nû ve bicîwarîyê. Yanî cih, ji bo keşfê nû bûyer(event) û rewşekê vekirîye ji van gotinan jî em dikarin bibêjin ku bêcîwarî, jêderê azadker û hilberîner e. Ji bo em van gotinên jorê ku me nivîsîye em zelaltir û piştrast biken divê em van gotinên Tîmuçîn Afşarî (1996) jî binîn ziman: “Ji bo ezeba mişextîyê vedet divê nefî çav bidete derûdora xwe lê nefî nikare çav bide derûdora xwe, wexta ku çav bidete derûdora xwe, entegreyê tarewgeha xwe bibe ew êdî ji nefîyê derdikeve dibe xwudan warek û ji nû ve bi cî û bi war dibe.” (Afşar, 1996:36). Yanê ger em wateya morfolojîk ya bêcîwarbûnê nêzîkê van agahîyan bibin: mişextîyek an jî xerîbîyek êşa mirovan ya xerîbîyê zêde dike lê eger bi rêya medyatîzasyonê zûtir entegreyê cihê xwe yê nû bibe ew êş vedide. Bi gotineke din em dikarin weha rave biken: ger takekes xwe ji nû ve bicîwar bike dê êşên xwe jî ji bîr bike.

1.4. Di Peywenda Felsefeya Deleuzîyen de Bêcîwarî.

Gilles Deleuzeyî (1930-1992) feylezofê fransî; bigel têgehên felsefî ku hilberandîye û wateyên nû li wan bar kirîye di edebîyatê, sîyasetê, psîkolojîyê, sînemayê û civaknasîyê de gelek berhem dane. Felsefeya Deleuzeyî piranîn li ser bûyerên sîyasî yên piştî sala 1968an yên li Fransayê disekine. Di vê qonaxê de, tevgerên sîyasî bi hilberandina hîyerarşîyê li hemberî mekanîzmaya temsîliyetê îtîbara xwe wenda kirine. Deleuze felsefeyê nû ku tevahîyeka ne temam e deranîye û vê felsefeya Deleuzyen têkîlîyên temsîliyetê red kirîye. Bi vê awayî jî li hemberî bedenên hatine kodkirin, zayend û sinifan berxwedaneka bêcîwar armanc kirîye. Yanî kontrolkirina van pirjimarîyên bi awayeke domdar xwedî hereket û bêcîwar, ji aliyê dewled, sermaye û kapîtalîzmê ve ne gengaz e. Bi me girîngîya fikra Deleuze ya koçberîyê jî di vir de tê û girêdayê vê yekê ye. Di vir de jî armanca Deleuze çêkirina rhîzoman e. Rhîzomên ku ne li dor hîyerarşîyekê, bi gel êkûdu dikarin bikevine têkîlîyê li beranberê vê jî bikarin xweserîya xwe biparêzin. Wiha jî, mekanîzmayên ji navendêkê dûr û kontrolkirina wan zehmet e derdikevin holê ku ev mekanîzma dikarin bi van taybetîyên xwe hem têkîlîyên hîyerarşîk hem jî navenda hêzê lawaz bikin.

Di asoya ramyarîya Deleuzeyî de têgehên wek “rhîzom”, “amraza girtinê”, “makîneyên şer”, “bêcîwarî”, “bedena bêorgan”, “xetên revê”, “şîzoanalîz”, “makîneyên arezûyê” û “ramyarîya koçber” hene. Jixwe li gorî wî jî felsefe ji bo şîrovekirina jîyanê ya afîrînerîya pirjimar hilberandina têgehan e. “Felsefe hûnera hilberandin û çêkirina têgehan e; feylosof têgehan keşif dike û li ser difikire”. (Descamps, Eribon, û Maggiori, 1996:100). Bi hemû reng û xetên xwe ve daxuyandina felsefeya Deleuzeyî bi me bê îmkân e. Bi sernavên ji hev cîyawaz û bi gel teorîyên xwe yên cîhereng Deleuze li her derekê ye. Ji ber vê jî ev yek xwendinên li ser xebatên Delauzeyî aloz dike û pîrsgirêka “divê em ji ku despê xwendina Deleuzeyî biken” bi xwe ra tîne. Pêşnîyara me li hemberê vê pîrsgirêkê ev e: Divê em têgehên aidê Deleuzeyî yên muayen ji xwe ra bigirin û van têgehên muayen li dor hêla pêdivîyên xwe bi kar bînin.

Deleuze çawanîya kodkirin û wendakirina xweserîya fikrê di peywenda ontolojîk û epîstemolojîk de rave kirîye. Li gorî Deleuze û Guttarî “subje şûna otorîte û zanistê xwe bi arezuyê bicî dike û xwe rewa dike.” (Deleuze û Guattari,

2001:48). Li gorî Deleuze azadiya mirovan bi gel arezûyên wan hevcoot in. Mustafa Solmaz di xebateke xwe de îfade dike ku: “arezu, di navenda hilberandinê yanî malbatê de bi rêya kêmdîtina kompleksa Oedîpûsê ve hatiye bêcîkirin.” (Solmaz, 2019:141). Lê di vir de divê em bizanin ku arezu bi tenê tiştekî malbatê de dişixule nîne. Arezu di civakê de jî dişuxile ji bo ku arezu ji bingeha civakê de negihêje miletan, gelan bi rêya otorîteyê ve nemaze di malbatê de tê bêcîwarkirin.

Foucaultê hevalê Deleuzeyî jî di xebatên xwe da hewl daye ku çawanîya afirandina û bicîkirina kirdeyê *subject* ji alê otorîteyê bide nîşan. Serdestên modern ku armancên van serdestan li ser dibistan, girtîgeh, nexweşxaneyan dişuxile, biçûk mezin ferq nake, di polîtîkayên ji sîyasetê heta aborîyê; ji perwerdehiyê heta çandê kirdeyê li gorî xwe diafirîne û teşeyê dide kirdeyê. Serdestên modern ku jîyanê li ber çavan xweş diken (erênî) diken palpiştê polîtîkayên xebat, hilberîn, tendûristîyê ne. Ev yek jî rê li ber şixulîna kapîtalîzmê ya li ser bedenên subjeyan vedike.

Di ramanên Deleûzeyî yê felsefîk de beden, arezû û îrade cihekî girîng digire û Deleuze, mirovî wek makîneyên arezûker dide nasîn. Deleûze di pirtûka xwe ya bi navê *Antî-Odîpus Kapîtalîzm ve Şizofrenîyê* (2014) de vê yekê weha tîne zîman:

“Li herdereke li ser kar in. Caran bêrawest caran jî bi bêhnvedana ve. Bêhnê distînin, germ dîkin, dixwin, gû dîkin, seksê dîkin.. Li her dereke ne, ew makînenin; di wateya mecazî de ne: raste rast makînenin; bigel têgihiştinên xwe bigel peywendîyên xwe. Makîneyek organ (machine-organ) xwe bi makîneyek jêderê re (machine source) digire: yek bizava ya din birîyî belav dike. Memik, makîneyek e ku şîrî hildiberîne. Dev, makîneyek e ku pêvekî wê dibe. Nexwe em hemû tevî makîneyên xwe ên biçûk brîkolor¹ in”.(rp. 13).

Ümmet Erkan, ji bo Deleuzeyî wiha dibêje “Felsefeya Deleuzeyî li ser sermayeya trans-nasyonel xwendineke (koçber) nomadîk e”. (Erkan, 2019:2629). Ev yek jî vegirtîya xebatên Deleûzeyî ya li ser qadeke berfireh aşkera dike. “Li dereke ku metîngerî zêde heye damezirandina rhîzoman² bêguman tengezarî û janê sivik nake, lê li aliyê din neşopandina xetên revê û li bin sîya hîyerarşîyê

¹ Bricoleur: wateya wê ye ku karê xwe da ne pîspor e, bi destên xwe kar dîkin û karên xwe bi amûrên ber dest pêk tînin.

² Rhizom, Köksap : Ramana Rizomatîk; têgehek e ku Deleuzeyî ji zanista botanîkê wergirtiye û gelek caran di berhemên Deluzeyî û Guattariyî de derbas dibe, bereksê tevgerên kokên daran tîkî nînin. Xeta rhîzoman xetê rasterast berwarî û ne hîyerarşîk e ku têgeha fonksiyona jêdera kokeke ye û pîrfonîk e

derneketin û pêşneçûna bêcîwarîyê, di bin zagonên dewletê de mayîn teslîmîyet e”.(Kornberger, Rhodes, û Boss 2016:7). Di vir de divê em balê bikêşine li ser têgeha teslîmîyetê. Wekî berê jî me kirpandîye ku bêcîwarî xeteka revê ye ya ku mirovan azad dike û ji nû ve çêdike. Bi gotineke Deleuzyen mirovên bê organ ku teşe û pêvekên modernîteya kapîtalîzmê napejirînin eger bin sîya hîyerarşî û otorîteyê derkevin dê azad bibin lê eger xetên xwe yên revê çênekin û di qada otorîteyê de wek îtaetkareke bisekinin dê bibine makîneyek bi organ ku makîneyekê arezû û organên wan ji alê otorîteyê ve hatiye çêkirin.

Deleuzeyî xwendin û analîzên xwe yê li ser Fîlozofê eslê xwe cihû Spînozayê Hollandî (1632-1677) weha dibêje:

“Di dîroka felsefeyê de fîlozefekî dî wekî Spînoza hem ser destan hatiye girtin hem jî hatiye kêmxistin nîne. Li gorî Deleuzeyî, yek ji girîngtirîn nêrînên Spînozayî pêşxistina beden û jîyîne ye. Di xebateke xwe de dibêje ku “em nizanin ka beden dikare çi bibe. Spînozayî li hemberî bedenê, fikra girîngdîtina hişî red kirîye û wî, hiş û beden, wek du avahîyên senkronîze daye nasîn.” (Deleuze, 2011:22)

Yanî hiş avahîyekê pasîf e ku li dorhêla hestan û saîqan tevdiqere. Di felsefeya Spînozayê de laqayîbûn ciheke taybet digire. Li gorî Spînozayî laqayîbûn hişmendîyê pêş dixê û wê radike xwebûneke bilindtir. Li gorî Deleuze wexta hiş bigel hişeke dî leqayê hev bîn ev her du hiş peywendîyeke bilind saz diken an jî avahîyê belav diken. Pergala xwezayê pergala yekbûn û belavbûnêyê. “Em xwebûnên xwedî hişmendî, bandorên van yekbûn û belavbûnan wêdetir nikarin tiştêkê têbigehêjin.” (Deleuze, 2011:23). Ji van gotinan jî em pê derînin ku wexta Deleuzeyî pêşxistina fikra xwe ya rîzomê ji Spînozayî sud wergirtiye

Rhîzom yek ji têgehan e ku Deleuze û Guattarîyî ye ku bi hev ra perisandin e. Deleuze û Guattarî behsa avahîyeka rhîzomî kirine ku ev avahî bêtir zerardayîna tekîlîya êkûdî dikarin bikevine navhev û bi vê hawî jî dikarin ji hişkîtiyê xilas bin û derkevine derveyê qada venêranê. Rhîzom bi vê awayî jî ji xetên dewletê yên bizavî û heyîne ku xetên arezuya girtinê ne direvin. Deleuze û Guattarî rhîzoman di xebeteka xwe da weha didene nasîn. “Êdî tenê xetek im.. mina ku tîreka di valahîyê diçe êdî xeteka razber im.” (Guattari û Deleuze 1990:25). Di vir de bi me xeteka ku valahîyê de diçe, azadbûn û derketina derveyê pergale qest dike. Rhîzom dikare xwe bi kirdeyekê û nesneyekê ve biwestirîne lê bi gel vê yekê jî pirjimarîyekî ku xwedî ti yekîne û tevahîyê nîne. Rhîzomên pergaleke wan ê sabît nîne bi asanî dikarin bi gel kirdeyên di peywendîyê bidanin.

Ji ku dera xwe da bişkê dîsa dikare şax vede. Bi saya van peywendîyan jî bi me dê derketina pirrengî û bûyerên afirîner gengaztir be. Bi vê awayî jî wekî berê jî me anîye zimên xetên revê yanî xetên azadbûnê çêdibin.

Li jorê têgehên ku me behsê kirî wek mekan, civak, beden bicîwarî hwd.. bi gel rastîyên şênber têkildar in lê bêtîwarî tecrubeyeke insanî ye ku li ser teswîra rewşa heyînê tê damezirandin. Di vê çarçoveyê da jî bêtîwarî girîngtirîn taybetîya mirovê modern e. Hêj em dikarin bibêjin çavkanîya azadbûnê hilberîner e, rewşeka mirovê modern e, nikare jê bireve.

Çî ye ku merivan betîwar dike; wan tîne li ber qiraxên bîyanîtiyê, wan mecbur dihele ku li dereke nenas di nav çand, ziman, civakên cûda de bijîn? Li jorê wekî me diyar kirîye ku betîwarbûn têgehekî post-modern e û di vê serdemê de têgehekî gelek berbelav e. Sermayeya kapîtalîst mirovan bi kod dike û wan li gorî xwestekên xwe dixê nav qaliban. Mirovên ku naxwazin bibine makîneyekî sermayeyê bi rêya betîwarbûnê derdikewine derveyê tehakûma otorîteyê û li der sînorên otorîteyê bêtî nêrevanîya serdestan xwe ji nû ve çêdikin. Em ê di bin çend serenavan de hêman û pêkanînerên betîwarbûnê di çarçoveya Deleuze û Guattariyê de fikra wan ya koçberiyê de çiqas ji destê me bê rave bikin.

1.5. Koç

Me heta niha hewl da ku em betîwarbûnê di çarçoveyeka idealî de binîn berçav lê wekî berê jî me nivîsandîye betîwarî têgehek hesabkirina bi sktukralizmê bi Hegelparêziyê û di heman demê de psîkanalîzê ye lewra betîwarbûn tevahîya çalakîyekê di xwe de dihevine. Em niha jî dixwazin yek ji çêkerên betîwarîyê ‘koçê’ binîn ziman û di çarçoveya koçê û koçberiyê de betîwarbûnê binirxînin.

Cihwar çêbûn û belavbûna bawerî, niştîman netewe, dewlet, etnîsîte, û malbatê de faktoreka eslî û çalak e. “Ji berê ve heta niha cihwar di çêbûna aîdiyetên civakî û siyasî, nasnameyê de karîgerîyekê bi bandor e”. (Ekici û Tuncel, 2016:11). “Em cih û warê xwe bi rêya tesadûfan nahilbijêrin. Şert û mercên me yê çandî, aborî, siyasî, me ber bi hin cih û waran ve dibin an jî cih û waran dixin.” (Adsay, 2014:152). Cihwar, sahneya tora peywendîyên civakî û pêvajoyên

civakî ye. Ji ber vê jî dîroka mirovahîyê û dîroka dinyayê jî wek dîroka cihwaran tê qebulkirin. Ferzan Şêr di xebateke xwe (2014) dibêje ku: “mirovan xwastîye formekê bidine warên lê dijin, bi vê yekê jî cihwarên jîyînê afirîne û cihwaran jî gelek caran form dane mirovan û mirovên ku li gor wê cihwarê dijîn veguherandine.” (Şêr, 2014:182) Yanî di navbera mirov û cihwarên wan de dîyalekteke diyar û şênber heye. Ev dîyalekta navbera mirov û cihwarên wan de dibe ku çandî, hestîyarî, polîtîk, patolojîk jî be. Yanî peywendîya navbera mirov û cihwarê wan de peywendîyekî cihêreng û cur be cur e. Ger em vê peywendê de gotina Ferzan Şêr veken em dikarin bibêjin ku cihwar li ser şêweya jiyana çandî, aborî, civakî û polîtîk xwedî bandoreka mezin e. Bandora cihwarê ewqas mezin e ku cihwar hêj bi gel etnîsîteyê jî gelek caran tê bi nav kirin. Bo mînak cihê ku kurd lê dijin wek Kurdistanê tê bi nav kirin, cihê ermen wek Ermenîstan, cihê tirk wek Tirkîya an ku Tirkîstan... hwd. Em dikarin mînakên xwe vi hawî gelek dirêj ken. Lê di vir de me xwast em îfade bikin ku cihwar wek mekan dibe ku ev mekan bajar, navçe, gund, tax, sikak çi be bila bibe di çêbûna çand, ziman, hûner, raman, edebîyat, peywendîyan de roleke girîng dileyzê û bi gel çêbûna van tiştan bîreke û nasnameyê hevpar û erdnîgarî derdixîne holê.

Mirov gelek caran têkilîyên hestîyarî û bi taybet di navbera xwe û cihwarê xwe de damezirînin. “Cihwar an jî mal wekî sîstem arketîp ya dînamîk, navendeke bi sîstem, toreke, komeke, konteynerek e ji peywendîyên aloz î di nav hev de wekî cih, wext, têkilîyê bê fêmkirin.” (Papadaupolos, 2020:29). Cihwar ne bi tenê bi erdnîgarî, dereke fîzîkî an jî mîmarî ve girêdayî ye; herwiha di konteksa çandî, gîyanî, psîkolojîk, aborî, nijadî, dîrokî û polîtîk ve dihête ber me. Ev konteksên cihwarî hem nasnameya me ya civakî hem jî nasnameya me ya takekesî jî îfade diken. Lê Koç vê têkilîya taybet ya navbera mirov û cihwarê wan de xirab dike û mirovan ji van konteksan diqetîne. Ber bi bê nasnametîyê bê kokîyê ve dibe. Koç malbarkirin e, ji derekê çûyîna dereke dî, cihguhêzî ye. “Koç bi mebesta li derekê niştêcîbûnê, çalakîya malbakirinê ye. Ev danasînan li ser pêvajoya koçê ya demografîk disekinin lê di peywenda me ya jorê ku me behsê kirîye danasîna Ozer İnanî (2004) di cih daye. “Koç li rex tevgerekî cihguhêzîya cihwarî; tevgerekî guherandina avahîyên polîtîk, çandî, civakî ye.” (Özer, 2004:11) “Piranîya teorîsyenên koçê sedsala 21. wek sedsala koçê didene nasîn.” (Sağır, 2012:356) “Di warê civakî de koç ne bi tenê tevgerekî mekanî ye di heman demê

de tevgerekê girseyî û takekesî ye jî.” (Gemici û Çatal, 2019:53). Yanî koç ev tişt e ku ji ber sedemên civakî, aborî, sîyasî çalakîya, tevgera ji derekê barkirina dereke di ye. Bi tabîrekî sade guherandina cihwaran e koç, lê di heman demê de li gorî roportaja *Kovara Pscghology Kurd* de ya derûnas Azad Dildar weha tîne ziman(2020) “rîskeke azmûna travmatîk e ku di warê tevna xwe de hejîner û di warê siheta gîyanî de gefdar e. Dibe ku koç, ji ber dînamîkên xwe hilqete û heta bêkokbûnê jî biçe”. Yanî mijar tête li ser wendabûnê. Koçberên ku li welatê xwe mafên xwe, ewlehîya xwe, mafên xwe ên demokratîk wenda kirine ji ber van dînamîkan cihguhez bûne dibe ku li welatê mazûvan ji kokê xwe, zimanê xwe, nasnameya xwe wenda biken. Ev cihguhêzî dibe ku takekesî be yan jî bi girseyî û civakî jî be. Di dîrokê de jî em gelek caran li rastê koçên girseyî hatine. Em ê di bin vê serenavê de sedem û encamên koçê, bandorên koçê li ser civak û ferdan binirxînin.

Divê em bi vê pirsê ve dest pê biken, wek bûyerekê koç çima çêdibe û çawa çêdibe? Girîngîya koçê çî ye ku heya niha di gelek dîsîplînan da bûye mijara lêkolînê. “Koç bi qasê dîroka mirovahîyê kevn e. Ji berê ve mirovan yan bi takekesî yan jî bi girseyî ji bo berjewendî û pêdivîyên xwe yên wek ewlehî, aîdiyetî, nirxî, aborî û çandî ji derekê ber bi dereke di barkirine.” (Ünlü ûydn., 2018:10) Wekî ji vê hevoka berê jî dîyar e ku koçberî û koç bi tenê ne hereketekî barkirinê ye. Koçber wexta radibinê serê rê bi gel hemû hêmanên xwe yên kirdeyî heyîna xwe û nirxên xwe jî ji derekê dibine derekî din. Yanî ev hemû nirx jî dikevîne nava qada dîsplînên curbecur. Bûyera koçê di dîroka mirovahîyê de ji berê ve heye û dê pêşerojê de li her dereke dinyayê dê çêbe. Ji ber vê dînamîzma koçê divê wek bûyereke gerdûnî bête dîtin û li gorî vê çarçoveyê bihête vekolan.

Deleuze li ser koçên Erebb, Tirk û Moxolan dersên dirêj û kêrhatî veqetandine. Deleuzeyî di koç û koçberan de çî digerîya? Li ser vê mijarê jî tişt ku Deleuzeyî herî baş dizanî jî ev bû: “Koçber bi tenê wexta pêdivîyê da tevdigerin.” (Gazagnadau, 1996: 61) Yanî koçber dizanin dê kengî koç bikin. Heya ku şert û mercên barkirinekê pêk neyê, xwe cihê xwe da nalepitînin lê wexta ew şert û mercên barkirinê pêk bên jî çî takekesî çî girseyî sînoran li pey xwe dihêlin û terkê dîyar dibin. Deleuze (1996) di nivîseka xwe ya *Toplumbilim Deleuze Özel Sayısı* da li vê mijarê weha dibêje: Lê koçber ew kes nîne ku bi darê

zorê hereket bike, cihê koçber lê; bi tenê rêwîtî hene. “Terza hereketa koçberan naşibe tevgerên koçberan ên dîrokî. Ew, ji kodên modernîteyê direvin û bi vê hawî jî di heman cihê de dimînin.” (Deleuze, 1996:67). Yanî em dikarin ji vê encameka weha derînin. Koçber di çarçoveya tê dîtin de ji çavênê û kodên dewletê direvin û bi vê hawî jî mekanê xwe diguherînin. Lê esîldanî ev yek jî mebesta bêkodkirina mekanê nû ye. Yanî mebesta tevgera koçberan ya di zemîneke hilû de xwestekên mekanên bêkod in. Bi vê rê jî koçber ji despotîya otorîteyê xilas dibin û di mekanekî bêkod, bê polês, bê kontrol de qadekî azad û bêsinor bi dest dixin. Bi me ew niştecîyên esil in. Bo mînak di civaka kurdan de kesên ji bo pêdivîyên xwe yên wek çandinî û zandariyê pêk bînin bi rêkûpêk koç dikin li benda gûncavbûna demsalê disekinin ra dibêjin koçer. Wexta şert û mercên hewayê li gorî pêdivîyên wan diguherin û xweş an jî nexweş dibe ew jî bar dikin û diçine dereke guncavtir. Ger em di peywenda Deleuzyen de li ser kurtir bin: Demsalên kodên wan diyar de, koçber li gorî kodên xwe, xetên xwe tevdigerin û bar dikin. Feslê zivistanê bo xetên koçeran baş nayê û koçeran bêcîwar dike. Koçer jî vê bêcîwariya xwe veguherînin bar dikin diçin. Em dikarin di vê tevgera koçerên kurd de du cure bêcîwariyê bibînin. ya yekê demsal bi veguhezîna zivistanê koçeran bêcîwar dike ya duyê jî koçer bigel koç rakirîne mekanê xwe bêcîwar diken. Vê yekê jî em dikarin wek mînameke sade û basît biden. Hêj em dikarin vê çalakîya koçerên kurd wek çalakîyeke civakî û cihê xwe de rûniştî bihesibînin. Lê alîyeke din koçên ne bi rêkûpêk hene ku ev cure koç di derûnî û hişê takekesan de birînen kûr vedikin.

“Şert û mercên koçê çiqasê guncav bin jî koç tişteke travmatîk e û destpêka pêvajoyeka hîzn û xemê ye. Pêvajoyekî tevlihev û di xwebûna ferdekî de şopên kûr û watedar dihêle.” (Altıngezer, 2011:71-72) Yanê wekî hemû cudahiyan koç jî li dû xwe hiştina hîrahîyan e; ji kokên xwe veqetî e û biyanîbûn e. Kesên koç dikin cihê xwe yê nû de li rastê civakeke cîyewaz û şert û mercên erdnîgarî yên wek hewa, av, xetên û bigel van faktoran jî pêvajoyeke adaptasyonê dest pê dike û ev pêvajoyê jî gel xwe qeyraneke tîne. Lê koç çiqasê qeyranek be jî bigel guherî û pêvajoya adaptasyonê dibe ku bibe şansêkê duyem jî. Koçber di cihê xwe yê nû de di nav şert û mercên nû de mecbûr dimînin xwe binasin û ji nû ve heyîna xwe çê bikin; ji xwe ra jîyaneke nû biafirînin, xetêke nû nasnameyêke takekesî ê nû hilberînin.

Bobelatên ku bûne sebebê koçê pêvajoyê û çewaniya jîyana nû jî dîyar diken. Bo mînak keseke ji ber sedemên aboriyê an pêdivîyeke derûnî koç kirîye çêbûn û guncavbûnê derfetan de dikare li welatê xwe vegere û heval û hogirên xwe bibîne. An jî mirovên ji ber bobelateke xwezayê koç kirine li cihwarê xwe yê nû de dikarin avahîyên li hemberî wan bobelatan saxlem çê bikin. Bi vê hawî jî koçber di cihwarên xwe yê nû li gorî kodên xwe saz dikin.

Ji destpêka mirovahîyê heya niha takekes, civak, kom, ji ber hin sedeman neçar mane û koç kirine. Koç dibe ku bigel faktorên takekesî di heman de ji ber sedemên civakî û siyasî jî pêk bên. Wexta di konteksta dîroka mirovahîyê de li koçê bihête nêrîn koçberî ne bi tenê cihguhezîyeke tapokrafîk e. “Koç bi gel li dû hiştina kevneşopîyên rûniştî, nîrxên berê û terkkirina pergala xwecihî destpêkeke trajedîyekê ye.” (Dağışan û Aydın, 2017:743) Ev yek jî tîne bîra me ku têgeha koçê dînamîkeke pir tebeqeyî û pir-encamî ye.

Me li jorê koçên takekesî û girseyî anîye zimên. Di vir de divê em li ser vê deqê piçekî rawestin. “Koçerî bi hejmarê ra têkildar nîne, ev jî tîne bîra me ku insanê heywan, dîsa wek heywanan e, kedîkirinina wan demkî ye. Wextê dilsozîya, girêdamayîna komaleyêyê, îdeolojîk û nasnameyî qedîyaye.” (Maffesoli, 2011:13) Lê di koçê de de şûna ferdê tek, kesê pirjimar rû dide. Hemû dibin yek, nasnameya wan dibe koçer û hemû temsîliyeta koçberîyê dikin. Koç, rewşeke takekesî nîne em dikarin têgeha koçê di çarçoveyeka desketîyeke kolektîf de wek peywendî û ragihandina navber-civakî bidin nasîn. Bo mînak îro li welatê me an ku li Ewropayê enwaî cure koçber hene ku bi nasnameyê dîyar nayêne bilêvkin. Ger bi nasnameya netewî jî bîne bilêvkin teqez rengdêra koçberîyê tête ber nasnameya wan ya netewî. Maffesoli (2011) di pirtûka xwe ya *Bi navê Göçebelik Üzerine İnisiyatik Boşluk* de gotinekê Niectzsheyî weha tîne ber me: “Ez îlan dikim ku nijadekî koçer ji neteweyê wêdetir derdikeve holê ku qabiliyetên wan ji qabiliyetên fanîyan bi hêztir e” (Maffesoli, 2011:45). Li gorî me bi vê gotinê hem domdarîya koç û koçberîyê hem jî pirsgerêka kadibûyîna koçberîyê kirpand. Lê ya tê gotin ev e ku koçber cureyeke nû ye bo mirovahî û civakê. Û her wiha em li ser vê gotina Niechzeyî dikarin bibêjin ku dezenformasyonkirina civaka rûniştî û bêcîwarî di koçberîyê de unsûra yekem e. Lewra wexta ku em bala xwe bidine dîrokê em ê bibînin ku koçên girseyî û

koçberî ji destpêka dîrokê heya niha heye û di sedsala me de îro di cîhanê de bûye mezintirîn pîrsgirêkek. Bi gotineke din em dikarin îfade bikin ku koçberî bi hejmar û neteweyê ve divê neyê girêdan. Lewra ji ber çî sedeman be jî kesên cihên xwe, warê xwe berdayî û li dereke dî bicîwar bûyî; ew kes an ew kom bi nasnameya koçbertîyê têne naskirin û bilêvkin. Di vê çarçoveyê da, ti girîngîya navê netewê an ku çendanîya hejmarê ji bo koçberan nîne. Koçber, bi gel taybetîyên xwe ê ku cih û waran hilû û bê kod û bê yasa diken neteweyeke nû ye. Ev neteweya nû, bi dînamîkên xwe ve ji nû-warê xwe ra dibin mekanîzmaya veguherîn û veguhezinê. Divê neyê ji bîr kirin ku li cihekê çand û normên wê rûniştî de koçber neyêne kontrolkirin; li wir, koçber dikarin di jîyana rojane, hûner, polîtîka, wêjeyê de bibine dînamîkên esil. Em dikarin vê yekê di çarçoveya bêtawariyê de weha binirxînin û bînin ziman. Koçber li nû-warê xwe de ger neyêne kontrolkirin dikarin wê civakê de serdestîya xwe îlan bikin û xwe bigel her tiştên xwe bicîwar biken; di vê prosesa xwe bicîwarkirinê de muheqeq çand û normên civaka rûniştî dê bêtawar be. Nasname, netew, nijad û kokê koçberan çî be bila bibe koçber, bi van navên aîdîyetên xwe nayêne bibîranîn; nasnameya wan çî be jî koçber her koçber e. Bigel nasnameya xwe ya koçberîyê ji bo pergala rûniştî û bicîwar ra talûkeyek e.

Bigel van daneyan em dikarin bibêjin koçber di welatê xwe yê nû de bi gel çand, ziman û nirxên xwe ve ciheke pîr-çandî, pîr-zimanî û cihereng jî çêdikin. Bo mînak îro Ewropa wek welatê koçberan, bihuşta koçberan tê hesibandin. Koçber ji ber sedemên ewlehîyê, aborîyê û perwerdehîyê ji her alîyê dinyayê ve koçê Ewropayê dikin û her cure nirxên xwe yê şênber di tûrikê hişê xwe de dibine wir. Bi gel van koçberan di demografiyê hem qadeke kozmopolît çêdibe û hem jî ji aliyê koçberên ji welatên cuda cuda hatine danûstandinên zimanî, çandî, edebî çêdibin bi vê hawî jî civakeke û cirbecur derdikeve holê. Prf. Dr. Safiye Yıldız di hevpeyvînekê xwe de li ser pîrçandîyê weha dibêje: “Kreuzberg wek taxeke ku koçber û bêhtirîn xelkê Tirkîyeyê lê dijîn, tê zanîn an jî wisa tê xuyakirin. Lê li wê taxê jî gelek xelkan kes dijîn. Çand curbicur e. Bi guhertina şewaza civakê re ragihandina civakê jî tê guhertin. Têgiha çandê dibe navneteweyî.” (Yıldız, 2020: 17).

Eger em têgeha koçê ji aliyê tevgera koçberan ve binirxînin em ê bikaribin sê xalan de binirxînin û van her sê xalan weha rave bikin: Ya yekem “xala derketinê” û dikarin wek “welatê jêder” jî binav bikin. Kesên ku ji welatê xwe jî ber sedemên aborî, siyâsî, çandî, û derûnî derketinê çî wek takekesî çî jî wek komî ferq nake cihên xwe diguherînin koç dîkin bi gel koçberîyê di civakê de qada demografiyê, çandê de gelek dînamîkên cîyewaz bigel xwe digerin. Xala duyem jî em dikarin wek destîstasyon “*destination*” an jî cihê tê armancikirin an ku welatê mazuvan binav bikin. Di navbera van her du xalan de jî cihekê bi navê “welatê transît” heye ku koçber jî bo cihê xwe yê armancikirî de bi kar tînin. Koçber di van her sê deqan de jî, yanî di van her sê erdan de jî di jîyana civakî de tevî çand, ziman, hîrayî û bi terzên xwe yê jîyanê faktorên bi bandor in. Yanî koçber bi gel nirxên xwe yê razber wek çand, ziman, dîrok, kevneşopî, nasname hwd. li welatê mazûvan civakekî pir tebeqeyî û pirrengî çêdikin. Van her sê mekanan jî hilû diken û li gorî armancên xwe dikarin biguherînin û bandorê lê bikin. Lê wexta em ji şibaka şênberîyê de li koçê binihêrin koçber bigel bedenên xwe yanî bi gotineke Deleuzyenî makîneyên şer in. Di vir de hem nirxên koçberan hem jî nirxên nişteciyan bi gel senteza nirxên koçber û nişteciyan bêcîwar dibe.

“Koçberî ne tenê guhertina cih û war e, di heman demê de ew tê guhertina şert û mercên jîyanê yê derveyî û derdora jîyan û xebatê nirxên çandî û civakî jî.” (Kızılhan, 2020:10). Rêwîtiya koçberan bi terzekê jîyanê ya bi herekettir(Bizavdar) dest pêdike û ti caran naqede, di vê rêwîtiyê de malvegerekî wan nîne. Di vir de rêwîtiya ku em behsê diken ne bi tenê rêwîtiyekê fizîkî ye ev rêwîti hem fizîkî û hem jî zînî ye. Ev rêwîtiya wan hem jî derekê ber bi derek din ve û hem jî ber bi derûniya mirovan e. Yanî qada koçberîyê qadeke gelek serêşî ye ku ji proseyan di nav hev de pêk tê. Koçberên di civakeke nû de li welatê mazuvan de li rastê nirx û çandên nû tên dibine sedema encamên psîkososyal û ji bo wan jî dibe sebeba streseke gelekî mezin. Di encama vê rêwîtiyê da ferd di derheqê derûniya xwe de tiştên nû hîn dibin û keşif dîkin. Yanî “yên koç dîkin û tên mişextkirin; di encama pêvajoya hevbandoriya jîyanî, çandî, yan entegre yan asîmîle yan jî marjînalîze dibin”. (Dildar, 2020:36).

Heger em bîne bîra xwe şerê navbera Îran û Îraqê de bi sed hezaran koçberên Kurd berê xwe dane Ewropa û Tirkîye û em dûr nefikirin, di destpêka

Serhildana Ereban de Şerê Suriyê yê navxweyî bû sedema pêlaka mezin ê koçberan. Mixabin di salên dawî de jî ev pêlên koçan, koçberan zêdetir bûne. “Sedema zêdebûna van pêlên koç û koçberan em dikarin weha rêz bikin: dewletên zû de têkçûyî an jî dewletên têk diçin, xakên bê dewlet û dewletên bê edalet dibin sebebê pêlên koçan.” (Bauman, 2018:36) Yanê koç li her derekê ye; komên jî derve tînin her ku diçe zêde dibin û ev rewş jî wek têgeheka civakî terza jîyana bajêran û bajêriyan diguherîne. Divê em niha li ser rewşa ‘jî derve hatî’ bifikirin. Ev tê çi wateyê? Di çarçoveyekê civakî û ampîrîk de têgiştina vê yekê hêsan e; ‘jî derve hatin’ yanê nişteciyê vê derê nebûn. Piştê pêlên koçberan hem pirsgirekên bi xwe ra tînin hem jî pirsgirekên cihê xwe yê nû de dibînin dibe rojev û hêj jî ev pirsgirekên koçberan aktûeliya xwe didomîne. Bo mînak di gelek rojname û malperên nûçeyan de koçberên ji Suriyê çi ye di behrê de qelûn kêşane bibû rojev û gelek alîyê hem henekên xwe bi vê rewşê kiribûn hem jî bi aweyêke tûj û xedar rexne kiribûn. Di dawiyê de rast derket ku ew kesê behrê de qelûn kêşabû hemwelatîyekî tirkîyê bû; ne Suriyeyî bû ne jî koçber bû. Piştî rastî derkete holê rexne û galehalê wan alîyên dîyar di hewa de man.

Di vir de li ser vê mînakê em dixwazin du daneyên xwe li ber we şênber biken. Wexta koçberek di behrê de qelûnê bikêşe dikare bibe pirsgirêk ev yek pirsgirêk jî ji ber ku ew kesê qelûnkêş çiyê ku wek koçberekê hatîyê lansekirin mezintir bû û li rojevê de rûnişt. Bû sedema gellek nîqaşan jî. Deqa me ya duyemîn jî ev e ku em dixwazin palpiştir biken: Çawanî û kodkirinên pergala kapîtalîst ya li ser amûr û bedenên e. Ji ber ku qelûn di çanda ereban de zêde tê bikaranîn ew hemwelatîyê Tirkîyê jî ji ber qelûnkêşîyê wek penaberekî, koçberekî hate kodkirin û wisa derkete ber raya giştî û mixabin hate lînçkirin jî.

Îro koç bûye perçeyekê jîyana mirovê potsmodern. Di jîyana postmodern da em dikarin koçê weha pênase bikin. Koç bi wateya gelemperî ji warekê ber bi wareke dî tevgerêkê tevahî(Spatial) ye. Mirov bi rêya koçê ji xwe ra qadên nû diafirînin. Di vê çarçoveyê de divê em balê bikêşine li ser cûdahiyên navbera qad û cihwarê. Qad erdnîgarî û cihwarê ku em lê dijîn, bi tevger, kirin, helwest û gotinên ku hem di asta şênber û hem jî di asta vegotinê de xuya dikin, radigire. Bingeha tevgera koçberîyê ew e ku mirov di asteka bilind de armancên(güdü, saîq) xwe pêk bîne. Wexta ku ferd têbigêhe ku li cihwarê lê dijî armancên wî

pêk nayên pêdivîya terkê mekanê di cîh de dibîne û xwesteka cihguhêzîyê şax dide û bi vê awayê jî fikra koçberîyê derdikeve holê. Sebebên ku koçberî di fikra postmodern da cihekî rehetir û mayînde peyda dike ev e: Postmodernîzm azadîyên berfireh dide ferdan, wîlê wekî çawa be wisa qebul dike û armanc nake ku ferdan têxe hin qalibên xwe. Takekes jixwe kodên serdemê haja wan pê tune yî digirine ser xwe. Di fikra modern dewletê da fikra ku divê her tişt ci cihê xwe de û bi rêk û pêk be serdest e lewra ferdekê li cihekê mayînde be kontrolkirina wîlê rehetir e. Ji ber vê ye koçberî li dijî heyîna modern dewletê ye.

Di mijara Koçberîyê de bi me fikrên, Deleuzeyî girîng in. Hinek alîyên Koçberîya Teorîk raste rast me dibene xebatên Gilles Deleuzeyî. Xebatên Deleuze û Guattarîyî ji bo koçberîyê bingehekî felsefî çêdike. Jixwe bêcîwarî û koçberî bingeha felsefeya Deleuzeyî ye. Deleuze û Guattarî (2014) di pirtûka xwe ya bi navê *Anti-Oedipus* de koçberên “Makîneyên Şer” ku naxwazin li dereke sabît bin û amraze-dewletê “Amraza Girtinê” ku dixwaze wan li dereke, sabît bike di çarçoveya mîtolojîya Hînd-Ewropayê de berawird diken. Li gorî Deleuze û Guattarî “di mîtolojîya Hînd-Ewropayê de hikimdarî du serî ye. Qral, sêrker, hiquqvan û deshilatdarîya keşe ya polîtîk.” (Deleuze, 2014) Ev her du qutbên dijberê hev xuya diken li gorî wan esildanî temamkerên hev in. Yanî hem dijminê hev in hem jî temamkerên hev in. Tundîya dewletê bi rêya polês û cerdewanan, mirovan digire û wan sabît dike. Polês û cerdewan astengê her cure şeran dibin, digirin û girê didin. Li ser polês û cerdewan jî dewled wek amraza girtinê hatiye bi navkirin. Deleuze û Guattarî ji bo danasandina koçberan têgeha “makîneyên şer” hilberandine û gotine ku koçber; ji bo sazumana dewletê divê neyêne sanayîkirin. Koçber derveyê deshilatdarîya dewletê de ne. Li gorî wan koçber ji zagonan, yaseyan direvin bi vê hawî jî naxwazin li derekê sabît (niştêcî) bin. Dewlet jî cihwarê wan girûzî dike wiha jî pê mebest dike ku xetên wan yê revê dagire. “Di vê peywendê de jî dewled hereketê dabeş dike û ji nû ve berhevkin, sabîtkin û sîno-darkirna xizê qet aciz nabe; dewlet li ser rêyên koçberan wek çavdêr, îknaker û bekçî xwe saz dike” (Deleuze û Guattarî, 2014:93). Koçber timîtim cih diguherînin. Ji bo koçber xaçerêyek, çîyayek, newalek bi tenê îşaretek e. Koçber ji bo ku li derekê niştêcî be bi rê nakeve. Rêya, koçber nehatîye îşaretkirin û dîyarkirin. Cihwarê, koçber hilû û şemîtok e. Parvekirina van cihan hêsantir e. Li cihwarê derûdora wê sûr nekirî de dikare bijî. Cihwarên xwecihan bi

sûran hatîne dorpêçkirin, û rêyên wan bi dîwaran hatine girtin, cihê wan hilû nîne lê cihwarê koçberan hilû û bi xetan ve hatiye îşaretkirin. Koçber dagir dike û rûdine. Di vê peywenda dewlet û koçberan de dê ev pirsra me cih de be. Gelo dewlet ji bo koçberan çima wargehan çêdike û çima di wan wargehên penaberan de li wan dinihêre pêdîvîyên wan yên wek xwarin, vexwarin, parastin, paqijî hwd pêk tîne? Dibe ku em bibêjin dewleteke baş e û li penaber, koçberan xwedî derketinê meseleyeke wijdanî û exlaqî dibîne û li ber raya giştî ya xwe û ya dinyayê de îmajêke baş bide nîşan. Lê bersiva vê pirsra me di felsefeya Deleuzîyan de pêş çav e. Me berê jî îfade kiribû ku di felsefeya Deleuzîyan de, koçber wek makîneyên şerî û dewled jî wek amraza girtinê hatîne bi navkirin. Yanî ev makîneyên şer yên ku di nezerê dewletê de ji bo heyîna dewletê tehdîd in divê ji alê dewletê ve werin kontrol kirin. Bi gotineke din, zemîna koçberan çi qasî girûzî be qada tevgera koçberan jî ew qasê tê astengkirin. Yanî dewlet bi mekanîzmaya wargeha penaber û koçberan mebest dike ku bi wargeh û kampan zemîna koçberan ya hilû girûzî bike û van makîneyên şerî têxe bin kontrola xwe û li qadeke teng de çavdêriya wan bike. Bi vê hawî jî dewled tahlûkeyeka li hemberî xwe bi rêya van wargehan têxe bin kontrola xwe.

Li gorî Deleuzeyî Kirde(subjects) “bi rêya koçê ji tundîya rejîmên totalîter dikarin xwe azad bikin.” (nql. Özbay 2020:254). Wek berê jî me îfade kirîye koçberî encama arezuya subjeyan e. Li gorî Emrah Özbay (2020) Deleuze di koçberîyê da pêşbînîya teşeyêke nû ya hebûna ferdan ya posmodern dibîne û di xebatekê xwe de dibêje ku “azadkirina kirdeyan(subjects), beden û xwestekê ji durketina navendê gengaz e.” (Özbay, 2020:256). Yên girêdayê navendekê ninîn, timîtim bihereket in; ji nasnameyên bi cî û belav dur in, serbixwe ne. Li gorî vê danasînê em jî diakrin pê ve zê de biken ku kesên koçber, bi afirandina mekanên nû xwe azad diken û ji bedenên alîyê kapîtalîzmê ve hatine kodkirin ewletir in. Goodchildî nêzîkbûna Deleûze û Guattariyî bo Koçberîya Teorîk weha dinirxîne: Êdî fikrên rast an xelet nînin, bi tenê fikir hene. “Êdî armanc û rêgezek nîhayî nîne, lê bi tenê geryanek li ser xetên revê yên ku ji navendên hêzê dûr dikevin hene.” (Goodchild, 2005: 45) Bi me hêjayê gotinê ye ku ev gotinên hana yên li ser koçberîyê balê dikşîne fonksîyona bêcîwarbûnê ya azadker û hilberîner. Lewra kesên ji navendê dûr dibin ji qural û zagonên wê navendê jî dûr dibin. Xwe nakine nav qalibên wê hêzê: li gorî qanûn û quralên navenda hêzê tevnagerin. Şeveqê

naçine li ser îş êvarê venagerine mala xwe, bi keyfa dilê xwe xetên xwe yên seyehatê, xwendinê, hilberandinê, hebûnê û afirandinê çêdiken. Koçberî, teşeyekê nû dide jîyana mirovan û civakan; mirovên ku têne, li ber qiraxên koçberîyê xwe bi bêcîwarbûnê dikemilînin.

Têgeha koçê divê bi tenê veguherandina cihwarî an jî ji cihekî bo çûyîna cihekê neyê qebulkirin. Mijara koçê divê li rex babetên sosyo-aborî, çandî bi mijarên koça navxweyî- derveyî, penaber, penahend, koçber, welatê jêderî, welatê transît jî bête nirxandin. “Koç têgehekî bi şaxezanistên erdnîgarî, dîrok, aborî, civaknasî, psîkolojîyê re girêdayî ye.” (Hatîpler û Daşkiran 2021:715) Bigel kadîbûn û veguherîna cîhanê di têgeha koçê de jî guherandinek derketîye holê. Ji bo ravekirina van guherinan jî çend têgeh hatine dariştandin. Yek ji van têgehan ya Everett Lee ye ku teorîya xwe bi Derkirin- Kêşan (*Push- Pulling*) bi nav kiriye. Ev teorî bi hêmanên aborîk li ser koçê radiweste. Teorîya Navend- Dêrdor (*Center- Periphery*) ku xwedî perspektîveke sosyalîst e, pêvajoya koçberîyê weke kolonyalîzmeke nû dinirxîne (Lee, 1966:52). “Teorîya Tora Peywendîyan, bandora têkilîyên navbera kesên koç kirine û kesên koçkirinê difikirin dinirxîne. Li gorî vê teorîyê jî ev pêwendî koçê teşwîq dike.” (Mutluer, 2003: 90)

Divê em ji bir neken ku bi qasê sebebên koçê; encamên koçê jî şopên giran li ser civak û ferdan dihêle. Me di xebata xwe da heya li vir bêtî ferqîyeta koçber, penaber, penaxwaz me îfadeya koçberê ji bo hemûyan bi kar anî û bi me pêwîst hat em van têgehan jî ji bo vegirîya xebata xwe binirxînin û bigel danasandina van têgehan ferqîyetên wan jî îfade biken.

1.5.1 Penaber, Penaxwaz, Koçber.

Têgeha ji welatekê penaxwazî bi qasê dîroka mirovahîyê kevn e. Ger dîroka sedemên mirovan ji axa wan derxistinê bihête zanîn dê rabirdûya penaxwazîyê ya dirêj û kevn jî dê bihête zanîn. “Li gorî dîtinekê têgehên penaberî û penaxwazîyê 3500 sal in heyîna didomîn û bi awayên cuda cuda di nivîsên şaristanîyên kevn de û kitêbên pîroz de şopên wan hene.” (Odman, 2020:120) Lê sedsala bîstemîn de mijara penabertî û penaxwazîyê wek problemeke mezin derkete ber me. Bi taybetî jî her du şerên cîhanê bûne sedemên koçên mezin. “Ji destpêka sedsala bîst û yekemîn heya niha jî erdnîgarîgarîya Rojhilatanavîn bûye

jêdera koçên girseyî ji ber van koçên girseyî jî penabertî û penaxwazî wek problemekê li ber raya giştî ye.(Barkin, 2014:334) Encamên siyasî, aborî, çandî û civakî yên pirsgerêka penaberîyê li ser welatên koçwergir û pirsgirekên mirovên wek penaber dijîn Neteweyên Yekbûyî ber bi çarserkirina vê pirsgirekê ve birîye. Ji boy çareserkirina van pirsgerêkan di dawîya şerê cîhanê yê yekemîn de Cemîyeta Neteweyan ji bo penaxwazên Alman û Ermen di bin banê Komîserîya Bilind de hin pêşgirî wergirtine. Piştî van pêşgirîyan ti encam nedan û carê jî piştî şerê cîhanê yê duyemîn di sala 1943an de Sazîya Alîkarî û Rehabîlîteyê ya Neteweyên Yekbûyî hatiye damezirandin. Di sala 1947an de jî vê sazîyê cihê bo daye Rêxistina Penaberan ya Nevnetewî. Van her du sazîyan jî di sala 1950an de sazîya ku hate damezirandin bingeha Komîsyona Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî ku îro jî li ser mafên penaberan bi awayekî çalak faalîyetên xwe didomîne (KBPNY) pêk anî.(Beter, 2006: 86).

Konfiçyûs dibêje ku: Nav rast nebin; navnîşan jî rast dernakevin. Di vê çarçoveyê da divê em van navan bi awayekî rast binirxînin û bînin ber çav da ku navnîşanên me jî rast bêne famkirin.Di hiquqa navnetewî de penaber wek *refugee*, penahend wek *asylumseeker*, koçber jî wek *immigrant* tê îfadekirin. Li gorî peymanê Hiquqa Navneteweyî penaber ew kesê ku “ji ber êrîşên derve, dagirkerî, serdestîya bîyanî an bûyerên ku bi giranî nîzama giştî li beşekî tehdîd dîkin, neçar dibin ku li cihê rûniştina xwe li derveyî welatê xwe derkeve û li cihekê din bigere.” (Sarilar, 2018:141). Bi gotineke dî mirovên êdî derfeta wan nîne li welatên xwe bîjin ji welatekê ku revînê daxwazîya penahendîyê bikin û ew daxwaza wan bê qebulkirin dibin penaber û bi vê qebulbûna penabertîya wan re ew li gorî gelek sazî û komeleyan dibin xwedî statûyek û mafên wan ên şexsî ji hêla van komele û sazîyên navnetewî tene parastin. Li gorî hevpeymanê Cenevreyê jî penaber ew kesê “ji ber nasnameya xwe ya nijadî, olî tabîyetî; endamîya wî ya komeke civakî, fikra wî ya siyasî dê rastê zilmê bê û ji ber tirsê derveyê welatê xwe ye û nikare vegere welatê xwe.”(Kurt, 2020: 58).

Penaxwaz jî wek statû mîna penabertîyê ye. Bi kurtasî penaber ew kesê (Bîyanî) penabertîya wî yê yanê daxwaza parastina navneteweyî hatiye qebulkirin e; penaxwaz jî ew kesê ku serî li penabertîyê lêxistîye lê hêj nehatîye qebulkirin. Kesê ku li benda encama serîlêdana penabertîyê kirîye ra penaxwaz tê gotin.

Peyva koçberîyê jî di vir de ji hêla wateyê ji penaber û penaxwezîyê vediqete lewra koçber têgehekê aborîyê ra têkildar e; ji bo jîyaneke nû û baş ji xwe ra biafirîn ji bo wan kesên ji welatê xwe koçî welatên din dikin ra tê gotin. (Sarilar, 2018:142) Lê penaber û penaxwaz ji ber sedemên derveyî wek şer, tundî, ewlehîya mal û canê yan mecbûr dimînin ji welatê xwe birevin yan jî bi darê zorê ji welatên xwe tên qewirandin. Yanî armanceke penaber an jî penaxwaz yê wek aborîk û xweşkirina şert û mercên jîyanê nîn e.

Koç û mişextî du têgehên bi hev ra eleqedar in. Li jorê bi kurtasî çend têgehên bi koçberîyê ra eleqedar me danasîna wan kirîye. Di danasandina van têgehan de divê em mebesta xwe jî bînin ziman. Ji ber ku ev têgehan di beşên û serenavên pêşîya me de gelek caran -wek karakterên romanên wek jî têgeh- dê bêne ber me, me jî danasîna van têgehan de pêwîstîyek dît. Bilî van têgehan ji bo tevgerîya xebata me divê em di bin jêrnavê de têgeha Mişextîyê (*exile*) jî binirxînin.

1.6. Mişextî.

“Mişextî wateya dûrxistina tiştekî radigire, wateya wê ya giştî jî veguhastina niştecîhên erdekî din e yan jî wan bi darê zorê li erdekî din didine jiyîn.” (Timur 2017:28). Li gorî Loic Wacquant mişextî, ji takekeseke ra, ji komêkê ra, ji lijneyekê ra teksîskirina cihekê nedîyar an ku pozîsyoneka berjêrtir e (Wacquant, 2019: 130). Mişextî di çarçoveya erdnîgarî de tê wateya ji cih û warê xwe dûrketinê li rex vê jî xetên aborîk, çandî û siyasî jî di xwe da dihevin. Bi me qadekî gelek berfireh e lewra ev têgeh rê li ber nîqaşa koçê, cihguhezîyê, mafên kêmeneteweyê, mal, hal, war, edebîyat hûner, welat hwd... vedike. Ger em hevoka xwe ya jorê me nivîsî fireh biken divê em vê bîne ziman: Wekî berê jî me îfade kirye mirovekî ji warê xwe çî bi dilê xwe; çî bi darê zorê derketîye, dibe koçber, koçber an penaber an jî penaxwaz mijar û problemên cihereng bi xwe ra tîne. Ev problemên ha jî di jîyana siyasî, çandî, edebî, aborî de derdikevine pêşîya me. Canel Bingolî (2018) di xebatekê xwe de berfirehîya mijara mişextîyê weha anîye ziman: “Xebatên ser mişextîyê, li ser belavbûna cihwaran damezirîye ji ber vê jî pêdivîya nêrînekî kadîbûyî di xwe da dihevin.” (Bingöl, 2018:38). Ji ber vê jî mijara mişextîyê mijarekî gelek vegirtî û berfireh e. Ji bo tevlihevîyekê teginî

çênebe û mijara me baş bihête têgehiştin em ê wek têgeh û bûyerê, peyva mişextîyê “exile” bi kar bînin; ji bo kesê mişext, peyva nefîyê “exile person”; ji bo cihê mişextîyê jî em ê peyva tarewgehê “place of exile” bi kar bînin.

Wexta em li dîrokê binihêrin ji destpêka mirovahîyê heya niha mişextîyê xwe bi gel heyîna mirovan, civakan, çandan anîye heya roja me. Ma qewirandina Hz. Ademî jî ji bihuştê ber dinyayê mişextîyek nebe çî ye? Li gorî vebêjeya mîtan de di dinyayê de çî kes hingê Oedîpusî nehatîye nefîkirin. Oedîpus û Hz. Mûsa di pêşîyê da hatine terkirin paşî dûrê welatê xwe hatine pêsikandin. Di şahîyekê de Oedîpusî ra tê gotin ku tu qet naşibî dayik û bavê xwe; li ser vê gotinê Oedîpus mat dimîne û ji bo xwe nas bike berê xwe dide Korînthosê. Pirsra ku Oedîpus radike ser rê ‘ Ez kî me’ ye. Lêbelê di trajedîya qedera xwe de rastê trajedîyekê mezintir tê. Musayê îbranî ji kokên xwe bêxeber nîne lê Musa di nav cotenîrxekî de dijîya. Mina Misrîyên esilzade dijîya lê wexta ku ji kokê xwe yê îbranî dihesa welatê Misrê terk dike. Oedîpus û Musa mecbur mane ku malbatên xwe ku ew pêsi kirine û welatên xwe terk biken wexta derketine rê bandora kokên xwe hesîyane.

Li jorê me dorhêla mişextîyê li ser Oedîpus û Hz. Mûsa du mînak dan. Ev her du mînak jî bi bandora lêgerîna kokê û nasnameyê ve çêbûnê. Yanî rêwîtiyek e ku bi pirsra ‘ez kî me’ yê dest pêkirîye. Bi gotinekî din mişextîya Oedîpusî û Hz. Mûsa bi dilê wan çêbûye. Ji aliyê ti kes û kesan ve nehatine qewirandin, ew bi xwe ji bo lêgerîna nasname û kokên xwe rabûne ser rê. Mişextîyeke bi dilê wan e ku bi darê zorê ji alê ti kesê ve nehatine qewirandin an ku nefîkirin lê dîsa em van her du kesan dikarin di çarçoveya mişextîyeke travmatîk de kategorîze biken. Lewra di encamê de hem Hz. Mûsa hem jî Oedîpus bi ji cihûwarê xwe yanî ji hindîrê welatê xwe derketine derveyê welatê xwe û li qiraxên bêcîwarbûnê, li pey qedera xwe ya travmatîk çûne.

Mişextî, ji cihûwar bûn û koçberî berî her tiştê xirabûna rewşa hindir û derve ye. Rewşa takekes ya hindir, ku di rehma dayikê de despê kirye; bi gel ji rehma dayikê veqetîna bûye tecrubeyeke domdar. Yanî em dikarin bibêjin cihwarê mirovan yê ewwil rehma dayikê ye û zayîna mirovan an jî veqetîna mirovan ya ji rehma dayikê yekem mişextîya mirovan e. Wexta mirov ji rehma dayikê veqete mişextîya xwe ya ewwil dijî û ev mişextî, ji mirovan ra vediguhere tecrûbeyekê. Mirov çî qasê jî ji rehma dayîka dûr be; li ser mişextî û xwe çêkirinê da ew qasê

dibe xwedan tecrûbe û li derveyê cihwarê xwe yê ewwil bicîwar dibe. Hatîce Metîn (2021) di xebateke xwe îfade dike ku: “di vê tecrûbeyê de figûra dayîkê ciheke girîng digire. Lewra ya ku takekes hindir de digire dayîk e û di konteksa malbat, bajar, civak û welat yekem heleqa hindir de mayînê dîsa dayîk e.” (Metin, 2021:541). Li ser cihwarê û mişextîyê di vê çarçoveyê da em dikarin bibêjin, figûra dayîkê û di vê perywendê de jî zimanê dayîkê ciheke girîng digire lewra dayîk di deqa aîdbûna cihûwarekê de peywendîya yekemîn e. Veqetîna ji vê peywendê di mîrovan de rê li ber çêbûna gelek hestîyarîyan vedike.

Hemû koç, mişextî bi veqetînekî dest pêdikin veqetînekî yan di bin baskê misogerîyê yan jî rêwîtiyeke bi dilê xwe. Wexta em li ser mijara mişextîyê serê xwe biêşînin em ê xwe di nav paradîgmaya mişextîyê de jî bibinîn. Koçberîya bi darê zorê; problema kokê, nasnamê, bîra civakî, sedemên civakî, hilberînên çandî hwd. Gelek tiştên bîra me lê ya ku misoger û neyêrev ev e: “mişextî jîyîna tiştê teqez e. Bi hatina qiraxên bêcîwarbûnê despê dike û lezîna wê jî ji hêza şert û mercan tê. Piştî têkçûna şeran de lêgerîna xwesteka spartina cih û warekê ye.” (Andaç, 1996:13). Di vir de em dixwazin balê bikêşîne li ser têkçûna şeran. Ev şer dibe ku şerên fîzîkî û fîlî bin lê ji ber ku xebata me xebateke edebî ye em dixwazin behsa şerên ramyarî jî biken. Şerên fîlî û ramyarî çî qasê dijwar be mişextî jî ew qasê bi tews dibe. Yanî gelek kes hene ku ji ber nêrînan xwe yê dijber ji alê otorîteyan ve tînin nefîkirin an ku ji ber fikrên xwe neçar dimînin û berê xwe didene mişextîyê.

Mişextî wek peyv, di lîteratûra me kurdan de hem di qada edebîyata devkî hem jî qada edebîyata nivîskî da ji xwe ra zêde cîh nedîye. Me şûna vê têgehê peyva xerîbîyê, welatê xerîbîyê, xerîbîstan bi kar anîye û ev peyvana di stranên me de, dengbêjîyên me de, çîrok û lorîkên me de gelek cih girtîye û dewlemendîya peyva xerîbîyê ji hêla ravekirina rewşê di hişê gel de bûye îmgerekî hevpar. Li ser welatê xerîbîyê gotinên nivîskarê Kurd Mehmed Uzun weha ne.

“Piştî salên xwe yên girtîgehê min zanî ku Çiyayên Kafkasê, Xiyabanên Yemenê, Giravên Yewnanê û welatên Mexrîbê terawgehên Kurdan e. Kurd wek malbatî, takekesî û pîrî caran jî bi girseyî bi darê zorê ber bi wan erdên nas nakin, nizanin hatine nefîkirin. Di şevên girtîgehê de min zanî ku rêyên diçine Welatê xerîbîyê bi cesedên Kurdan ve hatine tejkirin. Min jî dengbêjên di girtîgeha me da zanî ku di wan rêyên xerîbîyê da dengê hawarên Kurdan tevli dengê bazan dibû. Min jî dengê dengbêjên kurdan bihîst êş, hesret û keserên nefiyên welatê xerîbîyê.

Wê wextê min zanî welatê xerîbîyê ka dihête çî wateyê; mişextî, jî kokê û jî welat veqetandin, mehkumîyeta jîyanekê nedîyar, jîbîrîkirin û hesret û nostaljiyekî bê dawî ye. Welatê xerîb an jî welatê xerîbîyê trajediyekî mirovahîyê di xwe da dihevinê”.(Uzun, 1996:51-52)

Li ser van gotinên Mehmed Uzunî em dikarin bibêjin sedem û encamên gotina welatê xerîbîyê wek mişextîya roja me ya modern hatîye hatiye pênasîkirin. Lewra Mehmed Uzun di gotinên xwe de hem bal kişandîye li ser nefîkirinên takekesî û girseyî û hem jî bal kişandîye li ser proseyan mişextîyê bigel êş û azarên di rêyan welatê xerîbîyê de problema kokê, û etnîsîteyê jî anîye zimên. Bi me Mehmed Uzun di vê warî de problema mişextîyê bi awayekî hestîyarî û etnîkî anîye ziman lê divê em jî çarçoveya xwe dernekevin û jî bîr mekin ku mişextî problemeka kadîbûyî û gerdûnî ye. Her wiha me bal kişandê li ser Mehmed Uzun ê nivîskarê me ku nasnameya xwe ya edebî di nefîtiya xwe de çê kirîye li ser vê jî divê em behsa edebîyata mişextîyê û mişextîya ku bi vê mijarê ra têkildar e behsa mişextîya rewşenbîrî û edebîyata mişextîyê jî bikin.

1.6.1. Mişextîya Rewşenbîr.

“Mirov ji ber fikrên xwe mişext dibin û dijîn” dibêje Ferîdun Andaç. Bêguman, mişextî dîyardek e ku ji pevçûnan dertê û ji dijraberîyekî çî di nava xwebûna ferd de çî jî civaka ku tê de dijî, çêdibe Wexta em li ser mişextiya ji ber fikaran bisekinin dê mirovên curetkar, rexnegir û marjînal bêne bîra me; belê, ev mirov wek entellektuel tên bi navkirin. Ji bo rastîya sepanê em wenda neken divê em dernekevîne nêçîra têgehan. Em ê hewl bidin çarçoveya rewşenbîrîyê diyar bikin û di çarçoveyên bijarte de mişextîya wan û fonksiyonên wan yên di mişextîyê de binirxînin.

Li gorî Karl Marksî rewşenbîr ew kes e ku; mîna her takekeseke civakê, kesê sinifa xwe temsîl dike û şewqa sinifa xwe bi gel kar û zîrekîya dide. Yanî koma ku jê derketîye çî be ew jî taybetîyên koma xwe radigire. Ger jî koma karkeran hatibe û pêşengîya koma xwe kiribe dê şoreşê de jî bi kêr bê. Yanî rewşenbîr, bi gel fikr û ramanên xwe, tevgerên xwe, sekn û helwestên xwe ve, divê nûnertîya zûmreya xwe, koma xwe, civaka xwe bike û di pêşvebirina van komên xwe de bi çalak û bi bandor be.

Li gorî îdealîstan divê rewşenbîr miroveke mînak û karkerê doza xwe be. Mîrovê mînak ku rêberîya pêşveçûna milletê xwe dike divê xwedî dozekî be. Bi gotina Remzî Ağıt karê pêşveçûnê ji hêla deqa hereketê û serkeftinê ve pala xwe dide mirovên mînak. Yanî bi van gotinan mebesta ew e ku em balê bikêşîne li ser fonksîyona mirovên civaka xwe de pêşketî û zana. Mirovên pêşketî û zana teqez di her civakê de hene lê mirovên van zanyarî û pêşketinên xwe di xidmeta civaka xwe diemilînin kêma in. Kesê ku tecrûbe û teorîyên xwe yên zanistî li dor hêla xizmeta civaka xwe da biemilîne bi me ew kirdeyeke bi bandor e. Her wiha bi gel fonksîyona van mirovan em dixwazin bandora wan jî bînin ziman. Wexta em li ser bandora tiştê rawestî bê guman dê têgehên guherîn û veguhezînê bêne bîra me. Lewra di qanûnên fîzîkê de jî têgehekî bi navê tek û bertekê heye ku di pîvana tekê de guherîn çêdibin. Rewşenbîr jî bi qasê bandorên xwe dikarin di civaka xwe de guherîn û veguhezînan bînin holê. Lê berê van tiştan divê em têgeha “Rewşenbîrê” rave bikin ku li dorhêla vê têgehê de jî teşeyekê bidene vê beşa xebata xwe.

Li ser vê peyvê lîteratûreke berfireh heye û wateya wê li gorî dema guherîye. “Koka peyvê digehe *entelîjansya, entellektuel, clerck, litaratî* û ev têgihanên ji bo kesên ku karên profesyonel dikin û kesên ku perwerdehiya zanîngehan standine dihat bikaranîn.” (Ekici 2014:317). Peyva rewşenbîr jî di Kurdî de li şûna peyva entellektuelê tê bikaranîn. Kesên ku rewşa holê da dibînin analîz dikin û bi rexneyî tînin ziman. Ponijîn nemaze bo sedsala me karekî curetkar e û bi gel vê jî wêrektîyê dixwaze. Sedsala bîst û yekemîn bigel zext, êş, kedmêjî û tehaakkûmê ve jîyana mirovahîyê û ya civakê dagirtîye. Her wiha di vê sedsalê de li dijî van kiryarên sedsalê, ramanwer derketine û bi gel fikr û ramanên xwe yên rexneyî alîkarîya me kirine ji bo ku em vê sedsalê û rewşa civakî, çandî û polîtîk fêma bikin rê li ber me vikirine. “Li hemberî şûrê kapîtalîzmê gotin û rexneyên rewşenbîran hene.” (Sökmen ûynd. 2010:25). Li gorî van gotinan jî em pê derînin ku rewşenbîr ji bo jîyana kollektîv û civakê takekesên taybet in ku di warê fikr û raman de pêşengîyê bo civakê dikin.

Kapîtalîzm, dara ku nekare sîya wê bifiroşe wê darê dibire. Mişextîya rewşenbîran jî bi me kêma zêde nêzikê vê gotinê ye. Kesê ku li hemberî kiryarên pergale derdikevin mirovên zimantûj in ji ber vê jî ji alê otorîteyê ve nayên

pejirandin. Rewşenbîr bi gel rexne û analîzên xwe yê li ser pergala otorîter û zordar ji alê otorîteyê ve wek talûkeyekê têne dîtin û ev yekana jî rê li ber mişextbûna wan vedike. Firotin û mişextkirin ev her du peyv jî ravekerê çalakîya dûrxistinê ne. Yanî ji bo pergala totalîter, ferd an jî obje ferq nake yê li hemberî wan rabe divê bihêne dûrxistin û bigel vê dûrxistinê bê bandorkirin û lawazkirina fikran tê armanckirin. Bi taybetî wexta rewşenbîrek ji civaka xwe bête dûrxistin û mişextkirin civak jî ji alê fikir û çarenûsîyê de lawaz dibin. Bigel vê lawazbûna civakê sistkirina mekanîzmaya bertekan tê armanckirin. Wekî diyar e ku rewşenbîr bigel fonksiyonên xwe yê dijrabîyê hem wijdan û hem jî aqilê civakê xwe ne. Di vir de em dixwazin di van rejîmên totalîter de sekn û helwestên reşenbîran bînin ziman. Li dereke zilm û zextî hebe li wir trajedîyên mirovahîyê yê mezin jî hene û li hember zilm û zextîyê deng derxistin helwesteke exlaqî û polîtîk e. “Li erdên kevneperest ku em lê mezin bûne êdî jîyan ne gengaz e û di rewşekê neyêkêş de ye. Berdêla her rihetîyekê li wir bi gel berjewendîyên malbatî têketina peywendîyên perpûsî ne, ji zanîna ra xîyanet e.” (Said, 1996:86) Wekî tê dîtin ku Edward Saidê bêcîwar di nav civaka xwe ya kevneperest de jîyîna mumkin nabîne û li dijrabûna pergala civaka xwe, wek meseleyeke exlaqî dibîne. Bi van gotinên xwe de bi me fonksiyonên, erkên rewşenbîrekê jî tîne ziman.

Sekn û helwesta rewşenbîran li hember rejîmên totalîter wek bertekeke tûj û rexneyî rû dide. Di nav pergaleke totalîter de encama neyêrev ya bertekê tûj û rexneyî ji berê ve diyar e, yan zindan e yan jî mişextî ye. Rewşenbîrî piçek bi marjînalîteyê ra têkildar e, cihê lê dijî nerehetbûn û rehetînedan karê rewşenbîrê yê ewil e, ji ber vê jî pirê wan ên ku karê katibîya dîktatoran nehilbijartî ber pêlên mişextîyê xwe di welateke bîyanî de dibînin. Yanî em dikarin bibêjin ku rewşenbîrê çûye mişextîyê dadikeve pêvajoya bêcîwarîyê jî (Akay 1996b). Di vir de wek reflekseke bêcîwarî û mişextîyê rewşenbîr serê xwe bi pirsgerêkên welatê xwe yê jê revîyî ve diêşîne xwe jî bi vê hawî dixê cîwarê xwe. Nefiyê ku pirsgerêkan li ser rabirdûyê û cihwarê berê damezirîne, xwe wisa dikare bicîwar bike. Di destpêke ke me anîbû zimên ku Li gorî Deleuze û Guattarîyê xetên takekes yê revê ber bi paşerojê ve be xwe bicîwar dike. Lê xetên rewşenbîrî yê revê ber bi rabirdû, nasname, kok, welatê jêder e lêbelê rewşenbîr çawa çêdibe ku di rewşekê bi vê halî de bicîwar dibe? Bi me mînakê bavê Kafkayî dê vê pirsê

zelal bike. Babê Kafkayî yê ji gund koçê bajêr kirî di haleke bêcîwar de ye; lewra li bajêr, ji aliyê çand û jîyana bajêrî tevgerên ku kesayetîya wî pêk anîne û cih û warê wî, bicîwarbûna wî pêkan kirine her ku diçe tene kusandin. Bavê kafka di vir de ji bo xwe bicîwar bike kiryarên jîyana xwe ya gundîkî, yanê kiryarên xwe yê jîyana xwe ya berê di malbata xwe de dike. Li mişextîyê bicîwarbûna rewşenbîrê jî bi me bi vê hawî ye. Lewra taybetîyên ku kesayetîya rewşenbîrê çêdike çi be disa ew taybetî ne cih û warê rewşenbîrê çêdikin. Rewşenbîr bi pirsgerêkên civaka xwe ra çi qasê mijûl be, çi qasê serê xwe biêşîne, ji bo civaka xwe çi qasê hilberîne; ew qasî jî bicîwar dibe lewra dîyarkerên fonksîyonên rewşenbîrîyê ev in û rewşenbîr, ji van xetan pêk tên. Wexta ku rewşenbîr ji van xetan dur be, bêcîwar dibe li mişextîyê jî ji bo ku xwe ji nû ve bicîwar bike divê ber bi xetên xwe yê revê ve biçe.

Rewşenbîr ne hewce ye bi tenê li ser aîdîyetên xwe yê nasnameyî, civakî çandî bifikire, rewşenbîr dibe ku li ser pirsgerêkên civakeke din jî bifikire serê xwe pê biêşîne ku nasnameya wê ne ji etnîsîteya wê civakê ye. Li ser vê gotina me, di vir de Edward Said tê bîra me. Edward Saidê pêşengê rexnegirîya postkolonyalîzmê û nefiyê li pişt nasnameya bêcîwarbûnê di sala 1935an de li Qudûsê di malbateke Fêylîstînî û xristîyan de hatîye dinê di navbera nasnameya xwe ya bi dilê xwe hîlbijartî û nasnameya entelektuelê rasteqîn de peywendîyek baş damezirandîye. (Eren, 2011:44) Edward Said di otobîyografiya xwe *Yersizyurtsuz* (Out Of Place) ku di sala 1999an de weşandîye di qonaxên xwe yê zarokî û ciwanîyê de mereqa xwe ya li ser mirov û amûran tîne ziman. Edward Said di sala 1947an de piştî ku ji bo Cihûyan çekirina erdekê parvekirina axên Feylîstînê tevî malbata xwe dibe penaber û koçê Kahîreyê dikan. Sekna Edward Said ji bo sekn û helwesta rewşenbîrîyê sekneke balkêş û mînak e. Lewra wexta em li ser jiyana Said ya ramyarîyê binihêrin: Bi gel geşedana problema Feylîstînê û geşedana wî ya rewşenbîrî deqên hevpar dê bihêne dîtin. “Bi tenê rêveberîya Îsraîlê ne Yaser Erefat û koma wî jî ji rexneyên Said para xwe hilgirtine.” (Kenan, 2003:172) Bi van gotinan jî em têdigihejin ku fonksîyona rewşenbîreke ya ewwîlî ev e ku divê rewşenbîr xwe aidê ti derekê, komekê nebîne. Her tim bêcîwar be xwe wek bêcîwarekî bibîne. Ji ber vê yekê jî dê ev gotinên Adorno teza me piştrasttir bike: “Divê em mala xwe wek stargeheke nebînin û di wir de divê em

hest pê neken ku em di mala xwe da ne, ev yek perçeyekî exlaqê ye.” (Adorno, 2012:44)

Me di vir da behsa kesayetî û taybetîyên rewşenbîrê kirine divê em di vir de xalekê ji bo nasname û kesayetîyê jî veken gelo çi bandora van faktoran heye li ser rewşebîr û mişextîya rewşenbîrî. Gelo rewşenbîrek dikare bibe rêberê mirovên derveyê koma xwe an ku dikare mafê wan biparêze? Em ê niha bikevine pey van bersivên pirsên xwe.

“Di çend salên dawî de di vegotina kurdî da çend peyvên cihê, wek pênase, huwîyet, hewênî, şunas, nasname ji bo nîşandana têgeha *identity* hatine bi kar anîn.” (Ahmedzade 2014:49). “Bi gel vê jî wek pirsgirêkeke serdema nûjen hem di qada akademîyê de hem jî di qada civakî û qada jîyana takekesî da bûye têgihek tê kirpandin.” (Bilgin, 1995:66). Pênaseya nasnameyê ku em li dorhêla pirsên wek ; “Ez kî me? Aidê ku derê me ? Ez ê çawa rikîbibim?” de çêdikin gelekî diwar e. Sedemên vê yekê jî ji xwezaya nasnameyê tê ku nasname bi gelek dîsplanan ve têkildar e. Alî Akay(1996a) di xebateke xwe de dibêje: “Di rastîyê de nasname ne bi tenê bi dîrokê ve girêdayî ye, her weha bi ziman, deverên erdnîgarî, karakter, kordînat, vektor û aksîyomên ku ew dîrok tê de dijî ve girêdayî ye.” (Akay 1996a:73). Yanî di vir de pêkanînerên heyberê wek çand, zayend, xak, niştîman, netewe, dê û bav tînin vegotin. Ev hêmanan hemû bi gel hev nasnameyekê diafirînin û heyberan didin nasandin. Bi kurtasî pênaseya nasnameyê ke kolektîv e. “Milet yanî civak, çandê diafirîne paşî ew çand jî heyîn û nasnameya wê civakê diafirîne”.(Sezen, 2002:95) Tiştê ku takekes ji van taybetîyan dûr dixê û cihêyîyê takekes dîyar dike kesayetî ye. Kesayetî jî ev tişt e ku “tevhîya taybetîyên takekes ji kesên din vediqetîne. Ev teybetî dibe ku xwezayî bin û di be ku bi destxistî bin. Yanî kesayet alîyên takekes, wek taybetîyên zîhnî, hestîyarî, civakî û fizîkî yên domdar radigire.” (Özdemir ûynd. 2012:567). Di vir de qesta me ji kesayetîyê sekn, bertek, helwest, derûnî ye. Ali Akay(1996b:71) di xebata xwe da keseyatîyê wek rasteqînî, heqîqet (sahicilik) dide nîşan û tiştên, hêmanên din jî wek nasnameya kolektîv dide nîşan.

1.6.2. Edebîyata Mişextîyê.

Julio Cortazar dibêje “mişextî wek bûyer û hem jî wek mijareka edebî, edebîyata Amerîkaya Latîn ya îro di bin deshilatdarîya xwe da digire.” (Cortazar, 1996:24) Li gorî Cortazar mijara mişextîyê bûye serenavek girîng û edebîyata Amerîkaya Latîn, li dor hêla vê serenavê tê afirandin. Divê em vê pirsê ji xwe bikin. Gelo edebîyata me ya Kurdan an ku Edebîyatên milletên din jî weha ne? Ger em li edebîyata xwe binêrin em ê rastîyekê micid bibînin ku rastîya edebîyata me kurdan jî li dor hêla bûyer û mijara mişextîyê çerx dizivire. Bo mînak Mehmed Uzun (1953-2006), Mahmud Baksî (1944-2000), Bextîyar Elî (1961-...), Ferhad Pîrbal (1961- ...), Firat Cewerî (1959- ...) vana û gelek nivîskarên me ên din nasnameya xwe ya edebî di mişextîyê de çê kirine. Berhemên wan ên ji dîyasporayê derketine û belavê welatê me bûne. Di edebîyata kurdî de qada nivîskî de tişteke sosret heye ku gelek berhemên kurdî di mişextîyê de hatine nivîsandin an ku hatine derxistin. Yekem Rojnameya me *Rojnameya Kurdistanê* di sala 1898an de li dûrê Kurdistanê hatiye derxistin. Yekem kovara me *Rojî Kurd* di sala 1913an de li Stenbolê hatiye derxistin. Kovara dengê zanîna me kurdan tê hesibandin *Hawar* li Şamê hatiye derxistin û ji van. Li ser van belkû bête gotin Stenbol, Şam di wan serdeman de navendên entellektûelîyîyê, bajarê derftetan û cihê zanîne bûn. Belê rast e; bandora van hêmanan jî hebûye li ser van berhemên me, lê tiştê divê neyê jibîrkin bi me ev e. Ev berhemîn, ji yalê nefiyên Kurd ve hatine derxistin. Nefiyên ji welatê xwe, ji zimanê xwe, ji çand û kevneşopîyên xwe dûr. Bi me em dikarin bibêjin ev berhemên yekemîn, hilberînên mişextîyê, li ser edîb û nivîskarên me, şewqekî mişextîyê bûne. Hêj ku em dikarin bibêjin ku yekemîn romana modern ya edebîyata Kurdî ya Erebe Şemo *Şivanê Kurmanca* jî li dor hêla mişextîyekê di encama ji welêt, cih û warê xwe durketinekê hatiye nivîsin. Lewra Erebe Şemo di romana xwe ya otobîyogrefîk de tim û tim di nêv rêwîtyekê de ye û her serpehatîyên wî dûrê ji warê wî ji kokê wî hatine serê wî. Ger em van hevokên Erebe Şemo (Shamilov, 2009) bînin zimên dê gotina me çêtir bête fêmkirin. “Min gura firqê kir, biharê 1924- salê ez hatme Revanê, wekî nava Kurmanca bixebitim. Li Tîblîsê da gelle kurmanc hebûn. Gundê em tê da diman, Sûsîziya, tev hatibû ketibû kuçê Tîblîsê, îdarê xwe dikir”. Ji vê kinarî ve em dikarin romana Erebe Şamilov *Şivanê Kurmanca* jî di kategoriya edebîyata

mişextîyê de binirxînin. Ger em di edebîyata kurdî bikene du beş em dikarin van her du beşan weha ji hev biqetînin: edebîyata li welêt û edebîyata li mişextîyê. Ji van beşan ya rewnaq û ya dewlemed teqez dê edebîyata mişextîyê be. Lewra rewşenbîr, zana, hûnermend û nivîskarên herî bijarte yên kurdan ji ber sedemên sîyasî, şer, aborî, tundî û fikrî li derveyê welatê xwe li mişextîyê berhemên xwe çêkirine.

Di vê mijarê de em dikarin palpiştên xwe zêdetir biken bo mînak di edebîyata tirkî de jî romana Namik Kemalî ya bi navê *İntibah* wek yekem romana modern tê qebl kirin. “Namik Kemalî ev romana xwe di navbera salên 1873-1876an de di nefîtiya xwe ya Magusayê de nivîsandîye.” (Ertuş, 2022:179) Wekî tê dîtin me li ser edebîyata mişextîyê ji du edebîyatan du heb mînak dan û em di van mînakan de hilberînerîya mişextîyê ya çalak û bi bandor dibînin. Ji bo ku em mijarê lokalîze nekin divê em ji edebîyata cîhanê jî çend heb mînakan biden û mijara xwe berfirehtir biken û bi vê hawî jî kadîbûna edebîyata mişextîyê bikirpînin.

Nivîskarê mezin ê Rûs Dostoyevskî, ji ber deynên xwe yê xumarê yê ku nekariye bide da dernekeve ber dadgeha Rûs neçar maye û revîye Ewropayê. Li gorî hinek gotinan nefîtiya wî ya Ewropayê ya çar salan ji wî ra ji cezayê kûrekê û mişextîya Sîbîryayê girantir hatîye û ji bo ku vegere welatê xwe, di wan çar salên xwe de romanên xwe yên bi navê *Suc û Ceza*, *Xumarbaz*, *Budala* û *Eccînîyan* dinivîse. Piştî ku perê pê bikare deynê xwe razîne qezenç dike, bi biryara dadgehê vegera bo welatê xwe dest dixe. (Karaca, 1996:182-183).

Wekî tê dîtin Dostoyevskî mişextîya Ewropayê ji cezayê kûrekê û ji mişextîya Sîbîryayê neyêkêştir dîtiye û ji bo vegere cihê xwe warê xwe di nava çar salan de berhemînên gelek hêja afirandîye û xwe bi rêya nivîsê ji mişextîyê rizgar dike. Di vir de fonksiyona nivîsê ya dualî tê ber me. Dostoyevskî, bi zimanê xwe nivîsînê xwe ji mişextîya xwe ya Ewropayê bi awayeke manewî rizgar kirîye bi dahatûya wan berhemên xwe jî xwe bi awayekê fizikî ji mişextîyê rizgar kirîye. Di vir de em dibînin ku bi edebîyata zimanê dayikê nivîskar, dikarin xwe stres û tundîyên mişextîyê xilas biken.

Pablo Neruda di sala 1948ê ser piştî hespê, wexta li çiyayên Andê li pişt xwe ve dihişt terkê welatê xwe dikir, diçû mişextîyê, dikete serdema şairîtiya xwe ya herî hilberdar. Kesên hatine qewirandin hene, kesen ku ji bo rêgezên xwe ji revê wêdetir çarenûsa wan nînin hene lê hin kes jî hene ku belesebe çûne hene. “Çûyîna van kesên belesebe çûne ji bo ku tiştên di hişê xwe de çê biken wateyeke

cûda di xwe de dihewîne.” (Luit, 1996:67). Yanî mişextî ji bo wan dibe stratejîyeke nivîskî û hîleyeke afirandinê. Jixwe li gorî James Joyceyê mezintirîn çekê nivîskaran mişextî, bêdengî û hîle ye. Yanî li gorî van daneyan jî em dîsa dibînin ku mişextî, bêcîwarî ji bo edîb û nivîskaran dibe hêzeke afirandinê, xetekê ji nû ve bûyînê.

Ji van daneyên li jorê wekî berê jî me anîye zimên di encama bêcîwarbûneka mişextîyê de ku em li ser edebîyatê binirxînin; proseyeke hilberîner û azadker dest pê dike. Nivîskar, rewşenbîr an jî hûnermend ji bo xwe azad bike û ji xwe ra xetekê revê çêbike û ji nû ve bi cî û war bibe dest pê afirînerîyeke edebî û hûnerî dike. Piştî van gotinan dibe ku serê me da pirsekê bi vê hawî çêbibe: gelo mişextî herkesê dike nivîskar, rewşenbîr an jî hûnermend? Bersiva vê pirsê bi qasê hêsanbûna wê ew qasê jî tevlihev e. Edward Said pirtûka xwe bi navê *Entellektüel Sürgün, Marjinal, Yabancı* (2018) de weha dibêje: “eger em ji sikakê çend merivan bizivirînin û li ser meseleyên etîk û polîtîkayê çend pirsan ji wan biken dê bersivên wan jî hema hema nêzîkê bersivên entelektûlekê be”. Herkesek dikare binivîse lê herkesek nikare bibe nivîskar. Pîvanên nivîskarîyê, rewşenbîrîyê ji alîyê gel ve têne xêzkirin û keseke bikaribe bikeve nava van pîvanan, di nezdê civakê de dikare bibe nivîskar, rewşenbîr. Yanî keseke bikaribe nav pîvanên red û qebûlîya civakê de tevbigere birame, êş û rewşên civakê, xwestek û dengê civakê bîne ziman nebe palpiştê otorîte û deshilatdaran ew di nezdê civaka xwe de an jî civakên din de dibe ku bibe rewşenbîrek. Disa Edward Said di heman xebata xwe da pênaseya rewşenbîrê weha dike: rewşenbîr divê berê mesafê bêxe navbera xwe û otorîteyê û divê xulamtîya otorîteyê nepejirîne paşî jî divê mesafeyê bêxe navbera xwe û netewa xwe, ola xwe, kevneşopîyên xwe. Yanî divê berî her tiştê rewşenbîrek di pozîsyona bêcîwarîyê de be û mesafeyekê şênber hebe di navbera wî û civaka wî de jixwe Said vê yekê jî wek mijareke exlaqî dibîne û dibêje divê entelektûel ti carî hest pê neke ku li mala xwe be; ji dûrê mala xwe wek bîyanîyek û bê aleke aciz, dilnerihet be.

Julio Cortazar (1996) di nivîseka xwe ya di *Edebîyat Sürgünleri ve Sürgün Edebiyatı* de hatiye weşandî de dibêje “Nivîskarên dîktatorên Amerîkaya Latînê nînin katibên wan hene Divê em nebîne katibên xeyîdok, melankolîk. Nefîyên rasteqîn rejîmên parzemîna me de ne”.(Cortazar, 1996:24) Ji qada civakî,

ji rasteqînîya netewî, ji aşitîyê hatine nefikirin. Parastineka rewşenbîrî ya bi vê hawî divê bi hêza îmgelemê be. Bi me kesên ku van taybetîyan di xwe de dihevine îmkân tune ye ku li warê xwe niştêcî be. Ji berê ve kesên otorîte û rejîmên siyasî yên totalîter rexne kirine muheqqeq ji alê otorîteyê ve bi mişextî û qewirandinê hatine xelat kirin. Em vê cezayê mişextîyê ku ji mirinê xirabtir hatîye ditîn ji bo entelektûlekê wek xelat didin nasîn lewra piştî nefikirina kesên marjînal û dijraber proseyekê rewşenbîrîyê û afirînerîyê dest pê dike û ev yek jî rê li ber melhezekirina civakê jî vedike.

Bi me ev mijar bi qasê serêşîyê dide me ew qasî jî mijarekê girîng û taybet e lewre bersiva pîrsa me dê bin vê serenavê de derkeve pêşîya me. Çima edebîyata Kurdî di an ku bin deshilatdarîya mişextîyê de xwe didomîne û mijarên edebîyata kurdî ger a nivîskî ger a devkî piranîn dorhêla mişextîyê, nefitîyê dizivire? Bersiva pîrsa me çi qasî qada sosyolojîyê û dîrokê de be ew qasî jî di qada psîkanalîzê de ye.

Diroknas Braudel dibêje ku ziman nasname ye. “Kesên ku zimanê xwe naxavin an jî li erdê ku zimanê wî lê nayê axaftin dijîn berî her tiştê dikeve nav qeyranekî nasnameyî”.(Doğan, 1996:33) Li Romyê kesên bi tewanbarîya kuştinê dihatine darizandin şuna cezayê îdamê pirî caran cezayê wan ber mişextîyê dihat veguheztin. An jî ger em dûr nefikirin li erdnîgarîya me jî heman rewş li demên berê de hebû. Piştî serhildanên Kurdan rêvebir û serokên kurdan ji aliyê dewleta Osmanîyan dihatine nefikirin. Bo mînak piştî Serhildana Agirîyê Biroyê Hesikê Têlî, Nuri Paşa, Ferzende Beg; Piştî Serhildana Mîrên Cizîre gelek serok û kesayetên taybet wek malbata Bedirxanîyan ji alê dewletê ve hatine nefikirin. Sedema van mişextîyan bi me di vir de veşartîye. Arîsto dibêje ku mirov heyîneke civakî ye û ji bo ku heyîna xwe berdeham bike divê nava civakê de be kesên ku bê civak bikarin bijîn an cinewar e an jî Xweda ye. Ferd heyîn û xwebûna xwe bi qasê endambûna komeleyên xwe, civakên xwe, cemaetên xwe dikarin biparêzin. Merivek çiqasî nava komên xwe de be ew qasê heyîn û xwebûna xwe xurtir diken. Lewra her teyr bi refê xwe ra difire. Her mirov jî bi civaka xwe ve heye. Lewra civak tê vê wateyê ku şîyan, tevger, çand, ziman û fikr û ramanên hevpar. Yanî nefikirina van kesan, van ferdan ji civak û komên wan di heman demê de mebesta wendakirina ferdbûna van kesan e jî. Çawa ku li Roma ya berê, cezayê

mişextîyê “eksterminatio” yanî di wateya avêtina derveyê sînor dihate bi kar anîn lê wateya vê peyvê di salên P.M. sedsala sêyemîn de hêdî hêdî hate guhertin û wateya ji alê fizîkî ve xilaskirina heyînê wergirtiye. (Neuaman 1996: 96) Mirovek ji civaka xwe ber bi civakek, erdek bîyanî ve bête nefîkirin bi tenê dimîne û heyîna xwe berze dike. Bi tenê dimîne mecburê jîyaneka tekekesî dimîne. Êdî şîyan, tevger, çand û zimanê wî jî wekî wî takekes û yekjimar e û kesên di vê rewşê de binê nevê dê bikevine qeyraneke nasnameyî rewşeke melankolîk. Ji ber vê jî cezayê mişextîyê bi gel cezayê îdamê wekhev dihate dîtin. Ev jî tê vê wateyê, tune kirina kok û nasnameyê ji berê ve polîtîkayekê girîng e ji bo serdestan. Ziman wenda bibe nasname wenda dibe. Rêya tune kirina zimên jî ji mişextîyê derbaz dibe. Kesên terawgehê ji kokê xwe, ji zimanê xwe, ji nîrxên xwe yên netewî dûr in yanî dikevine nav qeyranekî nasnameyî û ev yek jî rê li ber bişaftinê vedike.

Me li jorê anî zimên ku kesên nefî li terawgehên xwe ji nîrxên xwe dur in- mebesta durxistin û nefîkirina van kesan qutkirina têkilîyên navbera civaka wan û zimanê wan e- lê dîsa jî çawa çêdibe ku têgehekî wek edebîyata mişextîyê dertînin holê û îro ev têgeh di lîteratûra me de cih digire? Kesên ji cih û warên xwe dûr hatine xistin an ku bi dilê xwe ji cih û warê xwe ji kokên xwe ji welatên xwe dûr ketine çawa çêdibe edebîyatekê diafirînin û em jî ji vê edebîyatê re xalekî taybet vediken? Îro em li edebîyata kurdî binêrin em ê bibînin ku di edebîyata me kurdan de ekoleka bi navê dîyasporayê heye. Navenda hilberandina edebîyata Kurdî Swîsre, Frense, Elmanya, Swêd e. Di beşên me li paşîya xwe hiştî de em li ser sedemên mişextîyê sekinîn niha jî wek mijar em di nava mişextîyê de û di nava mekarnîmaya wê de ne. Gelo mişextî ji nefîyeke çî distîne û çî didê? Û em ê di çarçoveya nivîskaran û edebîyatê de reftarên wan binirxînin.

Mişextî rewşek e dibêje Ferîdun Andaç diyarkerê pozîsyonê di heman demê de şewqdana diyarkirîyê ye. Mişextî ji me ra serpêhatîya mirovahîyê ya trajîk jî vedibêje. Ji bo edebîyatê jêderekî dewlemend û ji bo nivîskaran jî kereseyên gelek baş in. Mişextî janên tîn kêşan, tunehîyan, melhezeyên cûda, serpêhatîyên muezzem pêşkeşî nivîskaran dike. Ev yek hemû bi edebîyatê tîne ber me û edebîyat jî bi zimên tê çêkirin ji ber vê jî divê em gotina Joseph Brodsky bînin ziman: mişextî berê her tiştî tîgihekê zimanî ye lewra hişmendîya zimanê zikmakî geş dike ku şert û mercên xwe spartina wê an jî jê veqetîna wê çêdike. Di

vir de li ser ziman û nefîtiyê gotinên Juan Goystilo (2006) yên di pirtûka xwe ya bi navê *Yeryüzünde Bir Sürgün* de ku mişextîyê wek azmûnekê dibîne dê mijarê piştrasttir bike:

“Azmûna mişextîyê nivîskarî bi gel rastîya wî rû bi rû dihêle. Tu kes nîne çî ye ku bê birîn ji wê azmûnê derketîye methê bike. Nivîskar bi tenê ne, ji bo wan mişextî demekê mirî ye; hinek ji wan, dikevine li ser kurm û kirasê welatê pejirandî. Yên wekî min jî hest pê dikin ku hem ji welatê xwe ra hem jî ji welatê mazûvan ra hêdî hêdî bîyanî dibin. Gelekê ji wan dev ji zimanê xwe yê zikmakî berdidin. Li qiraxên Rubara Seinê bi Frensî dinivîsin, di rewşa min ya niha de ev gengaz nayê. Bi min nivîskar bi xwe zimanê nahilbijêre; ya rastî zimên nivîskareke ku di mişextîyê de hildibijêre û zimên cihê welateke rasteqîn digîre ji bo nivîskareke nefî.”(r, 81)

Di vir de li gorî Goystîlo nivîskareke nefî di tarewgeha xwe de nikare zimanê xwe hilbijêre, encax ziman dikare wî lê hilbijêre û ziman jê ra dibe welatekê reasteqîn. Divê em li ser vê gotinê hinek neştergerîyê biken da ku fikra bingeîn baş bête serwextkirin. Li beşên berê de wekî me anîye zimên piştî bêcîwarbûnê proseyekê bi navê ji nû ve bicîwarbûnê bi rêya medyatîzasyonê, têkilîyên civakî, çandî û hûnerî dest pê dike. Bi kurtasî me di proseya ji nû ve bicîwarbûnê de bandora medyatîzasyonê anîbû zimên. Lê di vir de em ê em ê kereseyêke din binirxînin ‘ziman’.

Madem mijara me edebîyata mişextîyê ye em ê jî behsa mişextîya nivîskaran biken. Behsa nivîskareke, rewşembîreke li mişextîyê û zimanên wan. Ji bo kesên ku karê xwe yê nivîsandinê baştirîn karê cîhanê dibîne û beyî nivîsandinê nikare bike; mişextî çî ye? Nivîskareke li welateke bîyanî, ji kokê xwe qetîyayî, ji çand û welatê xwe dûr, bê cî û bê war divê çî bike xwe ji nû ve bi cî û bi war bike da ku xwe bide fêhm kirin. “Gotineka Julio Kortazar; Peywîra yekem ya nivîskarekî mişext, divê li odeya oteleke welatê xerîb xwe di eynika tenêtiyê da şifûtazî bibîne; bîyî ku licihekê asê bimîne, divê xwe wekî xwe bibîne.” (Tilêrmanî, 2021). Rêya vê yekê bi me ji zimanê zikmakî yê nivîskarî diçe. Nivîskarek zimanê li welatê ku lê penaber e dibe ku baş bizane û di be ku wê zimanî jî baş bi kar bîne û ev yek jî mişextiya nivîskarî piçek jî be sivik dike lê zimanê nivîskarî yê zikmakî di bin mişextîyê de dimîne. Nivîskar heta ku bi zimanê xwe yê zikmakî nenivîse nikare zimanê xwe ji mişextîyê xilas bike. Rêya rizgarkirina zimên ji mişextîyê bi berhemên nivîskî gengaz e. Belê em dibêjin bi berhemên nivîskî lewra tiştê ku zimên pêş dixê, wê zindî û çalak digire qada nivîskî ye. Peyv û bandorên bîyanî yên ku bi hêsanî dikarin bikevine nav zimanê

devkî ji xwe ra di qada nivîsê de nikare cih bibîne ev peyv û bandorên bîyanî xwe di zimanê nivîskî de bi awayekê kirêt dîyar dibin û ji ber vê nelihevhitinê tîn avêtin bi vê hawî jî zimên bi nivîsê tîkuz dibe cihê xwe digire. Yanî bi tenê axaftina zimanekê têrî nake divê bi wê zimanî bihête nivîsandin jî.

Jiyîna ji dûrê welêt diwartirîn tiştek hebe ew jî jîyana mişextîyê ye. Li ser da meriv di temenekê mezin de be û bi darê zorê ji welatê xwe bête qewirandin dibe agirê li ber barûdê. “Meriv wexta mecbur bîmîne bi gel kesên ku tu hevparîyeke wan ê dîrokî, çandî, hûnerî û zimanî nîne bijî xwe wek bê kok û bê ziman hîs dike.” (Baydar, 1996: 41). Lewra wexta meriv nefî be an ku ji ber zext û zordarî û tundîyên otorîte û rejîma sîyasî neçar bimîne bireve hiş wan zext û zordarîyan bi gel xwe tîne û meriv dizane cihê ku jê revîye hêj li wir meriv li rastê zext û zordarîyan tîn û gelek paşmayî hene ku hêj li ber talûkeya heps û zindanan rû bi rû ne. Ev yek jî di dilê nefîyekê da brînên bê çare vedike. Meriv ji ber ku ji vê rewşa gîyanî û psîkolojîk derkeve çî qas ji dest were tîdikoşe û dixwaze vê rewşa psîkolojîk derbaz ke. Romanûsê Tirk Oya Baydarê (1996) vê rewşê tîne ziman:

“wek nivîskarekê rewşa min piçek cîyawaz bû lewra min bi romanên ciwantîyê dest pê denivîskariyê kiribû lê wekî kesên jenerasyona xwe min jî piştî salên 1960an fikr û meyla xwe da li ser sosyalîzmê. Di maweyna mişextîya xwe da wexta min li berhemên xwe yên berî mişextîya xwe dinihêrîya min digot qey evana min nenivîsandine. Lê piştî mişextîyê ez ji welatê min, ji fikr û ramanên min ên sîyasî, ji tekoşîna min veeqetand min dest pê nivîsandina edebî kir. Êdî min nenivîsanda dê ez dîn bûma yanî ez wek nivîskarekê derneketim mişextîyê, di mişextîyê da ez veguherîme nivîskarekê” (r. 42)

Li gorî van gotinên Oya Baydarê em jê derînin ku mişextî jîyana mirovan ya berê jê distîne lê meyla ziman û nivîsandinê dide merivan. Yanî mişextî ji bo wê nebûye proseyekê astengdar bereks jê ra bûye proseyekê encambexş û hilberdar. Di vir de em pirsê xwe ya bingeşîn bipirsîn dê cih de be. Gelo çima dinivîsin. Merivek ku li welatekê nenas di nav qerebalixîya çand û zimanekê bîyanî de di nava hew qas tiştan de çima karê nivîsandinê ji xwe ra hildibijêre û bi zimanê xwe dinivîse? “Ziman, dayîk, zimanê dayîkê, welat “Wexta em li ser psîkanalîz û zimên bifikirin û têgiha jênavderketinê “ziman” be mişextî wek veqetîna ji zimanê dayîkê, û dûrbûna ji dayîkê tê teyehhûlkirin.” (Küey, 2011:44). Yanî ji kok veqetîn, bê kokîbûn. Ev têgehana di heman demê de wendabûnê jî bigel xwe tînin. Wendabûnekê ji eslê xwe û ji ziman û çanda xwe. Neyêkêşîya

mişextîyê jî ji ber van tê. Mirovek dê çawa li dijberê vê bê kokîbûnê derkeve û van êşên ku dide merivan ji holê û di xwe de rake?

“Nivîskar bi qasê bi zimanê xwe yê zikmakî binivîse ew qasê jî kok vedide û mişextîya xwe vediguherîne ji nû ve bicîwarbûnê. Ev kok vedana wê li erdê ku lê hatîye dinyayê nîne. Wek nivîskar di nava zimanê xwe yê xwemalî de di nêv cihê ku ji xwe ra çêkirî kok vedide”.(Gürsel 1996:30)

Ji van gotinan em dikarin bibêjin ku ziman kokê merivan e, dar bi qasê li ser kokê xwe şîn bibe meriv jî ew qasê li ser zimanê xwe şîn dibe û dijî. Ziman war û welatê nivîskar e. Ev hişmendî pozîsyona nivîskarê nefî çêdike û teşeyê didê. Zimanê nivîskarî di navbera rabirdû û welatê wî de fonksîyona pirrekî dibîne. Di dorhêla zimanê di mişextîyê de ji xwe ra çêkirî hem serpêhatî hem jî rabirdûyê xwe tîne ziman. Ziman têkilîyekê hestîyarî û psîkolojîk di navbera mirovan û cihê ku lê dijîn de çêdike û mirovan bi wan cihan ve girê dide. Yanî mirovek li welateke bîyanî be, di nava çand û zîmaneke bîyanî û xwe aidê wê dêrê hîs neke van tiştan bi nivîsandina zimanê xwe yê zikmakî dikare têk bibe û bi rêya zimanê xwe yê zikmakî li wê erdê bîyanî di zimanê xwe da kok vedide û xwe bicîwar bike.

2.WEK CUREYEKÎ EDEBÎ: ROMAN

Roman wek çejneki di cîhana edebîyatê de hêj cûrekeyî nû tê hesibandin. Di vê beşa xebata xwe de em ê hewl bidin wek cureyekî edebî romanê binirxînin û di edebîyata kurdî de cihê romanê û taybetîyên romanê bînin ziman.

Têgehek çawa dihête danasandin an jî divê çawa bihête danasandin. Di danasandin û rave kirina têgehan de zanistên tevlihev û nesenifandina wan agahî û zanistan, rê li ber komplekskirina xebatê vedike. Hela ku ev têgeha me cureyekê edebî û qadeke gelek berfireh be divê em zêde nekevî nav û bi tenê agahîyên dor hêla pêdivîyên xwe de bînin ziman. Wexta gotin li ser edebîyatê be mijara “danasînê” dibite problemekî esas; lewra danasîn sîordarkirin e û tiştên derveyê vê sînorê de mayî re jî navên nû pêdivî dike û ev jî me dixê nava çembereka bêdawî. Bi gotineke din em armanc naken hemû rabirdû, rêwîti û geşedana edebîyat û romanê ya dirokî bînin ziman jixwe wexta em li dor edebîyatê li destpêk û prosesa geşedana cureya romanê binêrin em ê bibînin ku ew parametreyên me anî zimên tişteke xeyalî ye. Em ê di vê beşa xebata xwe de bin vê sernavê de li dor pêdivîyên xebata xwe, çi qas ji destê me bê têgeha romanê bidene nasandin.

Hegel dibêje ku “pêdivî jêdera hilberandinê ye”; ji destpêka şaristanîyan heya niha hemû hilberandin û kereseyên tîn bikaranîn li dor pêdivîyên mirovan de hatine çekirin û pêşxistin. Wexta em li deqa derketina tiştê binêrin em ê miheqeq bibînin ku destpêka her tiştê de ku em îro vê yekem teşeya wê tiştê wek proto-tîp, arke-tîp bilêv diken derkevîne pêşîya me. Edebîyat jî yek ji van e ku ji destpêka xwe heya roja me guherînên mezin derbas kirîye û gelek tişt xistine nava xwe û îro di halê xwe yê niha de li ber me ye û divê em ji vê yekê qanîb bin ku dê pêşerojê de de gelek cure û celebên nû ve heyîna xwe berdewam bike.

Edebîyat çi ye? Li gorî Adem Çalışkan (2015) “Deqa destpêka estetîkê edebîyat, hem şaxeka hûnerî hem jî zanistî ye.”(Çalışkan, 2015: 3). Ev pirs hewceyê bersiva pirsê “çi cure tekst dibîne berhemên edebî” nake. Ev pirs jî hêla zanyarên edebîyatê û kesên hakimê kanona edebî ve tîne pirsê. “Wexta em cure û celebên rexneyê vedikolîn em dibînin ku her yek rêbaz li gorî xwe, di

bergeha xwe de nêzê berhemên edebî dibe wan vedikole.” (Moran, 2017: 299). Bo mînak teorîya şewqdanê di nava xwe da vediqete çend şaxan, ev çend şax di nava xw e de li gorî otorîte û avakerên van teorîyan dabeş dibin. Di nava vê teorîya şewqdanê xeta Marksîmê, xeta realîzma civakî, rexnegirîya dîrokî, ya civakî, ya marksîts hwd hene û her yek ji van edebîyatê li gorî xwe dinirxînin û çawanî û fonskîyona edebîyatê li gorî xetên xwe tînin ziman. Ev yek jî dîtina bersiveke resen û runîştî negengaz dike. Lewra hejmara rêbazên rexnegirîya edebîyatê gelek in ji ber vê jî li gorî her rêbazê esasên edebîyat û hûnerê cihê ne.

Di vir de em dixwazin wek cureyeka edebî, romanê bînin ziman lê divê berî vê em bi awayeke kurt û kurmacî behsa fonksîyona romanê ya dîrokî û civakî biken. Bi vê hawî jî em ê bikaribin fonksîyon û bandorên romanê ên li ser civak, netewe, çand, ziman û hûnerê derbirin. Li gorî George Lukacs: Romana ku li gor hinekan “bi têkçûna epîkê ra bû weledê dewra modern bi şeweyeke bê noqsan aliyên nûjen û şexsî tîne ziman” (nql. Alan, 2013:53). “Roman wek cureyeka edebî, di encama çavênîya nivîskar ya realîteya jîyana derve, metnên fiksîyonel in”.(Anık, 2020:920). Yanî li ser romanê, an ku li ser van hilberandinên edebî, bê guman bandoreka mezin ya realîteya jîyana derve û zîhnîyeta derve heye. Em romanê dikarin wek cîhaneke nû bidene nasîn. Cîhaneke navxweyî, ji cîhana derve xweser e lê bi temamî ji hev cihê nînin. Yanî peywendîyeke xurt di navbera naveroka romanê û jîyana derve heye. Ji ber vê ye ku wexta em romanekê dixwînin dikarin xwe di nav wê romanê de bibînin, an ku şopên jîyana karakterekê bişibînine jîyana xwe an ku ya yeke din. Wexta romaneke dîrokî bixwînin an ku romaneke ku demeke berê hatîye nivîsîn, dixwînin dikarin wê demê û wê dîrokê hîs bikin. Di vê deqê de jî berhemên di qada edebî de hatine nivîsandin, ji bo têgehiştin û vekolandina demên berê ve derfetên girîng dide xwîneran. Di vê peywendê de hin roman wek belgeyên dîrokî jî dikare bihêne hesibandin. Û xwînerêkê vê çarçoveyê de li ser romanekê rexne û analîzên civakî, dîrokî, zimanî û çandî dikare bike. Wexta romanekê ji klasîkên rûs dixwînin em dibine şahidê bûyerên wan çaxan û skruktura civakî ya wê qonaxê em dikarin bîne ber çavê xwe. Em di vê deqê da dikarin mînakekê li ser kitêba Erebe Şemo ya bi navê Şivanê Kurmanca biden. Erebe Şemo naveroka vê kitêba xwe her çiqas jî li dor hêla taybetîyên otobîyografîk hunandibe, di kitêba xwe ya dawîya ss. 19an û destpêka ss.20an nivîsî de gelek agahî û zanînen girîng ji me ra vedibêje. Lewra

dema em berhema Erebo Şemo dixwînin em avahîya civakî, têkîlîyên navbera mirovan, rewşa sosyo-aborî, û polîtîk ya wan qonaxan derdibirîn. Haşîm Ahmedzade di kîtêba xwe ya bi navê *Romana Kurdî û Nasname* (2011) de vê yekê weha tîne ziman.

“Nivîskar zaroktîya xwe, malbata xwe, gundê xwe, û rewşa êlên kurdan û damezirandina pergala Sovyet û encamên wê di nav êlên kurdan de ji nêz ve tarîf dike. Beşdarbûna wî ya Şerê Cîhanê yê Yekem wek wergerekî di artêşa rûsî de, wek bolşevîkekî beşdarbûna wî, karê wî yê wek endamekî payebilind ê partiya Bolşevîk di nav êlên kurdan de ji bo kevneşopî û binyadên feodalî qir bike bi detay tê vegotin. Rewşa jinan û jîyana wan a dijwar bi berfirehî tê îzahkirin. Dema qala evîna xwe ya têkçûyî li hemberî keça meta xwe, karê dike em fam dikin ku jin objeyeke firotinê zêdetir ne tiştek in”.(Ahmadzadeh, 2011:19-20)

Rêwîtiya romanê ya dîrokî li ber hin cureyên edebîyatê wek zaroka do dimîne. Di edebîyatê berê romanê; destan, çîrok, mesnewî, şîir cureyên herî zêdebûn ku dihatine tercîh kirin. Lê ev celebên edebî ji ber ku gelekê wan li dor wek temayên eşq, efsun, qehremanî, cadûgerîyê dihatine honandin ji realîteyên jîyanê dûr bûn. Di navbera epîk û romanê de şibandînen gelek mezin hatine dîtîn. “Roman, epîkên civaka burjûvazîyê ye ya ku em tê dijîn”.(Fox, 2019:33). Roman, wekî pêdivîya çêjneke nû derkete pîyasê û ev pêdivî bersivand. “Berê romanê di serdemên ronesansê de nivîsên bi navê “nûve” yê hebûn û ev “nûve” wek prototîpa romanê tîne qebulkirin.” (Fox, 2019:34). Bi destpêka ronesansê romanê jî yekem nimûneyên xwe dane. Muslîh Sezer di xebateke xwe de vê yekê weha tîne ziman:

“Çîna burjûvazîyê ji xwe re hem civakeke nû ava kir hem jî bi wê re veguherînek xiste nava jîyana civakê . Piştî çîrokên qehremanîyê berhemên wekî *Don Kîşot*, terzeke nû anîne meydana. Vê berhemê bi zîmaneke îronîk hem berhemên berîya derketî rexne dikir hem jî tişên nû digotin”(Sezer, 2020:23)

Bigel van daneyên mamoste Muslîh em dikarin bibêjin ku roman afirînerîyeka civaka burjûvazîyê ye hêj em dikarin vê çejnê wek mezintirîn afirînerîya burjûvazîyê bi nav bikin. Lewra romanê bi bêqûsurî vegotina hemû tiştên mirovan ve tişta ku epîkan nekarî kirî derxiste holê.

Di vir de divê em hinekî li ser epîkan rawestin û cîyewazîya navbera roman û epîkan bînin ber çav û bi vê hawî jî em ê hin dahatûyên bi gel romanê ketîne jîyana modern derxînin. Di navbera karkaterên epîkan û civaka nav de dijîyan dengê berçav hebû. Temayên epîkan piranin li dor hêla qehremanî û

arîstokrasîyê de dihatine vehunandin û karakterên wan jî ehlê vê derûdorê bûn. Bo mînak Mesnewîya *Mem û Zîn* a Ehmedî Xanê. Ev mesnewîyeka eşqê ye ku li dor hêla qesr û arîstokrasîyê de hatiye sazîkirin. Wexta em vê berhemê bixwînin em ê bibînin ku karakterên vê berhemê, Mîr, Zîn, Tacdîn, Mem, Stî, ev hemû karakterên dewlemend û arîstokrat û zarên arîstokratan in. Hêj karakterê xirab Beko jî di qesra Mîrî de wezîfedarekî arîstokrat e. Bêyî kurteya Mesnewîya Xanî eger em gotinên xwe bêjin; em dikarin vê îfade biken ev hemû karakter temsîlîyeta takekesan nakin. Hêj em dikarin bibêjin ku ev karakterên mesnewîyê de derbaz dibin takekes nîn in her yek tîpek e ku temsîlîyeta nîrxekê diken. Tajdîn temsîlîyeta camêrî û qehremanîyê ye, Mem; dilsozî, Mîr; otorîte, Beko; xirabî... hwd. Yanê ew karakterên mesnewîyê de di rastîyê de karakter û tîpên mesnewîyê nebûn. Mesnewîya Xanî tabloyeka civaka arîstokrasîyê bû. Lê ev yek, bi gel hatina romanê xirabû, temsîlîyet û hêza arîstokrasîyê bi gel derketina cureya romanê hate bînpêkirin. Lewra roman wekî epîkan li ser karakter û tîpên arîstokrat nesekî. Romanê, karî lehengên xwe ji mirovên rêzê hîlbijêre, naveroka xwe ji mijarên rojane û sade pêk bîne. Yanî romanê insên keşf kir; bertekên insên, têkîlî, peywendî, derûnî, berjewendî û xwezaya insênî keşf kir; di hûnera vegotinê de qada temayan, mijaran, karakter û tîpan berfirehtir kir. Ji ber vê jî romanê xelasîya epîkan anî û di nava gel de rûnişt.

Romana Miguel Cervantesî ya sedsala 17an de nivîsîye ji alê gelek otorîteyan ve wekî yekem romana edebîyatê hatiye pejirandin. Neslîhan Albay, di xebateke xwe da li ser vê mijarê dibê ku: “Yek ji navdartirîn nivîskarên edebîyata rojava, Miguel de Cervantes Saavedra navdarîya xwe hêj, bi *Don Kîşotê* diparêze.”(Albay, 2020: 272). Belê *Don Kîşot* a Cervantesî wek romana yekem tê hesibandin û ji roja ew roman derketî heya niha biqasê neyêhejmar roman derketine. Pekî ji bilî taybetîya *Don Kîşotê* a yekemîn bûnê çi girîngîya vê romanê heye ku rexnegir, edîb, romanûs, zimannas hwd. li ser vê romanê radiswestin û di çarçoveyên fikr û ramanên xwe de wê dinirxînin û bi hezaran nivîs, makale, ceribandin, analîzan li serê dinivîsin. Jale Parla di pêşgotina vê romanê ya wergera bo tirkî de dibêje ku: “*Don Kîşot* a Cervantes ji sala 1605an de beşa wê yakemîn hatiye çapîkirin û ji wê rojê heya îroja me romana herî zêde hatiye xwendin e. Helal-bavê romanê Cervantes bi vê romana xwe, romanûsên pey xwe, wek kurê jinbavê hiştîye.”(Cervantes, 2019:12). Cervantes bi romana xwe wek bavê romanê

tê bilêvkerin êdî, lewra romana wî, yekem romana cîhanê hatîye hesibandin û tişteke bi taybetîya xwe ya yekembûnê rê li ber peyrevên xwe vedike. Di vir de em dikarin bibêjin ku *Don Kîşot* a Cervantesî bandorek li ser hemû romanên pey xwe de kirîye. Eger em serûvena romanê ji *Don Kîşot* ve heya niha ve wek avahîyekê bifikirin em dikarin romanên din wek perçeyên li ser bingeha *Don Kîşot* de bilind bûne biden. Lewra wekî ku xaniyek bê bingeş bilind nabe; çi romannûs jî nînin li ser bingeha Cervantesî avakîrî de romanên xwe çênekirî. Yanî roman wek cureyeke edebî çêjneke nû ye ku pêşketina vê cureyê bi gel pêşketina kapîtalîzmê, geşedana endîstûrîyê û avabûna netewe-dewletan ve girêdayîbûye.

Roman cureyeka vegotinê ya sedsalên modern e. Wek hemû cureyên vegotinê ên din, roman jî xwedî teknîk, hûnandin û mentiqên xwemalî ye her weha hin taybetîyên romanên jî hene ku wê ji van cureyên vegotinê ên din vediqetîne. Roman di nav vehûnandina xwe de xwedî taybetîyeke serxwe ye. Li gorî Mehmet Tekîn (2016:11) “Roman her çiqasê deyndarê cureyên edebîyatê yên wek helbest, çîrok, destan, tîyatro, felsefe, dîrokê be jî cureyeka wesa behremend e ku kariye tiştên ji van jêderan derketî bike malê xwe”. Yanî di nava romanekî de dibe ku tekstekî dînî, hûnerî, felsefî derbas bibe lê ev wê romanê nakete berhemeka felsefeyê an ku dînî. Roman bi vê taybetîya xwe ve hem qada mijarên xwe berfirej dike hem jî çendaniya xwînerên wê bi vê awayê zêde dibe.

Roman heman demê da cureya vegotinê ya herî bi bandor û bi hêz e. Roman bi atmosfera xwe ya xwemalî ve be, bi teknîkên xwe yên vegotinê ve be, bi girseya xwînerên xwe ya berfireh ve be, bi zimanê xwe ve be; hemû hêmanên serdema modern di nava xwe vedihewîne. Em di romanên da gelek caran rastê temayên lîrîzmî tînin, caran jî dîrokê zêdetirî dersan ji romanên werdigirin; têgehiştina têgehan de roman caran jî felsefeyê fonksîyoneltir e. Ji ber vê taybetîyê, roman di demên dawî de wek cureyekê vegotinê cureya herî zêde ye ku ji alê edîban ve tê tercîhkirin. Vê yekê Remezan Alan weha tîne ziman:

“Ev çendek e li hemû dinyayê roman, cureya herî popûler e, vegotina bê reqîb e. Wisa dixwîye”zemanê edebîyatê” stû li ber tehekkûma romanê xwar kirîye û qebûl kirîye ku ser rûyê vî zemanî jî “serdema romanê” bê nivîsandin. Ji ber ku hem nivîskar, hem weşanxane û hem jî sektorên pismam (wek sînema, televîzyon) li ser wê hesabên mezin çêdikin. Ew, di destê wan de bûye “proje”yek. Roman jî wek cureyeke dawetkar, çav dike nivîskar, jê ra gerdana xwe ya spî nîşan dide ku vê fersenda zemanê ji dest nêrevîne”. (Alan, 2013:13-14)

Ji ber van jî roman gelek caran tiştên di qadên wek çandî, felsefî, sîyasî de diqewimin de bo ragihandina van tiştan erka eynikekê dîbîne. Di van eynikan de dîmenên demên modern ên herî rewnaq em dikarin bibînin. Ev sedeman jî romanê li ber cureyên edebîyatê yê din de popûlertir dike û di parvekirina fikr û ramanan de bûyeran de, roman pitir dihête tercîh kirin.

Eger em li dorhêla modernîteyê de wek çêjneke nû, romanê binirxînin em ê bikaribin bêjin ku Don Kîşot wek lehengekî romanê bixwe karakterek nîne. Lewra ew di hûnandina romanê de hêmanekî sererastkirinê ye ku di çêkirina romanê de alîkarîya Cervantesî kirîye. Ji ber ku anektodên cihereng bi yek teşeyê de daye fonksiyona tayekî de. Ji ber vê jî di şexsê karakterên romanê de her tişt dikare bêhête vegotin. Her tişt dikare bibe mijareka romanê. Ji ber vê jî roman cureyekê edebî nîne. Roman, hewla lihevkarina bi gel demê ye.

2.1. Di Edebîyata Kurdî de Cihê Romanê:

“Wekî tê zanîn roman, cureyekî Rojavayî ye. Bi temasên çandî, pratîkên wergerî û di qada dewletê de bi daxwazên ewropîbûnê ra derbasî Rojhilat bûye.”(Alan, 2019:11). Ji ber van em dikarin bibêjin roman: ku serborîya wê bi *Don Kîşotî* dest pê kirîye, di edebîyata Rojhilatê de cureyekî derengmayî û derenghatî ye. Cureya romanê li gorî Rojava dereng ketîye nav lîteratura Rojhelat lê di Rojhelat de jî hin der û hin xelk hene ku li gorî mîletên Rojhelatî yê din hevnasîna xwe bi gel romanê gelek derengtir kirine. Belê yek ji wan mîletan jî milete Kurd in. Haşîm Ahmedzadeh di edebîyata kurdî de vê derengmayînê weha tîne ziman: “Yekem roman kurdî di sala 1935an de hatiye çapkirin. Li ber kevneşopîya vegotina romanê ya Rojavayî ya çar sed salî, romana kurdî di vê temenê xwe u bi rêjeyî kurt e”.(Ahmadzadeh, 2011:12). Belê di edebîyata kurdî de, di çarçoveya cureya romanê de derengmayîneke berçav heye û divê em di peywendekî epîstemolojîk û akademîk de sedemên vê derengmayînê binin ziman. Gelo çima kurd di romannûsîyê de dereng mane û bi çi armancan û li kû derê despê romannûsîyê kirine û wekî edebîyatên mîletên din, di edebîyata kurdî de jî fonksiyona romanê çi bûye?

Em dikarin bersivê van pirsên xwe di qadên sosyolojî, sîyasî, çandî de çêbiken û bînine ber we. Lewra wekî tê zanîn ku edebîyat şaxeka zanîstî û hûnerî ya multîdîsîplînî ye. Lewra gelek sedem û bersivên van pirsên me hene. Lê di vir de em dixwazin cih bidene beşek ji makaleyeka Mamoste Remezan Alanî ku bersivên van pirsên me di vê makaleya xwe de vehemandîye. Alan (2019) di makaleya xwe ya bi navê *Sedemên Derengmayîn û Neserketina Edebîyata Kurdî ya Dewra Pêşîn* de îfade dike ku:

“Em ji mijara bajaran dest pê bikin. Mîna ku tê zanîn, bajar bi îmkânên xwe yê mezin ra –matbaa, dibistan, rojname û kovar, cihê iqtîdarê, gûftûgoyên rewşenbîrî, hêlîna ehlê xwenda, îtibara edebî hwd.- mekanên minasib in bo edebîyatê. Yanî bajar ji bo karûbarên hibr, pirtûk, qelem û hibrê cihên guncav in. Çi wek formeka kevin medrese û çi mîna formeka nû dibistan, bêtir li bajaran organîze dibin an tesîrên wan ên civakî pêşî li bajaran rû didin. Eve lazim e jibo kurdan jî bajarekî ku kêmezêde van taybetîyan bihewîne bûbe cihê edebîyatê ango navendeka edebî. Lêbelê ji bo dewr û serdemên esrî, dema em bala xwe didenê tiştekê wisa, em dibînin ku ew bajar ne bajarekî erdnîgarîya kurdan e, bajarekî bîyanî ye. Di serê sedsala bîstan de, dema hin ûnsûrên dewleta osmanî –ermenî, ereb, arnawûd hwd- bi hebûna xwe ya milî hesîyan û di vê rêyê de bo çanda xwe komele ava kirin an bi zimanê xwe rojname û kovar derxistin. Kurd jî piştî demekê ketin nav heman qareyê”.(Alan, 2019:19-20)

Belê me yekemîn beşa xebata xwe da îfade kiribû ku berhemên edebîyata kurdî yên ewwilî di bajarekî bîyanî de derketine û hatine çapkirin. Di vir de jî tê dîtîn ku gotînên me ji alê mamoste Alanî ve hatine piştraskirin. Wekî tê îfade kirin cihekî ku meriv bixwaze hilberandinekî bike –çi edebî, çi teknîkî- divê ew cih, bajar, der ji bo wan hilberandinan hem ji aliyê teknîkî ve hem jî ji aliyê polîtîk û fikrî ve guncav be. Mixabin erdnîgarîya kurdan, di dewra osmanîyan de ji aliyê teknîkê ve, di dewra komeleya tirkîyê de jî ji aliyê polîtîk û fikrê ve guncav nebûye. Evan bêderfetîyan jî rê nedaye ku kurd li welatên xwe de pirtûk û berhemên xwe derinin û çap biken. Ji ber vê jî piranîna berhemên kurdî li derveyê Kurdistanê derketine.

Madem mijara me “Romana Kurdî” ye di vir de divê em ji çarçoveya xebata xwe de dernekevin û bi gel xetên roman û romana kurdî de agahîyên xwe biden. Di edebîyata kurdî de heta romana yekem, wekî berhemên vegotinî; destan, çîrok, efsane, mesnewîyan cih digirtin. Lê bi gel guherîna terza jîyanê edebîyat jî guherîye. Edebîyata ku li dor arîstokrasî û epîkan çerx dizivirîya xwe veguherande asteka nû. Ev asta nû jî roman bû. Yanî bi gel veguherîna takekese kurd, di edebîyata kurdan de jî veguherînek çêbû. Dema mirov li pêvajoya edebîyata kurdî ya van salên dawîyê dinîhêre, yekemîn deqa bala mirov dikişîne ew e ku

edebîyata kurdî bi geşedaneke mezin derbas dike û her ku diçe lîteratûra ededebîyata kurdî berfireh dibe û bandora xwe li ser xwînerên xwe dide hîs kirin. “Pêvajoya romanê di edebîyata kurdî de bi gel romana *Şivanê Kurmanca* ya Erebb Şamîlovî (1897-1978), di navbera salên 1930 û 1935an de nivîsîye dest pê kirîye.” (Yûsiv, 2011:11. Sezer, 2020:24). “Erebê Şemo nivîskarê kurd ê herî bi nav û deng ji Yekîtiya Sovyetan, wek bavê romana kurdî tê qebûlkirin. Romana wî ya edebîyata kurdî ya yekem di sala 1935an de li Erîwanê hatiye çapkirin.” (Ahmadzadeh, 2011:18). Wekî tê dîtîn ku yekemîn romana edebîyata kurdî li derveyê Kurdistanê hatiye çapkirin. Di vê peywendê da di edebîyata kurdî de, ev hevok me dê me bibete sedemên derengmayîn û kêmbûna romanên. Wexta em çarçoveyekî erdnîgarî de lê binîhêrin ku em ê pê derînin Erîvan ne bajarekî ji Kurdistanê ye lê yekemîn romana edebîyata kurdî li vê derê hatiye çapkirin û ji vir belavê axa xwe bûye. Yanî em dikarin vê romanê hem ji alê pêvajoya nivîsandinê ve hem jî di deqa çapkirin û belavkirinê de bêxne çarçoveya edebîyata mişextîyê. Roman, wekî berê jî me îfade kirîye berhemekî otobîyografîk e û di çarçoveya şovenîzma sosyalîzm û Sovyetan de serborîyên nivîskêr, skruktura civaka kurdan, Şoreşa Oktomberê, hîlbijartinên sovyetan vedibêje. Ev yek jî ji îspata nîyeta nivîskêr ya îdeolojîk e. Em romana Erebb Şemo her ku ji aliyê şovenîzma Sovyetan de rexne biken jî Şoreşa Oktomberê, bo kurdan û bo edebîyata kurdan gelek dahatûyan bi xwe ra tîne. Di encama şoreşê da li Sovyetan derbarê maf û azadiyên gelên kêminê de gavên mezin tê avêtin. Di wê serdemê de kurdên li Sovyetan bi zimanê xwe perwerdehiyê dibînin û ev yek jî rê li ber avakirina ekolekî edebîyatê bi xwe ra tîne. Piştî Şivanê Kurmanca Erebb Şemo romanên wek *Berbang* (1959), *Dimdim* (1965), *Hopo* (1969), dinivîse. Ekola Kafkasê bi tenê Erebb Şemo ve sînordar nemaye. Elîyê Evdîrehman yek ji romanûsên kurd e ku di vê qonaxê de berhemên wek *Morof* (1957), *Xatê Xanim* (1959), *Gundê Mêrxasan* (1968), *Şêr li Serê Çiya* (1989) nivîsîye. Di vê qonaxê de romanûsê me yê sêyem û girîng Hecîyê Cindî ye ku wî jî roman *Hewarî* (1967) nivîsîye. Wexta em li van her sê nivîskarên qonaxa kafkazê binîhêrin em ê bibînin ku ev her sê nivîskarên me yên heman serdemê di nava xebatên Sovyetan de bi awayeke çalak û pêşkeş cih girtine û berhemên xwe de li gel rexneya skruktura civaka kurdan ya feodal; pesnê sosyalîzm û sovyetan dane. Yanî van romanûsen me temayên berhemên xwe, li dorhêla karên xwe yên siyasî de hûnandine.

“*Pêşmerge*, yekemîn romana ku di zaraveya soranî de hatîye çapikirin e.” (Ahmadzadeh, 2011:21). Ev roman ji aliyê Rehîmê Qazî ve hatîye nivîsîn û di sala 1960an de li Erîwanê hatîye çapkirin. Dîsa di çarçoveyekî ernîgarî, dê ji me ra vebêje ku ev roman jî dibe ku di kategorîya edebîyata mişextîyê de bihête cihkirin. Lewra ev roman jî mîna romanên din -ên ku me behsa wan kîrîye- li derveyê welatê nivîskarî hatîye çapkirin û belavkirin. Haşîm Ahmedzadeh (2011) di xebateka xwe de li ser vê romanê dibêje ku: “Tekoşîna Kurdan ji bo mafên xwe yê netewî û li dijî tewgera netewî ya kurdan hevkarîya axayên feodal bi dewleta îranê ra, babetên romanê yê sereke yê din in”.

Li jorê me çend taybetî û girîngîyên romanên Edebîyata Kurdî yê ewilî dane, di vir de mebesta me ew bû ku em hem serborîya romana kurdî bîne ber çav hem jî bi nirxandinekî, xalên van berhemên û nivîskarên wan ên hevbeş aşkera biken. Wexta em li van romanên dinîhêrin rastîya van romanên ye yekem û bê şik ev e ku: Romanên me yê ewilî li derveyê kurdistanê derketine û di vê çarçoveyê da em dikarin wek berhemên mişextîyê kategorîze biken. Helîm Yusif (2011) di derheqê van roman û nivîskarê van romanên de dibêje ku: Erebe Şemo, ji ber ku Endamê Komîteya Navendî ya Partîya Komonîst ya Ermenîstanê bûye; Rehîmê Qazî, Endamê Komîta Navendî ya Partîya Demokratîk ya Kurdistanê- Îranê bûye naverokên berhemên heta radeyeke mezin di bin bandora karê wan yê sîyasî de maye. (Yûsiv, 2011:10). Yanî di vir de em diakrin bibêjin ku ev romanên bi gel naverokên xwe, temayên xwe û hûnandîna rêzebûyerên xwe ve wek propagandayekî îdeolojîk in. Nivîskaran li gel propagandayên nêrînên xwe yê îdeolojîk, rexneya civakî jî kirine. Di vê deqê de em dikarin van romanên bi Rexneya Marksîst ya Edebîyatê de binirxînin lewra li gorî vê teorîya rexneyê “nirxên sinifa serdest dikarin bondorê li ser metnên çandî û edebî biken”. (Özsari, 2016:5 4). Marks û Engelsî di heman demê de metnên çandî û edebî wek jêdera pêzanîna civakê dîtine. Ji vê doktrînê jî em dikarin wan berhemên xwe wek dokûmantekî civakî bibînin û atmosfera wê serdemê binirxînin.

Di edebîyata kurdî da, qonaxa kafkasyayê yanî ev dîrok taqabûlê navbera salên 1930 û 1990 de hewleke çalak û bi encamder çêbûye. Lê ji alîyeke din kurdên Bakurê Kurdistanê ji ber zîhnîyeta netewe-dewlet a Komara Tirkîyê nekarîne

berhemên bi zimanê xwe binivîsîn û çap biken. Lewra pergala netewe-dewletê, li ser înkarkirina zimanê kêmnîyan ve heyîna xwe saz dike û bi vê awayî jî mebest dike ku neteweyeka yek tîpî û civakeka homojen derîne holê. Piştî hilweşîna împaratoriya Osmanîyan welatê kurdan bi gel peymana Sykes-Pîcotê bûne çar perçe. Evê yekê jî rê li ber têkîliyên kurdan girt û bû sedema çênebûna edebîyateke netewî. Lewra berhemên kurdî di navbera çar dewletan, sê zareveyan û du alfabeyan de ma û evê yekê jî gelek sext û zorî anî li ber me bo tespîtkirina sînorên edebîyata kurdî. Jixwe îro wexta ku em sînorên edebîyata kurdî çî ji alê çawanî çî ji alê çendanî diyar diken em wan berhemên wek qonaxa kavkazê, qonaxa dîyasporayê, qonaxa başur hwd; yên bi tîpên erebî yên latînî, soranî, kurmancî, zazakî, kurmancî bi tîpên krîlî, kurmancî bi tîpên erebî hwd. weha kategorîyên bêkêr de disenifînin. Ev yek jî rê li ber xebatên li ser edebîyata kurdî alozî dike û xebateke bi rêk û pêk nadete ber me. Kurdên ku navbeyna çar netewe-dewletan de mayî bi rêya polîtîkayên înkâr û asîmîlasyonê ji perwerdehiya zimanê xwe yê zikmakî bêpar mane. Di encama van polîtîkayan de jî edebîyata kurdî ya nivîskî heya radeyekê cihê xwe da asê maye û pêşve neçûye.

Eger em edebîyata kurdî de qonaxeke bo romanê veke dê ev teqez qonaxa dîyasporayê be. Lewra li jorê wekî me behsê kirîye, di encama polîtîkayên van çar netewe-dewletan de gelekê kurdan rêya Ewropayê wek rêyeke xilasîyê dîtine û berê xwe dane dîyasporayê. Li wir jî di atmosfereke berfireh de bi teknîkên ewropayî romanên xwe hûnandine. Em dikarin van romanên li dîyasporayê hatine nivîsîn ji romanên kafkasê hatine nivîsîn ji aliyê naverok û teknîkan ve ji hev veqetînin. Lewra romanên qonaxa kafkasê piranîn li ser realîteyên civakî û şovenîzma partîyan de hatibûne nivîsandin lê romanên qonaxa dîyasporayê ev yek li gorî nifşên xwe yê berê mînimîlîze kir û pêtir karî li ser takekesan û derûnîya wan raweste. Ji ber vê jî em dikarin bi saya vê qonaxê romana kurdî ji nifşê xwe yê berê astekî di bilindtir bûye û zêdetir nêzikê skruktura romaneke bûye.

Haşîm Ahmedzade di destpêka kitêba xwe ya bi navê *Romana Kurdî û Nasname* de îfade dike ku “ Di romana kurdî de, ji destpêka xwe ya di salên 1930an û vir de him jî aliyê babet hem jî ji aliyê şeweyê ve gelek guherînên mezin çêbûne.” (Ahmadzadeh, 2011:11). Belê ev yek rast e ku di romana kurdî de guherîneke mezin çêbûye û em vê yekê jî bi teknoloji û derfetên sîyasî ve girê

diden. Piştî yekem Romana Kurdî ya modern *Şivanê Kurmanca* heya niha belkî bi hezaran roman derketine û di nava van romanên de gelek romanên serkeftî, xwedî xelatên navneteweyî jî hene. Yek ji van romanûsên Ferhad Pîrbal ye ku ji bo lîteratûra kurdî bi sedan berhem dane û gelek xebatên hêja derxistine holê.

2.2. Jiyana Ferhad Pîrbalî.

Di van deh salên dawî de bi gel guherîna atmosfera sîyasî û encamên tekoşînên Kurdan de di qada xebatên Kurdolojîyê de ji alîyê nivîskar, zana, vekoleran ve berhemên gelek girîng û serkeftî têne dayîn. Yek ji van kesan jî bi kesayetîya xwe ya rengorengî ve nivîskar, vekoler, stranbêj û ressam Dr. Ferhad Pîrbal ye. Berê navê wî rengdêrên wî yên çewaniyê belkû risteyekê zêdetir bigirta lê me ev yek bi zanebûnê kêr kir lê di binenavê vî beşê da wexta berhemên wî biden em ê bibînin ku Dr. Ferhad Pîrbal heqê rengdêrên navê xwe daye û dide. Lê wexta ku mijar Ferhad Pîrbal de mirov nizane dê ji kîjan alîyê wê despê bike. Lewra Ferhad Pîrbal, dinivîse, lêkolînan dike, distêre, wêneyan xêz dike, performansên hûnerî îcra dike, programên televîzyonê çêdike û pêşkeş dike, protestoyên ecêb û balkêş li dar dixê. Dr. Ferhad Pîrbal bi terz û ûslûba xwe ya sosret, bi helwestên xwe yê dij-serdest û dijmetînger bi heqîqetbêjîya xwe gelek caran rastê êrîşên asayîşê hatiye. Bi me jî ev helwesta Ferhad Pîrbal helwesteke netewî û rewşenbîrî ye.

Ferhad Pîrbal di sala 1961an de li Hewlêra Başûrê Kurdistanê ji dayîk bûye. Ferhad Pîrbal di sala 1979an de yekemîn berhema xwe ya nivîskî belav kir. Li zanîngeha Silêmanîyê Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî, di sala 1983an de qedand. Piştî komkujîya Helebçê Ferhad Pîrbal, di sala 1986an de ji Kurdistanê derdikeve diçe Ewropayê. Li Parîsê Zanîngeha Sarbonnê Beşa Edebîyata Kurdî (îrannasî) xwend û doktoraya xwe li ser *Mejûy Edebî Modern ya Kurdî* (Dîroka Edebîyata Modern ya Kurdî) temam kir. Di navbera salên 1986 û 1994an de li Denmarkê cîgirê sernûsê kovarên *Yekgirtin* û *Derwaza* kir û nivîsên wî di kovarên wek *Nûdem*, *Hîva*, *Xername*, *Havîbûn* de hatine çap kirin. Di sala 1994ê de vegerîya Kurdistanê. Li Hewlêrê *Kovara Wêran* derxist û ji 1997an heta 2011an di kovarên *Wercêran*, *Cîyewaz*, *Şîn*, *Şîir* de berpirsîyarî sernivîskarî kir. Li Hewlêrê dezgeha kulturî “Mala Şerefxanê Bedlîsî vekir û hêj rêveberîya vê

dezgehê dik. Ji 1994an heya niha ve li Zanîngehên Başûrê Kurdistanê dersên hûner û edebîyatê dide. Zanîngeha Selaheddîn, Zanîngeha Silemanî, Zanîngeha Xaneqîn, Zanîngeha Koyê û Zanîngeha Artûklûya Mêrdînê de wek hindekar dersên edebîyata kurdî dane. Di heman demê de gelek bernameyên wêje û hûnerî ji bo tekevîzyonên kurdî çêkirine. Li Hewlêr, Roma, Amsterdam û Parîsê nêzîkê 11 pêşengehên resmên xwe vekirine. Di sih û pênc salîya hûner û nivîskarîya xwe de Pîrbal; dramatûrg, nivîskar, şair, akademîsyen, ressam, aktor e ... “ Heta niha tevî pirtûkên wêjeyî, hunerî û lêkolînê 73 berhemên wî hatine çapkirin”. (Pîrbal, 2015)

2.2.1. Berhemên Wî³

A-) Şano.

1. *Malava Ey Weletekem (Xatirê Te Ey Welatê Min)*, 1984.
2. *Beyanî Baş Ey Xerîbî*, 1988.
3. *Heşîşekêşekan (Cixarekêş)*, 2003.
4. *Nûserekî Cê*, 2010.
5. *Ew Pîyawey Tenya Le Katî Xwend da Dinyay Pê Ciwan Bû*, 2010.
6. *Komalgey Medenî*, 2012.

B-) Şîr.

1. *Exîle*, 1994.
2. *Manîfestoya Duwem î Wêran Spîyem Nav Reş Reşên Nav Spî*, 1999.
3. *Cîyawaz*, 2001.
4. *Bo Rodanî Kurim*, 2006.
5. *Pênc Kitêb û Nîv*, 2006.
6. *Penahendey Jimara 3333*, 2007.
7. *Bîst û heft Perçe Êskan*, 2009.

³ *Reîs Remezan, Weşanên Avesta*, 2015

C-) Roman.

1. *Mulazim Tehsîn û Ştî Tirîş*, (Mûlazim Tehsîn û Tiştên Dî) 2001.
2. *Santiago de Compestella*, 2002.
3. *Pîyawekî Şepqa Reşî Palto Reşî Pêlaw Şîn*, 2003.
4. *Mindalbaz*, 2003.
5. *Reîs Remezan*, 2006.
6. *Hikayetekanî Bawkim*, 2007.
7. *Hotêl Europe*, 2010.
8. *Heft Wêney Rutî Jinî Cenabî Wezîr*, 2010.
9. *Petaxurekan*, 2000.
10. *Qebrekî Sêgoşe*, 2017.
11. *Kitaba JiyanaMin Guherandî*, 2017
12. *Min Çi Dît*,

D-) Lêkolîn.

1. *Serçawekanî Kurdnasy*, 1998.
2. *Wêneyên Kurd ji Arşîva Kurdnasên Ewropî*, 1999.
3. *Zêrê Nav Zibil*, 1999.
4. *Încîl di Dîroka EdebîyataKurdî da*, 1999.
5. *Destpêkên Serhildana Pexşana Kurdî*, 1999.
6. *Mejûyî Şano Le Edebîyatî Kurdî da*, 2001.
7. *Bîbliyografîya General Şerîf Paşa*, 20017.
8. *Ebdurehîm Rehmî Hekarî, Bîbliyografi*, 2002.
9. *Kronolojîya Kurdistanê*, 2002.
10. *Rêbazê Edebîyatan*, 2004.

11. *Rojnamevanîya Kurdî Bi Frensî*, 1998.

12. *Mela Mehmûdê Bayezîdî*, 2000

2.3. Di Romanên Ferhad Pîrbal De Şopên Bêcîwarîyê.

Hûner çî ye an ku çawa an ku em vê pîrsa xwe eger sînordar biken em ê karin bibêjin edebîyat çî ye? Li gorî me edebîyat lêgerîna hezê ye û hez jî li gorî takekesan xwebûnekî guherbar e. Hez bedewî ye û bedewî jî goralî ye. Ji ber vê goralîyê jî gelek kes li gorî xwe nêzî berhemên edebî û hûnerî dibin û berheman li gorî nêrîn û hişmedîyên xwe dinirxînin û wan berhaman li gorî nêrînên xwe disenîfinin. Wê berhemê an wek hilberîbeke edebî dibînin an jî wê berhemê li binê erdê dixin û wek berhemeke edebî nabînin.

Em ê di vê beşê de li dor teorîya rasteqînîya civakî û derûnîya nivîskarî li ser romanên Ferhad Pîrbal hûr bin û li dor van nêzîkbûnên teorîyên edebî ve em ê romanên Pîrbal ji bo peyda kirina şopên bêcîwarbûnê binirxînin.

2.4. Hotel Europa.

Hotel Europa romenekî bi zaraveya soranî ya kurdî ye ku ji alê Ferhad Pîrbal ve hatîye nivîsandin û di sala 2010an de çapa pirtûkê ya yekemîn li Hewlêrê ji Dezgehê Arazê hatîye belavkirin⁴. Çapa duyemîn jî di sala 2018an de ji Malê Wefayî çapa duyemîn derketîye. Orjînalê kitêbê jî 208 rûpelan pêk hatîye. Roman di sala 2012an de ji aliyê Besam Mistefayî ve bo kurmancî hatîye wergêrandin û ji Weşanên Avestayê li Stenbolê hatîye belavkirin. Roman rûdawên di jîyana nivîskarî ya li Frenseyê tîne ziman. Di romanê da karîgerîyên çandî, penahendîyî û cîyawazîyên Rojavayî û Rojhilatî temayên sereke ne. Lokman Polat li ser vê romanê ceribandineke piçûk nivîsandîye û weha dibêje “Roman ji gelek sernavên navber pêk hatine. Her beşeke biçûk bi sernavekî serbeşekî dest pê dike. Ev serbeşene jî wek aforîzmayekî ne”.(Polat, 2019, s. 54).

⁴ Me ev agahîne ji çend rûpelên internetê girtin.

Serlehengê romanê û navê nivîskarî ji ber ku wek hev in û serpêhatîyên nivîskarî tê de hene ev roman romanekî “otofîksîyon” e.

Em dikarin kurteya romanê weha vebêjin. Serleheng û vebêjerê romanê Ferhad, Kurdekî wênekêş î ji Başûrê Kurdistanê yê ji ber zilma Seddem neçar maye û bi daxwaza penaberîyê berê xwe daye Ewropayê. Li Ewropayê daxwaza wî ya penabertîyê ji alê dewleta Frenseyê hatîye qebulkirin û li wir nişteci dibe. Ferhad heftê çend rojan li otela Monsieur Lucianayî ku cihuyekî bi eslê xwe portekîzî ye saet navberê heftê êvarê û heştê şefeqê wek resepsîyonîst dixebite û ji bilî vê karî jî portreyan xêz dike û wênekêşîyê dike. Mihemedê Hecîzade, meleyekî Tehranî ku ji alê rejîma melleyan ve hatîye xelîlîbaskirin û penaxwazekî bê îş û bê kar e. Eger peyda bike bi kaçaxî dixebite, bê nasname ye û nikare bi cihekê ve here.

Monsiuer Luciana î xwedîyê otel europayê, li Parîs, Oxford û Tel Avîvê xwedîyê milkên mezin û meraqdarekî çanda rojhilat e. Doktoraya xwe li ser şairekî îranî kirîye. Xewna wî ya mezin serdana Îsfahanê ye. Saqî Gulçîn, xwîşka mirovên Mihemedê Hecîzade ye û li San Fransîscoyê xwedîya galerîyeke navdar û femînîsteke ehlî keyf e.

Ferhad bi rêya Mihemedê Hecîzadê Saqî Gulçînê nas dike û portreyên xwe ji Saqî Gulçînê ra dişîne da ku li galerîya xwe ya li San Fransîscoyê biforoşe. Mihemedê Hecîzade û Monsiuer Luciana bi rêya Ferhad hev nas dikin. Monsieur Lucianayê ku cihu î eslê xwe portekîzî û Mihemedê Hecîzadeyê Tehranî gelekê dişîbin hev.

Mihemedê Hecîzade ji bo debara xwe ya aborî bike dikeve gelek karên wek homoseksûelî, falvekirin. Monsiuer Luciana jî xudan gelek mal û saman e lê birîneke Munsuier Luciana heye ku ew jî evîna wî Zîba ye. Zîba keçeka îranî ji malbateke dewlemend û sûnnî ye. Wexta doktoraya xwe li Parîsê dike hev nas dikin û Luciana aşîqê vê keçê dibe lê malbata keçîkê ji ber ku Luciana cihu ye rê nadin ew bizewicin. Keçîk piştî doktoraya xwe vedigere Îranê û Luciana jî her aşîqê keçîkê dimîne. Ji bo keçîkê bibîne ji hevşibîya Mihemedê Hecîzade sudwerdigire û dikeve cihê Mihemedê Hecîzade diçe Îranê û Mihemedê Hecîzade jî dikeve cihê Monciuer Lucianayî li ser mal û samanên wî rûdine.

Hotel Europa rawestgeha van karakteran e ku wan li hev dicivîne. Cihêyî, rastî û çewtî, nişteçî û biyanî, do û îro, rojhelat û rojava di vê laboratûvarê de raserî hev in. Û roman xwe dispêre bûyerên rasteqînî û li gorî daxuyanîya nivîskarî ku dawîya romanê ev yek anîye ziman karakterên vê romanê hêj hinekî wan dijîn.

Di romanê gelek hêmanên koçberî, penaberî, penaxwazî, û bêcîwarîyê hene. Ferhad Pîrbal di vê romana xwe da trajedî, xweşî, dram û çîroka cihê penaberan di dorhêla romana xwe de bi hawîyek aşkera anîye ziman.

2.4.1. Di Romanê de Şopên Bêcîwarîyê.

“Eger wezîr be, eger mele be, eger wênekêş be. Penaber her penaber e.”(Pîrbal, 2012:9). Romana me bi vê hevokê despê dike. Ev hevoka ku bê nasnamebûna kesekê aşkera dike ji me ra trajedî û dijwarîyên penaberbûnê vedibêje. Tundî, di rewşên wekî şer an jî pevçûnan de digehêje asta xwe ya herî bilind. Zîrara şerî bi tenê navbera terefên nav xwe de pevdîçîn de sînordar nîne, şer, di heman demê de zîrê dide mirovên bê gunch, û sîvîlan jî. Ji alîyekê ve “dibe sedemê mirin, seqetbûn, tehrîbata xwezayê, bînpêkirinên mafên mirovan û ji alîyekê ve jî dibine sedema ji cihûwarbûnê û koç û koçberîyê”.(Kaya, 2020:232). Di bêşên xebata xwe yên berê de me çarçoveya têgehên “penaber”, “penaxwaz” dîyar kiribû. Di vir de em dixwazin vê hevokê bi çarçoveyekê Deleuzeyî binirxînin û xetên wê yên bêcîwarîyê û yên koçberîyê bînin ziman.

Di vir de divê em li ser têgeha “şîzofrenîyê” ya Deleuzeyî rawestin û li dor vê têgehê de daneya xwe binirxînin. Deleuze û Guattarîyî peyva “şîzofrenîyê” li derveyê wateya wê ya patolojîk de bi kar anîne. Û danasîna vê peyvê li dor xebatên xwe de, wek tiştê bi kapîtalîzmê ve girêdayî ye, kirine. Divê, şîzofrenî, wekî di paradiğmaya psîkanalîtîkê de tê îfadekirin nêyê fêmkirin. “Şîzofrenî di encama çawanîya bêkodkirinên kapîtalîzmê de derdikeve hole”(Yardimcioglu û Kaplan, 2018:78). Yanî şîzo-subjekt ew kesên ku bermahîyên ji alîyê kapîtalîzmê ve hatine afirandî ne. Bi gotinekî din em dikarin bibêjin ku şîzo-subjektî, di malbat û civakê de encama nehevsengîyekê de derdikeve holê. Kapîtalîzm jî di çêkirina şîzo-subjeyê de faktora bingeîn e. Di vê peywendê de şîzofrenî dibe bermahîyeke kapîtalîzmê. “Şîzofrenî di heman demê hilberandina bêcîwarbûnê ye.”(Holland,

2005:75). Di vir de em dibînin ku kapîtalîzmê şîzo-subjeyên bêkod yên ku bi navê penaber derxistine holê. Ji vê gotina leheng û vebêjerê romanê Ferhad, diyar dibe ku kesên penaber, ji nasnameyê, zayendê, netewê, karê û statûyê hatine şûştin û bigel van taybetîyên wan yên ku ber bi asteka tekîlîyê ve hatine daxistî tevî nasnameya wan ya çêkirî ve takekesên şîzofren in. Yanî penaberên karakterên romana me şîzo-subjeyên bêcîwar in. Ev bêcîwarîya wan ji alê modernîteya kapîtalîst ve hatîye çêkirin. Lewra ev xetên wan yên takekesî, şexsî ji wan hatîye sitandin. Otorîte, sazî, komelên, civakên welatê ku wan jê daxwaza penabertîyê kiriye, ew daxistine asteka tekîlîyê. Di nezdê wê otorîteyê de, civakê de, çi taybetîyên koçberên, nefiyên, komên û kesên daxwaza sitarbûnê ji wan xwestî nîne. Ew her penaber in û divê ji vê qalibê xwe dernekevin. Bi vê yekê jî, pergala ku wan bêcîwar dihêle mebest dike ku wan têxe bin kontrola xwe de û ew kesên penaber ji hebûna wan ra nebe talûkeyek. Lewra me berê kî îfade kirbû ku pergal teşeyekê didete bedena mirovan û bi vê awayî jî wan di bin kontrola xwe de dihêle.

Di romanê de hêmanên bêcîwarîyê hem di peywenda mekan, hem beden, hem gîyan û hem polîtîkayê de hewqas hene ku em difikirin ku nivîskarî berê teorîyên bêcîwarîyê xwendine paşî dest pê nivîsîna vê romanê kirîye. Ku weha nebe jî palpiştîya derbasdarîya van teorîyên Deleuzeyî yên bêcîwarîyê derdikeve holê. Di vir de em dixwazin beşekê ji romanê bînin ber we û pişt ra bi gel babetên xwe nîrxandina vê beşê biken. Di romanê de Mihemedê Hecîzade piştî ji aliyê rejîma meleyan ve têtê xelîlîbaskirin⁵ nêcar dimîne û ji welatê xwe derdikeve. Di mijara koçberîyê de me anîbû ziman ku navbera welatê jêder û navbera welatê tê armancikirin de welatekî transît heye. Mihemedê Hecîzade di wê welatê transît de di kampekî penaberan de keçekê komînîst nas dike û ji bo mafê penabertîyê zûtir bistîne bi qest ji rêvebirên kampê ra dibêjin em jin û mêrên hev in. Vebêjer di pirtûkê de vê yekê weha tîne zîman.

Min heya Şemzînan jixwe ew keça komînîst qet nas jî nedikir, keçik bi esil xelkê Tewrêz bû, digot li Tehranê dijîm. Ew jî opozîsyon bû ji destê rejîma Îranê neçar bûbû, dixwest bireve Ewropayê û xebata xwe ya siyasî, dijî Komara Îslamî Ya Îranê, di nav hevalên xwe yên tûdehî de li Ewropayê berdewam bike. Me her duyan bi riya ber bi wê bajarê sînôrî yê Tirkîyeyê, yanî li ser riya ber bi Şemzînan hev naskir.

⁵ Di rejîma îranê de dema rejîm gumanan ji meleyekî dike ku li dijî dewletê ye, wî ceza dike û cil û şaşikên wî yên meletîyê jê dîkin.

Min û wê keça azerî jî, digel ku ez mele bûm û ew komînîst, lê me herduyan dixwest bi çî awayî be jî wê dojeha îranê rizgar bibin. Me biryar da li cem polîsên tirk bêjin ku em jin û mêr in. Ev peyman me me jî tenê bo rizgariya me bû, da ku em zûtir û hêsantir rizgar bibin. Çimkî li Tirkîyeyê, hem li cem olîsên tirk û gem li cem polîsên UN, me dizanîrêza penaberên jin û mêr bêtir dihat girtin û dosya wan bileztir dihat birêkirin. Yanî eger me bigota em jin û mêr in, falya me zûtir dihat lêkolînkirin û zûtir ber bi Ewropayê dihatin birêkirin. Êdî wiha hema me xwe da destên polîsên Tirkîyeyê, ji saeta yekê ve me got em jin û mêr in. (Pîrbal, 2012:19).

Şewqdana kadîbûnê ya herî travmatîk koçberîya navnetewî, li ser jîyana civakan û takekesan ya polîtîk, aborî, derûnî û çandî; bandorên mezin dike. Di vir de em dibînin ku meleyekî û komînîstekê jî ber fikrên xwe nekarîne ewlehîya jîyanên xwe parêzin û hewl dane koçberîyeke navnetewî bikin û li welatê transît li rastê hev hatine. “Koçberîya transît bi gelemperî binekategorîyekî koçberîyê ye û di çarçoveyekî giştî de pênaseyekî wê hêj nehatîye çêkirin.” (Tepealtı, 2019:126). Di vir de tişta em dixwazin bibêjin ev e ku: hem Mihemedê Hecîazade hem jî keça komînîst jî aliyê otorîteyê ve hatine bêtir warkirin û di encama vê bêtirwarbûnê de ev her du kes jî li ser rêyê mişextîyê bûne koçber.

Li ser vê perçeya di romanê de em dikarin analîzekê kampên penaberan û bêtirwarîyê biken. Statûya takekesên penaberî û penahendîyê jî aliyê koçberîya bi darê zorê ve hatîye dayin. Di dîrokê em gelek caran lê rastê hatine ku dewletan, di bin navê alîkarîyê de gelek stargeh jî koçberan ra çêkirine û ew koçber di van wargehên bê konfor û girûzî de sitirandine. Ev wargehên penaberan piranîn li welatê transît de tene çêkirin û penaberên dixwazin biçine welatê ku armanc dikin li vir tene rawestandin. Îro jî li Edenê, Mereşê, Kilîsê û Osmanîyê yek; li Entaqayê jî sê, bi giştî di Tirkîyê de heft penabergeh hene. di van penabergehan de pêncî û sê hezar penaberên qeytkîrî dijîn⁶. Em ê dîsa vê pirsê bikin Dewlet çima vê yekê dikin? Bi gel gelek sazîyên xwe, hêzên xwe ve çima vê mesrefe dike?

Bersiva vê pirsê beşên berê de me li dor felesefeya Deleuzyenî de dabû, di vir de em ê dîsa di çarçoveyekî cudatir de em dikarin bibêjin ku; Amraza Dewletê, makîneya ser-kodkerê civakê ye ku civakê li gorî xwe ditewîne. Ev makîne dewlet bixwe nîne. “Ev makîne, îfade, ziman, çand, nîrxên serdest birêxistin dike, pergala niştecîhîyê sazî dike, aktîvîte û hestên pergala rûniştî li hemberê nîrxên kêmkîneyan bilind dike.” (Deleuze û Parnet, 1990:129). Deleuze ev amraza

⁶ Me ev agahî di sala 2021an de ji malpera <https://multeciler.org.tr/eng/about-us/> girt.

kontrolkirinê wek dewled nîşan kirîye lê ji dewletê zêdetir e ev amraz. Di malbatekî de babekî feodal, di civakekê de axayekî xwedan hêz, di dibistanekî da gerîndeyekî otorîter hwd. ev hemû amrazên kontrolkirinê ne. Ji bo berdewamiya heyîna pergala xwe, kêmnîyan qeyd û bend diken û wan bêcîwar diken. Minaka Mihemedê Hecîzade û keça komînîst vê yekê jî aşkera dike. “Di serdema Hêz û êrîşên Ayetullah Xilaxalî de, piştî ku min xelîlîbas kirin jî dev ji min bernedan, min dizanî di bin çavênîyê da dimam û helbet dê çend hefte şûn de min heps bikin.” (Pîrbal, 2012:18) Otorîteya rejîma meleyên îranê, ji bo heyîna xwe bicîwar bike wan her duyan dike bi gotinekê çarçoveya xebata xwe de , wan bêcîwar dike. Amraza girtinê çarçoveyekî takekesî de hem Mela Mihemedê Hecîzade hem jî keça komînîst bêkod kirîye û fonksîyonên wan her duyan bi gel nêrevanîyê bê bandor kirîye. Amraza girtinê Li Îranê rejîma meleyan bûye û ev amraze li Tirkîyê jî kampa UN ê ye lewra, Mihemedê Hecîzade û Keça Komînîst bigel gelek koçberên din li Şemzînê bi destê welatê transît ve mekanê wan tête xirûzîkirin. Ev yek di romanê de weha tête ziman: “Bi sedên penaberên din re ku ji Îraq, Ermenîstan, û Gurcîstanê revîyabûn wir; em hepişandin kampeke mezin dora wê bi telbendên stûr hatibû girtin.” (Pîrbal, 2012:21) Yanî koçberên ku makîneyên şer in di kampekî de ji aliyê amraza girtinê ve dane sekinandin. Pergal, ji bo bikare van makîneyên şerî kontrol bike li erdekê xirûzî de wan bicîwar dike. Li vir em dikarin bibêjin pergala kontrolkerîyê koçber di nava xwe da bicîwar kirîye lê koçberên di kampê de bêcîwar in. Mihemedê Hecîzade bi gel gotinên xwe yên nerazî yên derheqê kampê de vê yekê gelek caran dubare dike û jixwe di dawîyê de ji kampê bi rêyên qaçaxî direve û xwe digehîne Yewnanîstanê.

Li vir em dixwazin li dorhêla koçberan de mijara bêcîwarîyê bînin ziman. Di çarçoveya koçberîya Mihemedê Hecîzade û keça komînîst de bêcîwarî û koçberîyê de diyalekteke çawa heye em dixwazin vê yekê bînin ziman. Deleuze û Guttarî bêcîwarî û koçberîyê bi berawirdkirina leyîstoka Çînîyan ya bi navê “GO” û satrancê de dinirxîne. Û bi me tegeha “makîneyên şer” li ser vê analîza xwe li koçberan bar kirîye. Li gorî Deleuze:

“satranç bi rastîyê jî şerek e lêbelê şerekî hatiye sazîkirin, sazûyî û bi kodkirî ye. Cepheyên vî şerî aşkera ne, berîya vî şerî paşîya vî şerî, muharebeyên vî şerî ji berê ve hatiye diyardin. Lê “GO” wisa nîne xetên GO yê yên şerî nînin, paşvekişan, û mûcadele tê de nîne. Bi tenê statejî ye. Lê setreng semiyolojî ye. Di setrengê de kesek ji xwe ra qadekî sererast dike lê di GOyê de kesek xwe têxe nav qadekî vekirî. Li hemberî qada setrengê ya xet xetî qada GOyê ya hilû ye. Yanî ferq ev e ku setreng, kodan têdigêje û

qadê bi kod dike lê GO bi tamamî ji wê cihê ye. Wê lokalîze dike an jî bêcîwar dike.”(Deleuze, 2005:352).

Di vir de Deleuzeyî, di navbera koçberan û kevirên GOyê de şibandinekî wekî dagirkirinê, bêkodkirinê û bêcîwarkirinê kirîye. Yanî koçberên ku diçine derekê qadekê, wê derê ji xwe ra bêkod diken û di bin deshiladarîya otorîteyê de derînin û wê derê ji xwe ra lokalîze diken. Bi gotinekê din qadê bêcîwar diken û erdekî ji yase û kodên otorîteyê şuştî derînin holê. Ji ber vê jî bi gel bêcîwarkirina qadê otorîte jî bêcîwar dibe. Otorîte jî li hemberî vê hewla makîneyên şer, bi taybetîya xwe ta amraza girtinê wan û mekanên wan, qadên wan yên hereketê xirûzî dike yanî wekî depekê setrencê, qadên wan, qadên tevgerên wan sînordar dike. Em di vê peywendê de sînorên dewletan, têlbendên li sînoran, kampên penaberan wek depekî setrencê dikarin teheyyûl biken.

Di romanê de piştî Mihemedê Hecîzade û keça komînîst rêvebirên kampê ra dibêjin em jin û mîrên hev in, wan her duyan di yek odeyê de disitirînin û nêzîkê heft mehan Mihemedê Hecîzade û keça komînîst yek odeyê de dimînin. Bi me bûyerên nava van heft mehan di navbera van her duyan de derbas bûyî yek jî ûnsûrên bêcîwarîyê ye. Ev yek di romanê de weha derbas dibe.

“Heft mehên gilover, ez û Hûmeyla, di nav odeya takekesî da rihê me dikir biteqe. Odeya me textekî nivînan yê pîs û du kesî lê hatibû danîn, me nedikarî bêjin du textên cuda yên yek kesî ji me ra binin qena em kifş nebin, taximekî çayê û sêlikeke rizîyayî ya fêkîyan jî li odeya me hebû... pencereyek jî, ku ji bextê xweş me dikarî ji wê pencereyê li çîyayên asê yên dûr li hember me temaşe bikin ku ji wan alîyan çend rîyek dîyar bûn û bi awayekî berdewam çavên me ji wan dûr bû:

-Kengî rizgarîya me ber bi Ewropa dibe?

Heft mehên gilover!

Heft mehên gilover di odeyekê bi keçê re... bi keçeke komînîst ya tewrêzî ya nûbûhar re!

Hûmeyla... keçeke memik qît zehf ter û nerm, bi taybetî jî çavên wê zehf geş û ciwan, te digot qey çavê wan perî û horîyên nazdar in, yên ku ayeta el- Waqia qala wan dike.

Her rojekê bîst û çar saetan li pêşber wê keça şox û şeng, min nikarîbû xwe bigirim. Çi bikim! Mirim hingî min ayetelkursî bo dûrkirina şeytanê seksê ji laşê xwe, dixwend. Mirim hingî di dilê xwe xwe de bi Aezûbillah.. hewes û arezûyan ji gîyanê xwe dûr bikim. Îslam dibêje “ Eger mîr û jinek li cihekê civîyan, yê sisîyan şeytan e”. Ev gotin rast e... dizanî!

Ne ku mîr, bi ser de hîç jî, bi heman awayî, nikare di hûndirê van hemû mehan de, bîst û çar saetan di nava odeyekê de xwe li hember hemû kefteleft û heyecana xwe rabigire. Bi dirêjîya wan hemû mehan bi hev ra di odeyekê de... tenê li hev binêrin û ayeta kursî bixwînin! Maqûl e? Nedibû.

Serê te neêşnim rojekê, ber bi esreke payîzê, ji zengilê xwarina êvarê lê nedabû... di nava odeya me de em bi hev ra raketin. Êdî her ev bi hev ra raketin bû... bi rastî em bûn jin û mîrên hev.” (Pîrbal, 2012:21-22)

Di vir de hêmaneke bêcîwarîyê heye ku Deleuze û Guattarî ev hêman ji sendroma Oedîpûsa Freudî girtîye lê fonksîyona teorîya xwe ji ya Freudî cihê kirine. Guattarî li ser psîkanalîza Lacanî perwerdehiya xwe girtîye û li ser psîkoterspîya teorîk xebitîye. Bi taybetî jî li ser jîyana şîzo-subjeyan û têgehiştinên wan rawestîye. Me berê jî gotibû Guattarî û Deleuze têgeha şîzofrenîyê di derveyê bikaranîna termînolojîya xwe de ji bo raverikirna encamên kapîtalîzmê darişandine. Bi vê jî hewl dane ku mekanîzmayên erkê, yên ku civakê de fonksîyonel in hilweşînin. Li gorî Deleuze û Guattarî, malbat, zayend, nasname hwd bi gel teknolojiya kapîtalîzmê ve dişuxile. Yanî van her du milîtanên xudan qelem hewl dane ku van yekan bişkinin. Kitêba wan ya *Kapîtalîzm û Şîzofrenî* rexneyeka modernîteyê ya ku arezu û tevgerên şoreşgerî bi zêdekirina subjeyên faşîzan ve ditepisîne. Yanî şîzonalîz hem bi rexnegirîya kapîtalîzmê ve hem jî psîkanalîzê ve dijraberîya teknolojiyên îktîdarî ye. Li gorî bergeha şîzoanalîtîk ji ber ku îktîdar ketîye tevahiya nava jîyana me ya rojane dibê tekoşîneke multî-beregeh bête kirin. Yanî amrazên îktîdarê hemû valahiyên jîyana civakî tije kirîye. Divê mebest ev be ku em derveyê îktîdarê keşf bikin. Di vir de em vê yekê bi bêcîwarîyê dikarin biken. Lewra derveyê îktîdarê em dikarin bi xetên xwe yên revê bibînin û ev xetên me yên revê jî ji bêcîwarbûnê çêdibin. Deleuze û Guattarî ev dijraberîya li hemberî îktîdarê bi azadkirina arezûyê gengaz dîtine.

Têgeha arezuyê di xebatên Deleuze û Guattarî de cihekî navendî digire. “Makîneyên Arezûker di nava Antî-Oîdîpûsa Deleuze û Guattarîyê de wek metaforekî cih nagire, ev têgehe tîkelîya Libîdoya Freud û Keda Marksî ye.”(Holland, 2005:75).“Bigel rêxistinbûna civaka kapîtalîst ve arezû, bingehe û tîza wê libîdo, di nava malbatê de hatiye tepisandin”.(Kızılay, 2008:9). Wekî Goodchildî jî anîye ziman, rêvebir û pêkanînerê tepisandina psîşîk malbat, ji bo ku arezûyê veguhezîne tişteke nav-malbatî wê jî nû ve saz dike. Di vir de jî tê dîtin ku malbat, ku amraza îktîdare ya sazûmanî û îdeolojîkî ye, arezuyê bi xistina çarçoveya çanda resmî ve wê dike xudan nasname û di nava kapîtalîzmê de bicîwar dike. Ev fonksîyon ji alê kapîtalîzm û îktîdarê ve bo malbatê hatiye dayîn. Ji bo ku arezû bikeve xeteka şoreşgerîyê divê derkeve derveyê sînorên sazîya malbatê.

Li jorê me çend dane dan ku hemû li ser bêcîwarkirina arezuyê disekinin ku mebesta vê bêcîwarkirinê kontrolkirina şîzo-subjeyan e. Lê şîzo-subje wexta arezûyê di çarçoveya îktîdarê de derînin wê di xetekê şoreşgerî de bi kar bînin xwe bicîwar diken. Yanî rhîzomên ku bi awayekî berwarî xwe fireh biken dikarin xwe azad jî biken. Teorîya Freudî ya binehîşîya kîlasîk eger em bîne bîra xwe di wê teorîyê de tevgerên takekesan de hereketekî ber ji jêr ve hebû lê di xetên Deleuze û Geuttarî de ev yek dijberî teorîya Freudî, ber bi jor ve an jî berwarkî ye. Yanî mebesta vê teorîyê wekî rhîzomên bîyolojîk xwe çêkirin û belavbûn e. Firehkirina qada tevger û hakîmîyetê fikra serdest e ku bi vê awayî jî bêcîwarkirina îktîdarê ve xwe bicîwarkirin gengaz dibe. Di bûyera navbera Mihemedê Hecîzade û Hûmeylayê de em li rastê bêcîwarkirina arezuyê tînin. Lê Mihemedê Hecîzade û Hûmeyla vê bêcîwarkirina arezuyê di çarçoveyeka xetekî xwe çêkirinê de diçîrînin û wê xwestekê bicîwar diken. Yanî arezûya ku li gorî yase, bawerîyên wan de bêcîwar diken.

Di vir de em dixwazin fonksîyona arezuyê ya di çarçoveya malbatî de hatîye dîyarkirin û bandorên wê bisekinin da ku em bêcîwarrîya Mihemedê Hecîzade bikaribin bînin ziman. Wekî tê zanîn arezû û libîdoya dor yaseyên malbatî û dînî de xwedî qanûnên hişk in û divê neyêne bînpêkirin. Lê Mihemedê Hecîzade vê arezûya malbat-sktrutkirî diçîrîne û çiqasê jî keçik komînîst be pê ra dikeve têkîlîyekê cînsî. Piştî vê bûyerê li gorî qanûn û kevneşopîyên rojhilatî êdî Mihemedê Hecîzade û Hûmeyla malbatek in û di vê çarçoveyê de jî malbat sazîyekî pîroz e. Piştî ku Mihemedê Hecîzade û Hûmeyla bi rastî jî dibine jin û mêren çend meh şûn de ji hev diqetin. Û ev yek di romanê de weha têtê vegotin.

“- Ji wê rojê şûn de êdî weha lê hat her dema dilê me bixwesta em dibûn jin û mêr.

- Kene min jî dihat û got:

- Pişt re ?

- Pişt re ? Hê jî çar meh di ser vê hepîsxaneyê me ya takekesî re derbas nebûbûn; Hûmeylayê got: “Ezê vegeirim”.

- Çi?

- Got “ez di nava zindanê mirim, nikarim êdî çaverê bikim”.

- Vegerîya Îranê?

- Erê bawer nedikir ku UN daxwaza me bi awayekî ciddî wergirtibe. Rast jî derket çimkî min jî eger wir nerevîyama Yewnanîstan û min bi rîya deryaya Ege xwe negihandiba

Fransayê... wiha bawer dikim vêga jî bi sedên penaberên din re, hê jî li wir girtî bûm". (Pîrbal, 2012:22)

Di vir de em dixwazin li ser xeta Mihemedê Hecîzade rawestî lewra Helwesta Hûmeylayê zêdetir helwesta Mihemedê Hecîzade balkêştir e. Wekî me anîbû zimên ku malbat û jin û mêr bûn di kevneşopîyên rojhilat de wekî sazîyekî pîroz tê qebûlkirin û di bawerîya îslamê de jî ji bilî rewşên gelek awarte cudabûn nayê qebulkirin. Lê di vir de Mihemedê Hecîzade ku ilma xwe li ser zanistên îslamî kirîye û meleyek e çima dibe ku dev ji jina xwe berdide û wê dihêle bi tenê vegere Îranê. Bi me di vir de piştî ku bêcîwarkirina arezûyê Mihemedê Hecîzade careke din bi arezûya bêcîwarîye xetên xwe berbelav dike. Lewra cara ewil ku bi gel Hûmeylayê radikeve çarçoveya çanda xwe de arezûyê bêcîwar dike vê carê jî ji bo ku xwe xelas bike û bireve Ewropayê qanûnên malbatîye yê çanda xwe, bêcîwar dike û li dijî wan yaseyên malbatî û çandî tê jina xwe tenê dihêle û ji bo heyîna xwe hem malbatê hem jî qanûnên malbatî bêcîwar dike. Cihê gotinê ye ku di van bêcîwarkirina nîrxên çanda xwe de, xwe bi xwe jî bicîwar dike.

Di romanê de diyalogekî balkêş heye ku bi me ev diyalog di navbera teorîya binehişîya Freudî û teorîya Deleuze û Guattariyê de têûdîçe. Ev yek jî behsa xetên revê dike. Xetên xwe çekirinê. Ev diyaloga navbera Saqî Gulçîn, Mihemedê Hecîzade û Ferhad de derbas dibe di romanê de weha ye.

-Çima qey di bawerîya te de, kultura Ewropayê ji kultura me ya îranî ya resen baştir û resantir e... Axayê Ferhad

Min ji Mihemedê Hecîzade re got:

- Mesele ne ew e kîjan kultur resantir e, mesele jîyan û siberoja me ye. Çimkî heke em herdem li dora hev û di nav hev de bimînin, êdî çima em hatine Ewropayê?

Vê gotina min wiha li wan kir çirkeyekê bêdeng bibin, min got:

- Eger hûn dixwazin bi berdewamî û di nav kultura xwe de û bi heman kevneşopîyên welatê xwe li Ewropayê bijîn... ji ber çî we ev hemû ked û nexweşî daye ber xwe heya bigihijîn vir?

Min berê xwe da Mihemedê Hecîzade:

-Eger hûn dixwazin her tim di nav nostalji û xeleta jîyana xwe ya derbasbûyî de bizivirin ; êdî ji ber çî venagerin?

-Hûn... nexwe ji ber çî hatine vir?(Pîrbal, 2012:59).

Di vir de balkêş e ku kesê Ewropa û kultura Ewropayê diparêze Ferhad e ku ew jî berîya Mihemedê Hecîzade û Saqî Gulçînê hatiye Ewropayê. Yanî Ferhad entegreyê cihê xwe bûye û bêcîwarîya xwe kemilandîye. Ji bo wî êdî

nostaljî, jîyana berê, nirxên wî yên berê, welatê wî yê berê bi tenê tiştêkî ji rêzê ye ji ber vê ew bêtîwar e. Ji bo wî her derek dikare bibe stargehek wî xetên xwe yên berê wek aidî, ax, welat, hiş û bîr hwd hilû kirîye û ji bo wî êdî xetên xwe çekirinê muhîm in. Mîna koçberên Deleuzeyî wî sînor û nirxên feodal bin pê kirine bi vê awayî jî ji bo wî girîngiya çanda rojhilatê û rojavayê; nirxên rojhilatê û rojavayê nînin. Tiştê ji bo Ferhad girîng ev e ku xwe çekirin û xwe dîtîn e. Dibe ku li ser vê tevgera Ferhad pirsekî weha hebe ku bibêje Ferhad asîmîle bûye. Çanda xwe ji bîr kirîye. Lê divê neyê ji bîrkirin ku bêtîwarî jixwe ragirtina kêmnîyan nebû? Ferhad hem çanda xwe û hem çanda rojava di xwe da radigire bi vê yekê jî ji xwe ra cetên nû ên ber bi pêşerojê çêdike û xwe jî di nava van xetan de çêdibe.

Eger em Mihemdê Hecîzade binirxîin em dikarin ku bibêjin Mihemedê Hecîzade, bêtîwarek e. Lew teorîya derhişîya Freudî teorîyek e ku berê wê tim li rabirdûyê yê. Bi gel bellek, bîranîn, û hişî dixebite (Akay, 1996b, s. 19). Mihemedê Hecîzade, di nava nostaljiya xwe de hêj bêtîwar e. Ji ber vê çanda rojava napejirîne û çanda xwe li ser ya rojava dibîne. Evê yekê di cihekê de weha tîne ziman “ Ev çend meh in di nav vê çirava Ewropayê dizivirim ev Fransîyên ha kengî beşer in? Kengî dizanin exlaq, edet, mirovatî çi ye”? (Pîrbal, 2012) Xwe di nava kevneşopîyên xwe asê dike û bi vê awayî jî hişê wî nahê jîyana wî ya nû vesaz bibe. Bi gotinekî din em dikarin bibêjin ku hişê Mihemedê Hecîzade, rê nade ku ew xwe ji bin deshiladariya otorîteya ku ew nefî kirîye azad be. Ji ber vê jî Mihemedê Hecîzade di nava rabirdûya xwe da bêtîwar e û nikare xetên xwe yên revê ber bi pêşerojê ve bavêje.

Di berdewama diyalogê de Ferhad ji Mihemedê Hecîzade ra weha dibê ku bi me ev yek girîngiya xetên revê yên bêtîwariyê rave dike. “Îro qet Ewropayê re ne girîng e jîyaneke te ya çiqasî dijwar hebû çi li te qewimîyeû te çi ji destê rejîma xwe dîtîye! Girîng ew e ku tu îro çi dixwazî, dixwazî kî bibî?” (Pîrbal, 2012:61). Di vir de bi me , Ferhad daxwaza Ewropayê nayîne ziman. Ferhad bi vê gotina xwe daxwaza xwe tîne ziman û xweşîya bêtîwariyê dikirpîne. Lew bi gotina “tu dixwazî bibî kî” kurtiya bêtîwariyê di xwe da radigire û xweşî û erênîyên bêtîwariyê tîne ziman.

Di romanê de yek ji hêmanekî bêtîwariyê heye ku em dikarin vê cureya bêtîwariyê li ser terzekî Kafkaeskî binin ziman. Ev cure bêtîwarî jî ya Monsieur

Lucianayî ye ku bixwe doktoraya xwe li ser helbestên Farîsî kirîyeye û li ser çanda Farisan xudan meraqekî mezin e. Di vir de peywendîyekê çawa heye di navbera bêcîwarîyê di navbera Monsieur Luciana de? Ger em vê teksa ji romanê biden em ê mebesta xwe baştir bînin ziman.

Monsieur Luciana digot ku hemû jîyana xwe qet careke tenê jî, neçûye Îranê. Jê ecêb dimam!

Ew farîsiya baş ku pê dipeyivî di hundirê çar salan de li Enstîtûya Zimanên Rojhilatî ya Parîsê “Înalco” fêr bûbû. Bi wî temenî jî digot ku zimanê inglîzî û portekîzî jî pir baş dipeyive û dixwîne. (Pîrbal, 2012, s. 77).

Ali Akay di pêşgotina *Mînor Bir Edebîyat Îçin: Kafka* de dibêje ku: Ne tenê çîrok û romanên Kafakayî nameyên wî jî perçeyekê edebîyatê ye. Divê nameyên wî jî wek tekstên edebî bihêne nirxandin. Lewra Deleuze û Guttarî, di peywenda bêcîwarî edebîyata mînor de li ser nameyên wî nirxandin û analîzên di cî de kirine. Deleuze û Guttarî di vê xebata xwe de li ser nameyên Kafkayî yên ji Mîlenayê û Felîceyê ra şandî nirxandinekî weha diken. “Nameyên Kafkayî -ji alîyê forma nivîskarê nameyan ve subjeya gotinan û ji alîyê forma vegotinên naveroka nameyê ve subjeya peyvê de- dualîne.” (Gilles Deleuze & Guattari, 2015:11). Lew Kafka di nameyên xwe de dibêje ku mihtacê xwîna Mîlenayê me. Yanî Mîlenayê arezu dike lê naçe Mîlenayê nabîne ti caran. Yanî têkelîyên têne paşve avêtin û têne rawestdandin hene. Kafka ti carî Mîlenayê naçe nabîne lê li şûna xwe, nameyên xwe -subjeya gotinê- jê ra dişîne. Yanî Nivîskar bêyî cihguhezîyê koçberîyekê dijî. Li şûna çûyîne şandina nameyan tercîh dike. Yanî Kafka bêcîwarîya xwe li nameyên xwe bar dike. Li şûna wî nameyên wî diçin Mîlenayê dibînin. Ger em têkilîyekê di navbera nameyên Kafka û Monsieur Lucianayî de biken em dikarin bibêjin ku Monsieur Luciana, arezuya xwe ya çûyîna Îsfahanê bi gel xebat û lêkolînên xwe ditepisîne. Ew jî bi şeklekî Kafkaeskî gotinên xwe bêcîwar dike û hevdiîtina xwe ya Îsfahanê paş ve davêje. Xebat û lêkolînên wî cihê arezuya wî digire û arezuya xwe bêcîwar dike. Di romanê de Monsieur Luciana gotinên xwe weha têxte cihê arezuya xwe ya çûyîna Îsfahanê:

Monsieur Luciana bi meraq çavên wî tije xewn digot:

Carna di xew de dibînim “çûme Îsfahanê... paltoyekî sor yê zivistanî li min e û tîk û tenê, bi berbanga sibehê re ji Hotêla Ali Qapû derdikevim û di pêşber rawestgeha Babab Qasim re derbas dibim; pir kêfxweş, bi minareya navdar ya Sareban û Darulzîyafê, ku ya yekemîn di serdema Selçûqîyan de û ya duyemîn jî di serdema Êlxanîyan de hatiye çêkirin; diponijim. Vêce di baxçeyê Çeharbax de ku berê cihê meş û seyrana endamên malbata Şah Ebbasê Sefewî bû, têr têr li ava ciwan ya Zaynde Rud dinêrim... heta êdî ew

zebara biçûk min digehîne pira Sî û Sê Pel. Pişt re jî ji wir berê meşa xwe diguherînim ber bi dîtina Mizgefta xweşik ya Çarçî Başî ku dikeve orta bazara mezin ya Îsfahanê. (hb. r, 91).

Di vir de Monsieur Luciana bi gel nivis û xewnên xwe arezuya xwe bêcîwar dike lê di vê perçeyê de di heman demê de bi gel “metafora berkirina paltoyekî sor î zivistanî” daxwaza bêcîwarkirina otorîteya Îranê jî tîne ziman. Me berkirina cilekî sor ê mêrekî wek metaforekî da nîşan. Lewra me berê jî anîbû ziman bêcîwarî, bigel nepejirandina otorîteyê di heman demê de di xwe de cihkirina cihêyîyan e. Wexta em li pîvanên rejîma Îranê yê cilberkirinê binêrin em ê bibînin ku yek-tîp cilûbergên mêran hene ew jî eba û şaşik in. Û jin jî mecbur in ku serê xwe bigirin. Ev yek jî wek çêkirina makîneyên yek-tîp dikare bihête şîrovekirin. Lewra ototîte teşeyê daye bedena mirovan û bi darê zorê be jî takekes û civaka îranê kirîye makîneyên ku yek-tîp cilan ber xwe diken. Lê Monsieur Luciana bi vê arezuya xwe ya cilekê modern ve mebest kirîye van makîneyên yek-tîp cilan ber xwe diken bêcîwar bike.

Me, li jorê anî ziman ku Moncieur Luciana arezuya xwe bi gotinên xwe, bi xebatên xwe û bi xewnên xwe bêcîwar kirîye. Di vê deqê de jixwe ew bi xwe jî di perçeyekî romanê de vê yekê weha tîne ziman.

-piştî çûna Zîbayê, min xwe ji lêkolîn û nivîsandinê re vala kir... nivîsandin derbarê dîroka mûzîkê li Îranê, dîroka peykersazîyê li Îranê, dîroka rojhilatzanîyê li Îranê dîroka cihuyan li Îranê... çima ku tenê tenê lêkolîn û nivîsandin li hawara min dihatin qena bikarim xwe ji bîr bikim. Tenê lêkolînên akademîk dikarîbûn nalîna cûdabûnê û hesreta dûrîya Zîbayê sivik bikin. (Pîrbal, 2012, s. 140)

Di vir de tê dîtîn ku Moncieur Luciana bi xwe jî vê yekê îfade dike xebat û lêkolînên wî, ew ji nalîn û hesretê dûr kirîye. Bi awayekî Kafkaesk ji bo jana arezuya xwe bitefîne xwe daye karê nivîsandin û lêkolînê. Bi me, em jî dikarin weha şîrove bikin. Moncieur Luciana Cihuyekî portekîzî yî xwedan paseporta Îsraîlê ye jî. Krîza navbera Îran û Îsraîlê de nahêle ku welatîyên yek ji wan welatan biçine serdana hev. Ji ber vê yekê Luciana nikare biçê Îranê hem Îsfahanê hem jî Zîbaya kevneyara xwe bibîne. Arezuyekî gur heye ji bo dîtîn û çûyînê lê belê krîzên dîplomatîk yê navbera van her du welatan rê nade biçê arezuya xwe bicî bike. Ji ber vê jî Luciana bi rêya nivîs û lêkolînên li ser Îranê arezu û xwestekên xwe bêcîwar dike. Ew bi xwe li cihê xwe de, bi rêya nivîsên xwe seyhatekî ber bi pêşerojê ve dike û xwe çêdike.

Di felsefeya Deleuze û Guattarî de yek têgeha “makîneyê” yek ji girîngtirîn mijaran e. “Têgehên “ makîneyên şerî” û “makîneyên arezûker” li ser derhişiyê bo têkbirina kompleksa oîdîpusa paradîgmaya Freudyan mudaxileyekî radîkal e.” (Özcan & Güneş, 2021:301). Ê ev meseleya makîneyan hevnasîna bingeha Deleuze û Guattarîyê pêk anîye. Deleuze û Guattarî ji bo koçberan têgeha “makîneyên şerî” dariştandibûn. Bi vê têgehê jî danasîna berxwedana li hemberê tundiyên îktîdarê dihate kirin. Li derveyê vê têgehê “makîneyên arezûker” ji bo takekesan dariştandine û li gorî wan jî arezû ji çîna pêdivîyan cihê diken. *Antî-Oedîpus* a wan di destpêkê de arezuyê wek xetekî heterojen ji çînen arezuyên îdealîst ve vediqetîne. Çînen îdealîst wek mantiqa arezuyê ya feodal dide nasîn. Lê bergeha li ser arezuyê xwe digehîne prosesekî hezar salî. Platon *Şolenê* de arezuyê li ser xudanbûn û destxistinê dide nasîn. Lê li gorî Deleuze û Guattarî, meriv nikare arezuyê daxîne asta pêdivîyan bereksê vê tiştê ku pêdivîyan karakterîze dike arzu bi xwe ye. Kî wext em dikarin bibêjin ku arezu, bi tiştê pêdivê ve û nesneya pêdivîyê ve girêdayî nîne. Yanî arezu li pey peywendî û lêgerînên nûye. Yanî arezu cihêbûnekî domdar e.

Di dayîna van daneyan de mebesta ev e ku di beşa romanê ya rêzê de em ê bi van agahîyan binirxînin. Di romanê de ev beşe bi navê Otel Europayê hatîye dayîn. Ê di vir de serlehengê romanê Ferhad behsa hin arezu û xwestekên xwe weha tîne ziman.

Çend salan her roj heman tiştî bikî, heman rîyê derbas bikî, heman tiştî bibînî, heman tiştî bixwî, heman tiştî vexwî û heman gotinan bibihîzî... ji min ra pir nexweş bû.

Çend salan heman hotel, heman kar, dubare heman metro; heman bêhn; heman kes... min dixwest ji destê vê heman rûtînê rizgar bibim.

Wextê karekî cûda bibinî û pîyên xwe davêjî cîhanekê nû, bawerîya min wiha bû; jîyan te jî wateya nû dike û dibe ku te ber bi rîyeke xweştir û şadtir bibe.

Bi kurtî, ji vê karê nobedarîyê li “Hotêl Europayê” bêzar bûbûm.

Her roj saet heşt û deh deqîqeyên sibehê, min metroya Possionnerie digirt û saet heşt nîv digihîjtim malê, heya nîvro radizam. Piştî nîvro li kolanên Parîsê digerîyam heya dema destpêkirina karê min, saet heştê êvarê divabû dîsa li pêşwazîgeha Hotêl Europa amade bûbam; bêtî deqeyeke derengbûnê, ji ber di saeta dîyarkirî da, Muncieur Vector, koleyekî reş yê ji Burkîna Faso ku di dema rojê de li cihê min dewam dikir, divabû ji hotele here û biçe pey zarokên xwe ku digot Antonî ne û dora nîv saetê bi trêna lezgîn ji hotelê dûr bûn; nedixwest dereng bimîne û metroya dema destnîşankirî ji destê wî here. (Pîrbal, 2012, ss. 145-146)

Di vir de vê pasajê de berçav e ku em herî zêde li rastê peyvên wek saet, metro, tren, şefeq, şev, destpêk û xilasê tînin. Ev peyvana peyvên ji aliyê me hatine

dîyarkirî nînin. Di nava pergalekê bi rêkûpêk de bi xwezaya xwe diguherin û diherikin. Mîna makîneyên fabrîkayekê bi asayî û di raya xwe de dişuxilin. Ferhadê serlehengê romanê ji van tiştan aciz e û ji ber vê herka ne destê wî de nerehetîya xwe tîne ziman. Eger em vegerine li ser têgehên Deleuze û Guttarî em ê bibînin ku Ferhad êdî bûye makîneyek ku bi gel makîneyên demê dişuxile. Yanî ti azadiyeke wê nemaye. Êdî bûye makîneyek ku li dor hêla pergala demê û xebatê de çerx dizivire. Van têgehan em çend cihên din yên romanê de dîsa dibînin. “Li Saint Moloyê, her gav heya saet yazdehê sibê radiketim. Gava ji xew radibûm, piştî firavînê, diçûm balkona xwe her car li min bûbû xuy û eded; çend deqeyan bi kişandina cixareyan û vexwarina qehweyê li ser kursiyê rudiniştim”. (Pîrbal, 2012, s. 165). Lê Ferhad bi gel arezûyên xwe yên azadbûnê pêdîvîyên xwe karakterîze dike û bigel acizîya xwe xwesteka xwe ya derketinê ji vê têkûzîyê jî tîne ziman. Arezûyên Ferhadî ku makîneyekî bi gel demê dişuxilîya wê ji pergala demê û têkûzîyê bêcîwar dike û wê vedigerine rîzomekî. Ferhad wek rîzomekî ku xudan tevgerên berwarî dixwaze xwe ji pergala karî ya ku mîna makîneyên fabrîkayê dişuxile rizgar bibe û ji wir derdikeve.

“Mirovên modern bigel bilindbûna eqî û teknîkê ve li rex bajarîbûn û tevgerên koçberîyê ji kokên xwe tîne qetandin.” (Aytaş & Ulutaş, 2021: 54). Yek ji pêşengên felsefeya hebûnê Martîn Heidegger serdema xwe wek serdema qeyranan daye nasîn. Ew sedema dîrketina mirovan ya ji kok û cih û waran wek serdestîya teknoloji fîkra modern angaşt dike. Heidegger, di derheqê hesreta malê ya ku mirovên koçî bajarên mezin kirine di çarçoveya welat\ mal de gehiştandîye statûyeke têgehî. Di felsefeya Heideggerî de, bi hakîmîyeta koçberî teknolojiyê, kesên ji welatê xwe ra bîyanî bûne di têgehiştandina hebûnê de tiştêkî trajîk e.

Di Romanê de vê beşa em ê biden da Ferhad hesreta welatê xwe tîne ziman û arezuya vegera malê ya hindirê wî de gurbûyî tîne ziman. Lê di serî de divê em rave biken ku arezuya Ferhad ya vegera malê ji arezuya nostlajiyê û rabirdûyê nayê. Di pasajê de Ferhad vê arezuya xwe ya vegeêrê weha vedibêje:

Piştî van hemû salên resimandinê û karê hûnerî li Parîsê , bi van gotinên Monsieur Lucianayî diramîyam û min ji xwe ra got: Rast e! Di ser yanzdeh salan re ye ez li Ewropayê wêneyan dikêşînim? Ez kî me? Çi me? Li Ewropayê wateya min çi ye?

Van pirsîyarên derbarê nasnameya min ya hûnerî û şexsî de, dilê min dikezaxtin û bêtir dianîm li ser kelkela vegera li welatê xwe. (Pîrbal, 2012:165)

Di dawîya pasajê de tê dîtîn ku û me berê jî anîbû zimên bêcîwarî bi têgeha kokan ve girêdayîye. Di çarçoveyekî azadî û hilberandinê de vegera ser kokan yan jî dîtina kokan e. Ferhad di dawîya pasajê de bi wan pirsên dorhêla kokên xwe de ji xwe dipirse û di encama bersiva van pirsan de têdigihêje ku kokên wî yên azadker û rastîn li welatê wî ye. Bi vê awayî xwe ji morana Ewropayê jî bêcîwar dike û xwe nêzîktirê welatê xwe dike. Hebûna wî li welatê wî dê wî rihet bihêle û azad bike. Bi gotinekî din em dikarin bibêjin ku Ferhad li Ewropayê jî li pey kokên xwe ye û li wir jî bêcîwarek e.

Me heya niha hewl da ku em bi gel karakter û tîpên romanê ve romanê di peywenda bêcîwarîyê binirxînin. Em ê niha jî angaşt bikin ku li dor agahîyên jîyana nivîskarî û karakterên romanê de romanê li dor peywenda bêcîwarîyê de binirxînin. Berna *Moran di Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi* (2017) de dibêje ku “wexta dorhêla rexneya li dor hûnermendî de, em berhemekî binirxînin agahîyên derheqê jîyana hûnermendî de her weha wexta em bixwazin jîyana hûnermend li ber çavan zela biken berhemên wî, karakterên berhemên wî wek belgeyan bi kar tînin.” (Moran, 2017:132). Roman, wekî me di kurtayê de jî anî ziman romaneka xwe dispêre bûyerên rasteqînîyê ye. Lê çi berhemek nîne ku bêtî xeyalperestî û hêza nivîskarî ya fîksîyonê derkeve holê. Ji ber vê jî em ê niha hem li gorî agahîyên jîyana Ferhad Pîrbal û ji taybetîyên karakteran çend agahîya biden.

Em di vir de dixwazin Ferhad Pîrbal li ser Mihemedê Hecîzade û Monciuer Lucianayî binirxînin. “Ferhad Pîrbal piştî Beşa Ziman û Edebîyatê Kurdî xwendîye çûye di Zanîngeha Sarbonnê de li ser zimanên Rojhilatî doktoraya xwe qedandîye.” (Polat, 2019:53). Di romanê de fîksîyona Lucianayî de jî ev yek bi awayekî vekirî dihate gotin ku doktoraya xwe li ser zimanên rojhilatî kirîye û gelek makaleyên akademîk û zanistî weşandiye. Ji aliyê ruxsarîyê ve jî em dikarin bibêjin ku Monciuer Luciana mirovekî modern û ji hûner û hûnermendîyê têdigihîje. Jixwe di diyalogên navbera Ferhad û wî de ev yek jî gelek vekirîye. Aliyeke din ve Ferhad Pîrbal di salên şerê navbera Îran û Îraqê de li Îranê wek penaber maye û Mihemedê Hecîzade jî mirovekî Îranî ye girêdayê nirxên xwe yên rojhilatî ye û çanda xwe li ser çanda Ewropayê dibîne. Wekî gelek kesên rojhilatî sedemên qeyranên li rojhilat ew jî welatên ewropî dibîne û gelek caran welatên ewropî ji bo piçûkxistina wek gawir û kafîr şayesîne. Di vir de bi

me Ferhad Pîrbal bi Mihemedê Hecîzade ve rûyê xwe yê Rojhilatî, bi Monciuer Lucianayî ve rûyê xwe yê Rojavayî dide nîşan. Yanî nivîskarî di romanê bi gel fiksiyonê ve xwe di şexsê van herdu lehengan de bêtîwar kirîye. Taybetîyên xwe yê Rojavayî li Monciuer, yê Rojhelatî jî li Mihemed Hecîzade bar kirîye. Bi vî awayî jî fikrên xwe yê di navbera du cemserên dijberê hev de mayî li ser van her du karakteran anîye ziman. Xwe hem di şexsê Mihemedê Hecîzade de hem jî yê Monciuer Lucianayî de daye jîyandin. Xetên xwe yê dualî bi wan her du kesan ve daye ber xwîneran.

2.5. Santiago Del Compestelo.

Santiago De Compestela yek ji romanên Ferhad Pîrbal ye ku wî di navbera salên 1989,1991an de li Parîsê nivîsandîye. “Li Hewlêrê destpêka sala 2002an de piştî çend sererastkirinan hatîye çapkirin” (Pîrbal, 2013). Roman di sala 2013an de bi wergêrîya Besam Mistefa ji Weşanên Avestayê li Stenbolê deketîye ber xwînerên kurmanç. Bergê romanê, ji tabloyekên serlehengê romanê Darayî ye. Ev roman Ferhad Pîrbal wekî romana wî ya Hotel Europayê jîyan û serpêhatîyên penaberên li Ewropayê vedibêje. Cihê ku penaberî û koçberî tê hebe miheqeq trajedîyên rabirdûyî û serpêhatîyên balkêş tê de hene. Serlehengê Romanê “Dara” wênekêşekî kurdê Helepçeyê ye ji vir jî em pê dizanin ku serleheng Ferhad Pîrbal bi xwe ye. Roman jî vî alîyê ve romanekî otofiksiyon e. Lewra hem serpêhatîyên nivîskarî û hêza xeyalên hûnermendî nav hev de ne. Roman jî devê kesê yekem ve tê vegotin û carna jî bergeha îlahî ve hatîye vegotin. Roman jî 166 rûpelan pêkhatîye.

Dara ressamêkî kurd e ji xelkê Helebçe û li Montmartrea Parîsê penaberek e ku portreyan ji bo tûrîstan çêdike. Her tim dixwaze koç bike, her tim dixwaze cihê ku lê ye li pey xwe bihêle û biçe. Lê di nav cihên çûyîne de Kurdistan nîne, ji ber ku li wir wan tabloyan kes bi du dînan nakire. Dara li Toulousê wexta wêneyan ji tûrîstan ra çêdike nivîskareka bi navê Orîanayê nas dike û ew jinik ji bo romana xwe xêzkirina çend wêneyan jê ra teklîf û Darayî vedixwîne derekê.

Dara li vexwendina Orîanayê qebûl dike û diçe kokteylê li wir di bin bandora sermestîyê de keçikekê nas dike. Ev keçik bi gel dê û bavê xwe ji bo geryana Parîsê ji Santîago de Compestela ku bajarokekê Spanyayê hatine. Di wê şevê de Dara di bin bandora heşîş û alkolê de bi gel Venûsê têkilîyê datîne û aşîqê Venûsê dibe. Dara di wê şevê de biryarê dide ku her tiştê li pey xwe bihêle û biçê li cem Venûsê, li Santîago de Compesteloyê bi cî be. Roman bi vê awayî hem sserpêhatîya rêwîtiya Darayî û hem jî şayesandinên vê rêwîtiyê bi awayeke serkeftî vedibêje.

Dara ku derbarê Venûsê de tiştêk nizane ku li Parîsê carekê çend saetan hev dîtîne, li pey wê dikeve diçe Îspanyayê. Dara piştî rêwîtiyekî dûv û dirêj digehêje Santîago de Compestelayê çend serborîyên din jî li ser wî derbas dibe. Wexta digehêje adresa ku Venûsê dibîne ku ew keçîka şox û çeleng ne ew Venûs e. Di bin bandora heşîşê de wisa lê xweş xuya bûye.

2.5.1. Di Romanê de Şopên Bêcîwarîyê.

Ev romana Ferhad Pîrbal jî wekî romana wî ya *Hotêl Europa* bi destpêka danasîna jîyana penabertî û sedemên penaberbûnê dest pê dike. Bûyerên romanê piştî ajîtîze kirina van têgehan dest pê dike. Bûyera sereka arezûya Darayî ya koçberîyê vedibêje. Dara wekî makîneyekê di fabrîkayekê de dişuxile xwe dibîne û ji ber vê bêzar dibe û ji bo hilberandinên hûnerî arezuya xwe ya barkirinê tîne ziman. Dara di vegotina romanê de weha tîne ziman.

“Heft salên gilover in ez li Parîsê dijîm. Ger heft salên din jî lê bimînim, jîyana min -piştrastim- her ew dibe ku hebû: sibehan saet heft û nivê sibehê rabe ser pîyan, metro bigre “ niv saetê li nav metro” here ser kar, piştî nivro vegere odeya xwe biçûk, bi lez nanekî bixwe, dûşekê çêke, dîsa ber bi Mountmartre bireve; standa xwe hilde û bendewar be heta kesek tê û rûdine, bi awayekî otomotîkî wêneyekî bi lez ê bazirganî jê re bikêşîne, piştra kesekê dî, tabloyekî din, diduyên din, sisêyên din; dû re gava êvar jî tê, dîsa stand û board û kalûmêlên xwe bipêçe xwaro maro, ber bi xwaringeha Mountmartre heta nivê şevê bi xwarin û vexwarinê ra guh bidêre sohbet û û ken û qalmeqala hevalên xwe.”(Pîrbal, 2013:20).

Wexta em vê pasajê dixwînin em hest pê nakin ku ev ne mirovek e qey makîneyek e ku li gorî prosesa xebata xwe tevdiqere û hewl dide ku mesaîya xwe biqedîne da ku dîsa vegere heman tiştê. Di vir de Dara bi daxwaza xwe van nake lê mecbûr e ku bike jî. Yanî ev yek tiştêkî qey perçeyekî bedena wî ye dike. Mîna makîneyekî ye û qey kesek an jî mekanîzmeyek heye kuwî rêve dibe. Ev yek jî di dorhêla xebata me de me rasterast dibete ser tegeha Deleuzeyî ya “bedenên bê

organ”. Xetên revê û bêcîwarîya Deleuze li hemberî bedenên hatine bi kodkirî, rêya xelasîyê ye. Yanî em di vê pasajê de dibînin ku pergale bi tanê dem, wext, amûr, kar û prosesa van bi kod nekirîye. Bi gel van kodan takekesê ku bikeve nava vê prosesê de jî bixwe bixwe dihête kodkrin. “Bedenên bê organ li hemberî bedenên hatine kodkirî ne, nasname û taybetîyên li ser bedenê de hatine çêkirin red dike û davêje”.(Erkan, 2019:2641). Dara jî van kodên li ser wî hatine xêzkirin bi fikra koçberîye dixwaze bavêje. Yanî bi bêcîwarbûnê dikare xwe ji şahanîyê pergale û jî çavênîya modernîteyê xilas bike. Ji ber vê ye ku arezuya koçberîyê di dilê Darayî de şax vedide û dixwaze ji van rutînan xilas bibe xwe bêcîwar bike.

Li ser bedenên kodkirî û rutînen jîyana modern, roman gelek mînakên baş radigire. Ev mînake li ser bedenên kodkirî entegrebûna pergala modern ve de mijarê di hişê me zelaltir bike:

-Gund û sirûşt û cihên bi vî rengî bi kêrî me nayên, bira!

-Em êdî hînî Parîsê bûne; em kilometreykê ji Parîsê dûr bikevin em ê bimirin.

-Ji nêza, ji bêmaliyê, ji bêperetîyê.(r.24)

Ev diyaloga navbera hevalên Darayî de derbas dibe ji bo têgehiştina cihêyîya navbera mirovên bêcîwar û mirovên xudanên bedenên bi kod mînakekî baş e. Lewra Darayê ku ji ber kodên modernîteyê bêzar bûye dikare van kodan bi fikra koçberîyê li ser xwe bavêje û xwe bike bedenekî bê organ lê hevalên wî wekî di vê diyalogê de jî tînin ziman xweşkirina kodên modernîteyê dispêrin bêperetîyê û çendîn tiştên din. Di vir de diyar dibe ku bêcîwarî hem curetkarîyê dixwaze hem jî redkirina jîyana modernîteyê. Lê di encama van de jî jîyaneka nû azad bexşê mirovan dike.

Em dikarin bibêjin ku roman, bi gelemberî li ser fikra koç û koçberîyê radiweste û li ser teorîya vê fikrê encamên wê jî dihête vegêran. Koçberîya Deleuzyen, rêwîtiya tevgera ber bi tiştê nayê zanînê ve ye. Yanî ev rêwîtî li dor armanekî sereke an ku saîqekî tê hedefkirin nayê kirin. Di fikra koçberîya Deleuzyen de armanca bingeîn û sereke bêkodkirina mekan û cihê ye. Yanî takekes an ku koçer bi mebesta azadbûnê derdikeve rê. Di vê rêwîtiya wan de koçber hem mekanê hem jî otorîteyê bêcîwar diken. Ji wan re mekan ferq nake ji ber ku ew li her derê bêcîwar in. Her der di wan de bêcîwar e. Di vir de ev gotina Voltareyî “ Ez li ku derê nebim dê li wir aram bim” manifestoya koçberên

Deleuzeyî ye. Di romanê de arezuya bêcîwarkirina bedenên bi organ û otorîteyê em dikarin bi ve pasajê biden.

Şazad, ku mestîyeke nerm xemgînîya çavên wî diçirisan berê xwe da Nerîman:

- Em timî dixwazin koç bikin, em timî dixwazin cihê em lê ne li pey xwe bihêlin.. Şîyamend bi te'nelêdan got:

- Em ciwan in...

Şazad bi heman xweşîya mestîyê, got:

- Na çiku em wiha dibînînin ger em wî cihî li pey xwe bihêlin êdî em ê li cihê duduyan rehet bibin û êdî hesta bê welatî û penaberîya me nanîne.(r.34)

Di vir de dîyar e ku penabertî û bêwelatî kodek e ku li ser wan karakteran ve hatîye zeliqandin û wisa difikirin ku dê van kodên kêmxistebare bi rêya koçberîyê li ser xwe bavêjin û xwe bêtod bikin. Bedenên xwe jî organên modernîte û kapîtalîzmê paqij biken. Lewra cihê ku biçinê an ku koçî bikinê dikarin wêrê bêtod biken. Cihêkî ku kodên modernîteyê tinebe li wir darizandin û kêmdîtî jî çênabe. Arezuya van karakteran jî ber van dizê. Yanî xwesteka azadbûnê û derketina derveyê serwerîya dewletê takekesan dide ber pêlên koçberîyê.

Koçberî, li hemberî pergalên tundker û totalîter wek xeta revê û bêcîwarîyê wek rêbazekî rizgarbûnê dibe ku bihête bi kar anîn. Lê fikra koçberîyê di romanê de tenê jî bo vê mebestê nehatîye bi kar anîn. Modernîte li ser beden, şîyan, xwestek û saîqên mirovan çêdike û li ser van babetan heyîna berdewam dike lê di sedsala 21. de ti derek wek edebîyat, mûzîk, hûner, peyker, bajar, hwd. nîne ku modernîteyê heyîna xwe li ser wê nedaye hîskirin. Em dikarin bibêjin ku sektor û ciheke modernîteya kapîtalîst li her derekê ye û jî bo berdewamîya heyîna xwe li hemû jîyana mirovan dişuxile. Di reşeke wiha de bandora sedsalê li ser hilberandinên mirovan jî dişuxile û midaxileyê ser berheman dike û wan yan têxe qalibên xwe yan jî sînordar dike. Di romanê yek jî fikrên koçberîyê li hilberandina berhemên hûnerî derdikeve û bi me jî ev yek jî bi me jî kesayetîya hûnermendî ya hûnerî tê. Di romanê de ve yek weha tête vegêran.

- Mi têbinî kirîye, hûnermend, piranîya wan, ji rêwîti û serkêşîyê hezdikin.

Mî jî got: timî jî mebesta wan ew e ku aram bibin û vehesin.

Kenîya got:

- Ti carî aram nabin.

Min got: Hunermend ger welatekî wî hebe, belê... aram dibe.

- De nexwe, ti carî aram nabe.

Min got: Çima?

Got: Çiku ev welatê ku hunermed dixwaze li ser rûyê erdê nemaye, nîne.(r.53)

Di vê pasajê de dîyar dibe ku hûnermend bi arezuya hezê ve dixwaze xwe bêcîwar bike û hezê û estetîkê wisa bibîne. Lewra modernîteyê têgehiştina estetîkê jî bêcîwar kirîye û ew qalibên modernîteyê wexta li gorî hûnermendekî nebe, hûnermend dixwaze xwe ji wê qadê bi rêya koçberîyê derîne derkeve derveyê wê qadê. Di vir de dîyar dibe ku serleheng Dara bi helwestekî hedonîst ji bo zewq û estetîka li gorî qalibên xwe bi dest bixe û li dor qalibên xwe hûnera xwe îcra bike dixwaze koç bike. Armanca vê koçê û sedemên koçê jî bêcîwarbûna estetîkê ye.

Yek ji balkêştirîn analîzên Deleuze yên li ser bêcîwarîyê ev e ku Deleuzeyî, bêcîwarî li ser semîyolojîyê jî nîrxandîye. Yanî li gorî şanîdanîyên nesneyan, û teşeyên bedenê ve jî çend analîz û nîrxandin kirine. Yanî bêcîwarî bi tenê aksîyom, derûnî û tevgerê ve girêdayî nîne. Di vê deqê de em ê metafora “serê çimadî” û “serê bilind” bînin ziman. Divê em van peyvan wateya wan ya yekemîn de teheyyûl biken. Deleuze û Guattari (2015) di xebata xwe de, li ser pirtûka Franz Kafkayî *Veguhezîne*, di dorhêla “serê çimandî” û “serê bilind” de bêcîwarîyê weha tînin ziman: “serê çimandî, tê vê wateyê, tiştê ku ket li arezuya wê hatiye xistin, hatiye bêbandorkirin an jî di asta herî biçûk de bîranîna zaroktîyê ye; bicîwarî ye an jî ji nû ve bicîwarîbûn e. Serê bilind jî ev e ku arezuya bo revê û peywendîyên nû re xwe rast dike, bloqa zaroktîyê te an jî bêcîwarî ye”.(Deleuze û Guattari, 2015:22,23). Deleuze û Guattari eve analîz li ser portreyên *Veguhezîne* yên Kafkayî ku hûnandina romanê de şayesandine kirine. Yanî tişteke ku hilberîneka mirovan dibe şopên bêcîwarîyê tê de hebe. Jixwe ev xebata me jî dê bo vê gotina me bibe palpişteke. Lewra em di nav berheman de şopên bêcîwarîyê vedikolin. Û ji derûnî, helwest û daxwazên karakteran de hêmanên bêcîwarîyê digerin. Di romanê de pasajek heye ku ji bo van daneyên me dê bibe mînakê baş. Nivîskarî, kokteylekî ku Dara beşdarbûyê û li wir çend cure insan hene, ev yek weha anîye ziman.

Min berê xwe da madalya ser singa wî û bédeng bûm; min fêhm kir ku ew rasîst e. Min tiştêkî din negot. Li cihê xwe, westîyayî û bêhêz, li ser kursîyê runiştim.

Ode bi dûmanê tijî bûbû. Min hest bi serêşîyekê dikir. Ji nişka ve min kurtepiska keçekê bihîst, ku ji odeya li teniştê bixêrikê dihat. Bizdîyam, lê min nedikarî serê xwe bilind bikim û li korîdorê binêrim. Digel serêş û bêhêzîya seranserê laşê min, min hest bi dilguvaştinê dikir. Min dixwest derkevim derve hinek hewayê sazkar bimijim. Diramîyam: “Niha, her ku Venûs, bê nav salonê, yek ser jê ra pêşnîyar dikim ger, ger bixwaze, em ê jî herin derve û vê qerebalixîya bi dûman li pey xwe bihêlin.(r.84)

Di vir de, eger em li ser metafora serê çimandî û serê bilind de rawestin em ê bikarin bibêjin ku Ferhad di wê kokteylê de ji mekanê ra, ji mirovan ra, ji ambîansa hindir ra bicîwar e. Di pasajê de li hemberî mirovekî faşîst ra serê xwe diçemîne û faşîstîya wê zîlamî qebûl dike yanî ti franksîyon û bertekekî li hember vê sekna faşîzan nade û xwe bicîwar dike. Yanî faşîstîya zîlamî dipejirîne û xeta xwe de sabît disekine. Lê ji aliyê din ve xwe ji eşqa Venusê ra bi metafora serê bilind ve bêcîwar dike. Ger Venus qebul bike dê bi gel wê ji wî mekanî debikeve. Aksîyomekî ber bi der ve xêz dike û bi vê hawî jî bêcîwar dibe.

2.6. Ekan.

“Ev roman, Tîrmeha sala 2005an de li Hewlêrê hatîye nivîsîn. Di heman mehê de li Hewlêr, Helebçe, Kellar, û Silêmanî, di meha Îlonê de jî li Ranyê û Çwarqurneyê hatîye xwendin”(Pirbal, 2015b:9). Roman, bi wergêrîya Çetoyê Zedo û Eyup Subaşi, di sala 2015an de li Stenbolê ji aliyê Weşanên Avestayê hatîye çapkirin. Roman, tevî soranîya xwe ji 75 rûpelan pêk hatîye û di vê çapa romanê de xeletîyekî çapî heye e ku destpêka romanê ji orta kitêbê dest pê dike.

Roman bi vebêjêrîya Ferhadê biçûk, behsa Reîs Remezanekî dest pêdike ku ev Reîs Remezan li gorî hinkesan xwedî cinan e, li gorî hin kesan, ji wî çend hebên din jî hene ku bi vê taybetîya xwe di heman katî de dikare li çend cihan çend tiştên cuda cuda bike. Ferhadê biçûk her ku mezin û firatir dibe Reîs Remezan jî diguhere. Di romanê bi rêya çend karakteran gelek bûyerên ku Reîs Remezan tê de derbas bûye hatine vegotin. Reîs Remezan, hem baxçeyê de bi gel mêrekî diaxive û heman demê de jî bigel jina wî mêrikî dikare biaxive. Lê em di romanê rasterast li rastê Reîs Remezanî nayên, timî tim Reîs Remezanî tête vegotin û rêzebûyerên romanê li ser bûyerên Reîs Remezanî hatîye vehûnandin.

Reîs Remezan bi vê taybetîyê ve bi me romanekî alegorîk e. Lewra Reîs Remazan karakterek e ku tu carê di romanê de wek takekesekî an jî wek tişteki din nayê ber me. Her tim bi taybetîyên xwe yên wek zigurtîyê, yên meletîyê, yên

pedofilîyê hewd tê ber me. Bi vê rê jî nivîskar dixwaze di şexsê Reîs Remezan de tişteke din ji me ra vebêje bala me ji Reîs Remezanî wêdetir bikêşe li ser fonksîyonên wî. Li gorî Fatma Jale Çoruk (2014) Alegorî: “celebek hunera anîmasyonê ye ku tiştê xwestin were gotin çetir di bîrê de bimîne. Di vegotinên weha de, nivîskar lehengan wek tiştên sembolîk nîşan dide. Ramanên siyâsî, felsefî, di an jî exlaqî bi rêya sembolan pêşkêşî xwendevanan dikin.” (Turna, 2020:44). Reîs Remezan di romanê de belkî karakterek e lê belê armanca nivîskarî jî bi me li ser vê karakterê vegotina tiştêkî din e. Em ê vê armanca di bin binên pêşîya me de bi teferûat binin zimên.

2.6.1. Di Romanê de Şopên Bêcîwarîyê.

Ev romana Ferhad Pîrbal ji ber ku romanekî alegorîk e, fikrekî veşartî û li gorî herkesê guherbar tê de heye. Ferhad Pîrbal li ser karakterê Reîs Remezanî de xwestîye çi bîne ziman? Wexta em taybetîyên Reîs Remezanî, ji rêze ve, bi vegotinên karakterên romanê yên din dixwînin em hêdî hêdî derheqê Reîs Remezanî de tiştêkî teheyûl dikin. Yekemîn vegotina taybetîya Reîs Remezanî di pirtûkê de weha ye.

Reîs Remezan gelek caran li mala xwe rûdinişt û Reîs Remezanekî din dişande ser îşê polîsxaneyê; yan jî hin êvaran, dema ku pir diwestîya, ew bi xwe diçû hemama kêleka mala xwe û Reîs Remezanekî din dişande bazarê, ji bo ku pilênzîya wî, çê bike û vegere malê şivê ji bo wî germ bike; di heman katê de, Reîs Remezanekî din dişande jî dişande ser mezelan, ji bo ku biçe ser gîyanê dê û bavê wî yên rehmetî fatîhayekî bixwîne, ku wî digot her du di dema şer û cenga taxa Seydaweyê da bi hev re bi destên be'sên talankar hatibûn şehîdkirin. Di heman katê de jî Reîs Remezanê sêyemîn, dişande cem Cemal Sêwanê Pereçî ji bo ku rûberên balifên wî bidirû û cil û bergên wî ûtî bike. (r. 10).

Di vê vegotinê de em dibînin ku Reîs Remezan di bergeha zarokekî biçûk de weha hatîye vegotin. Yanî Reîs Remezan li gorî vê pasajê mirovekî xwedî sêr e û di heman demê li cihên cihê de dikare çend karan pêk bîne. Ev pasaj yekemîn portreya taybetîyên Reîs Remezan e. Di cihekê din de Reîs Remezan ji çavê, ji çavê Mam Kerîmê Zîndirû, û Dade Bedokeyê weha hatîye vegotin:

Îca ji hemû tiştî xweştir, jina Mam Kerîmê Zîndirû digot: Dema Ez ghiştim mala xwe û min bûyer ji mêrê xwe Kerîm re vegot, Kerîm ji min re got: Keçê tu dîn bûyî? Wî ji min bawer nedikir. Kerîm digot: Min teze li ser vê kolana ber mala me Reîs Remezan dît ku xortekî nozdeh salî bi direkekî ve girêdabû û bi dar ketibû ser wî. Dade Bedokeyê digot; Kerîm ji min Bawer nedikir.

- Mafdar bû ku jê bawer neke.

- Belê.

- Yanê di çirkekê de sê Reîs Remezan Karê xwe kirine!

- Belê Mam Kerîm sond dixwar û digot, bi heman kêlikê de ku jina min du Reîs Remezan, di du haletên cîyewaz de dîtibûn.(r. 28).

Di vê vegotina Mam Kerîmî de jî Ekan bi awayekî efsûnî karekê din dike ku ew jî li gencekî dixwe. Yanî Ekan, di çavê zarokê de cûda ye û di çavê mezinekî de cûda ye. Ekanê Ferhadê Zarok û Ekanê Mam Kerîmê mezin xwedan heman taybetîyê alegorîk e lê heman fonksîyonê nabînin. Ji ber vê jî Ekan yan fikrek e yan jî sazîyek e ku di di bergeha herkesê de cûda ye. Belê nivîskarî di bergehên mirovên cihêreng de nêzikê Ekan bûye û li gorî wan portreyekî taybetîyên Ekan daye ber me lê ya muhîm portreya Ekanê di bergeha wî bi xwe de ye. Nivîskar û Serleheng bi gel proseya mezinbûna xwe, proseya guherîn û fonksîyonên Ekanî jî weha vedibêje.

“Bi mezinbûna min re, Reîs Remezan jî gewrtir û bi samtir dibû, navdarti dibû, jimareya wî pirtir dibû. Bi tenê wê wexta ku ez gihîştîm pola pêncêma amadeyî, jimareya Reîs Remezan li şarê Hewlêrê, digotin, gihîştîye bîst û heft Reîs Remezan... Dihat li gel bavan li heman sifreyê rûdinişt û nanê xwe dixwar.

Reis Remezan gihîştibû nav mizgeftan jî, diçû nav mizgeftan xutbeya îne dida; li ser navê xwedê û dîn, ji bilindgoya xudbeyan ve xelk jî berêvkê ve li xwe dicivand, fitwe derdixist. Bi navê tevsîra quranê bi arezuya xwe, çi tiştê ku wî jê hez dikir; çi tawan û gunehêke ku wî jê hez nedikira, heram dikir; çi tawan û gunehêke ku wî jê hez dikir jî ew helal dikir.”(Pirbal, 2015b:49)

Me heya niha xwest çarçoveya alegorîkirina Ekan bigehîne skrutkurekî. Bi vê jî me çend taybetî û fonksîyonên Ekan di çend bergehên mirovên cihêreng de anî ber we . Di vir de em alegorîkirina Ekan bigehîne nasnameyekî diyar, dê cih de be. Li Gorî Deleuze û Guattarî “Pirjimarîyên bi awayekî domdar tevdigerin, ji alê dewlet û sermayê ve nayêne zeptkirin.” (Guattari û Deleuze, 1990:25). Di vir de ji pirjimarîyan qest, rhîzom in. Eger em peywendîyekî di navbera van pirjimarîyan û karakterên xwe daynîn em dikarin bibêjin ku: Ferhadê zarok, Mam Kerîmê mezin, Bavê Ferhad û karakterên din rhîzom in ku dixwazin toreke pirjimarîyê çêken. Lê di vir de Ekan heye ku bi hemû taybetî fonksîyonên xwe tam li gorî amraza girtinê ye ya ku Deleuzeyî pênaseya we kirîye. Ekan dewled bixwe ye. Bi kar û kirinên xwe, dixwaze civakê bicîwar bike. Yanî qada wan girûzî bike wan bêxe bin kontrola xwe û bi yekê jî bikare wan îdare bike da ku ji bo wî venegerine makîneyekî şerî. Yanê di romanê de hewlekî bicîwarkirinê heye. Bi vê jî tê mebest kirin ku qadên tevgerên rhîzoman bihêne astengkirin. Bi gotinekî din em dikarin bibêjin ku Ekan ku temsîliyeta dewletê û otorîteyê dike

dixwaze organên nû li bedenên civakê zêde bike û wan bedenên jî bike makîneyekê xwe. Lê tişta balkêş di vê romanê de li hemberî vê hewla bicîwarîyê ti tevgerê dijber nîne hêj şixulîna otorîteyê bi qedeme qedeme ji takekesan ber bi malbatê û ji wir jî ber bi civakê tê vegotin. Di romanê de şixulîna otorîteyê ji takekesan ber bi malbatê ve ye. “Nesretê Zerîngir, ku carekê guhê min lê bû digot: Zarokên min li malê ewçend ji min dipirsin dibêjin min: Reîs Remezan”. (Pirbal, 2015b:63) Di malbatê de bicîwarkirina otorîteyê weha hatîye vegotin. Lê balkêş e ku nivîskarî ev bicîwarbûna otorîteyê bi tenê li ser mêran anîye ziman.

Di vê berhemê da, em îddia dikin ku hêmana bicîwarkirina otorîteyê serdest e lê divê neyê jibîrkin cihê ku bi tadeyê bicîwarkirin hebe teqez li wir bêtîwarî jî dê hebe. Pekî Ferhad Pîrbal, di vê berhema xwe de ku bicîwarbûna otorîteyê anîye ziman lê ev otorîte li şûna çi bicîwarkiriye? Yani eger em di çarçoveyekî şênber da bifikirin ku otorîte cihê tiştekî digire û wê tiştî jî bêtîwar dike. Di pasajên me dayî de dîyar dibûn ku Ferhad Pîrbal di şexsê Ekan de bi awayekî alegorîk taybetî fonksîyên dewletê dianî ziman. Lewra Ekan carna dibû hêzekî dewletê yê parastinê, caran dibû îdeolojîya dewletê ya dînî û fermî, caran dibû sîxurek, caran jî dibû jopek û li ciwanan dixist. Yanî dewlet xwe bi rêya Ekan bicîwar dike lê di heman dema de jî, cimeata dînî, gencên ku lê dixist, hûnermendên ku li kolanan distirîyan û hûnera wan bêtîwar dikir. Yanî Ekan mekanîzmayekî hêzê, konsolidê û tundîyê bû ku torên civakê yê têkilî, civakî, dînî hwd teşe didayê. Yanî azadî û hilberandin bi rêya bicîwarbûna Ekan ve di hate bêtîwar kirin. Ev yek jî jixwe weha hatîye vegêran:

Her cara ku qiseyên bavê min diharine bîra min, wî digot:

- Reîs Remezan hez nake ku tu kes cîyewaz bifikire.

Ez zarok bûm, min digot çawa?

Digot: Kurê min, Reîs Remezan ku têkeve gîyan û cestyê kê, êdî wî kesî dike koleyê xwe û her wiha dixwaze hemû kesên din bibin koleyên wî.

Carekê jî min ji bavê xwe pirsî:

- Baş e bavo, Reîs Remezan welî ye yan cinên wî hene?

- Kurê min çi gava ku kesekî qebûl kir bi cîyewazî nefikire, çi wexta ku kesek razî bû, ku azad nejî û azadane nefikire, ew dibin zafera Reîs Remezan ku wab dike yê weke xwe. (Pirbal, 2015b: 77)

Di vir de dîyar dibe ku Reîs Remezan amrazekê teşedayînê ye ku astengê belavbûna mirovan dibe. Naxwaze mirov û civak xudan fikrên cihereng bibin û

cihê bifikirin bi van jî em dikarin Reîs Remezanî wek amraza dewletê binirxînin ku cihê mirovan bi hêzên xwe yên wek polês, cerdewan, sazîyan û bedenên xudan organên dewletê ve girûzî dike û wan mîna çivîkên di qefesan de heps dike. Yanê hewl dide civakekê yek tîp û yek deng û yek reng derîne eger civaka ku armanc dike bikare biafirîne dê Reîs Remezanek li Reîs Remezanekî din zêde bibe. Yanî dê heyîna xwe ya totalîter û rasîst bikare berdewam bike.

2.7. Heft Wêney Rûtî Jînî Cenabî Wezîr.

Ev romana ku Ferhad Pîrbal sala 2010an de bi zaraveya soranî nivîsandî, bi wergêrîya Çetoyê Zedo ve sala 2014an de ji Weşanên Avestayê li Stembolê derçûye. Roman, tevî wêneyên nivîskarî ji 91 rûpelan pêk hatîye. Di vê romanê de jî wekî *Hotel Europyê* serleheng û vebêjer Ferhad e. Bi me di vê romanê de jî nivîskarî xwe xistîye navenda bûyeran û ji ber vê jî em dikarin bibêjin roman, romanekî otofiksîyonel e.

Serlehengê Romanê Ferhadî wênekêş, Kurdekî li Moskowa Rûsîyayê xwendekarekî doktorayê ye. Ebû Ubeydî Xeddâm bi eslê xwe Siûdî, serokê rêxistineke Mafê Jinan e. Xeddâm tevî hevalên xwe, bêyî haja hev heman xewnê dibînin. Di xewna xwe de, bajarekî xweş ku tije mexaze, hotel û meyhaneyên cihehêreng û li kêleka çem rîz kirine dîtine. Di heman demê de jineke diran zirav, çav kesk û por medûsayî ji di xewna xwe de dîtine û her heft jî dil ketine vê jînê. Bi gotina Ebu Ubeyde, ev heft heval ketine pey xewna xwe ku di rastiya de jî pêk bînin. Erka bidestxistina jina diran zirav, çav kesk û por medûsayî bûye peywira Ebu Ubeyde. Ebu Ubeyde ji bo vê keçê dihête Rûsîyayê û hevaltîya Ferhad û Ubeyde li vir dest pêdike.

Ebu Ubeyde ji bo wergêrî û rêberîya xwe, bi peretî, ji Ferhadî ra daxwazê dike û Ferhad jî vê teklîfa Ubeydî qebûl dike. Piştî vê peymanê Ferhad û Ubeydî, hemû bar û restorant û klabên Moskowê digerin ji bo dîtina wê keçê. Di maweyna lêgerîna keça pormedusayî de her dawîyên şevan de bi jinan re têkevîne têkiliyên cînsî û bi vê awayî jî rojên xwe diqedînin.

Ferhad wexta li Bêrûdê bûye têkiliya wî bi jineka navê Kelsûm ra çêbûye. Kelsûm yek ji jinên wezîrekê dewletên kendavê ye. Ev têkiliya navbera Kelsûm û

Ferhad de çêbûyî jî ji têkilîyekê cinsî wêdetir nebûye. Di wê maweynê de jî Ferhad wêneyên tazî yên jina wezîr, Kelsûmê, digire. Ferhad piştî ji Bêrûdê vedigere diçe Moskowê li wir aşiqê keçeka bi navê Margirette dibe.

Piştî demeke şûn de Ebu Ubêde dixwaze hevala Ferhad, Margiretteyê, nas bike û li Moskowê pêşengehekî wêneyên jinên ereban vedike û Ferhad Margiretteyê gazî pêşengehê dike. Tabloyên Ebu Ubêde bala Margiretteyê dikêşe û hema dike têkilîyekê di navbera Ubêde û Margiretteyê veke. Ferhad jî vê yekê aciz dibe û ji Ubê de ra dibêje da ku ji Margirêttê dûr be. Ubêdî di vir de teklîfekî ji Ferhad dike. Dibê ger ew wêneyên Kelsûmê yên tazî bidetê dê ew jî ji van deran biçe. Lewra Ubêde, cenabê wezîr bixwe bû. Ji bo bidestxistina wêneyên Kelsûme heta Moskowê li pey Ferhad hatibû.

2.7.1. Di Romanê de Şopên Bêcîwarîyê.

Di romanê de, hêmanên bêcîwarîyê, li ser têkilîyên cinsel û li ser mişextîyê xwe dide der. Lewra Ferhad ji welatê xwe dûr e û li derveyê welatê xwe dixwaze xetên xwe yên pêşerojê biafirîne. Di destpêkê da, bi terza realîzma efsûnî xewnên her heft dewlemendan tê vegêran û ev her heft heval ji bo çêkirina xewnên xwe peymanê li hev didanin û her yek ji bo erka xwe dirdikeve belavê dereke dibe. Di vir de em dikarin vê yekê li ser bêcîwarkirina arezuyê şîrove biken. Lewra Ebu Ubêde û her şeş hevalên wî ji bo arezuyan ji welat derdikevin û dixwazin arezuyên xwe bînin ziman. Di romanê de ev yek weha hatîye vegotin.

“Ebû Ubeydeyî Xeddâm, bi eslê xwe Siûdî, Serokê Rêxistineke Mafê Jinan Li Dubey, di heman demê de li bajarê Şarîqa xwedî kovereke jinên Welatê Kendav; tevî şeş hevalên xwe, heft kesan bi hev ra heman xewn dîtibûn...

Di xewnê de bajarekî spehî dîtibûn. Bajarekî bi bircên bilind, tije mexaze, hotel û meyxaneyên cihêreng li kêleka çem rêzkirî, şilavên bajêr ew qas dilbijok bûn ku hênikiya wan bihûşt dianî bîra mirov. Ser û berên bajarê bilind, bi, teleferîkan pev hatibûn girêdan, ji raserî temaşekirina jêr; kemberên pirênli ser derya, vapûr, qaqlîbaz, û tije keç û xortên turîst... hemû keçên vî şarî, tenê wan dikarîbû weke gurgîyên ferîşte, li bihûştê Baxên Babilê xizmeta şerabê berpêş bikin.

Ebû Ubeydeyî Xeddâm û şeş hevalên wî, bêtî ku bi hev dû zanibin, heman xewn dîtine, her yekî jî ê din re qala vê xewnê kiribû. Qala vêya jî kiribûn ku çawa hemûyanheman keçika diranzirav, çavkesk, pormedûsayî: ku tu keçek bi bedewîya xwe qet nikae nêzê wê bibe dîtibûn; qala vêya jî kiribûn bê çawa vê keçika diranzirav û çavkesk û pormedûsayî herf heft mêtî bi sermestî kiribû dilketîyê xwe.” (Pîrbal, 2014:11)

Di vir de tê dîtin ku ev her heft heval di yek xewnên xwe de heman tiştê dibînin û ev xewna van her heft dewlemend û sermezînan ji bilî arezuyê wêdetir

tiştekan nîne. Lewra wexta em naveroka xewnan van dinihêrin dîyar dibe ku xewna wan li ser teşeyê bajarekî û li ser jinekê ye. Arezuya wan bi gel dewlemendîya wan, li ser çêkirina bajarekî û li ser taybetîyên fîzîkî yê jinekê ye. Ev her heft heval piştî ku xewnê xwe ji hev ra dibêjin biryarê diden ku vê xewnê pêk bînin. Em dikarin bibêjin ku ji bo arezuya xwe pêkbînin xwe bêcîwar diken lê tiştê vê ji yekê balkêştir ev e ku metafora “hejmara heftê”. Em armanc naken bikevine li pey semîyolojiya folklorîk û efsûnî ya hejmara heftê. Bi me di vê romanê de navbera du bûyeran de hejmara heftê fonksîyonekî girîng pêk tîne. Ev fonksîyon jî, navbera Heft Wêney Rûtî Jînî Cenabî Wezîr û xewna her heft hevalan de veşartîye. Ferhad wexta lî Bêrûdê bi jina wezîr ra dikeve têkilîyekê cînsel û şevê heft wêneyên jina wezîr dikêşe. Di romanê de vê yekê weha tîne ziman. “Ez wê şevê swerxweş çûbûm, min heft wêneyên xwe û wê bi rûtî kişandibûn”. (Pîrbal, 2014:44). Heft wêne di destê Ferhadî de heft peywîrên di navbera heft hevalan de hatîye dabeşkirin. Bi me ji peywîra her yekî ji heftan de temsîliyeta wêneyekî dike. Lewra wêneyên jina wezîr bêcîwar in di bin kontrola wan de nîne. Wêne koçber in, digerin, ji qada tehakûma wan de nîne lê her yek heval ji bo her yek wêneyê jina wezîr, cihekê vediken û li pey wan wêneyan digerin. Tiştê di vir de bêcîwar wêneyên rût yên Kelsûmê ne. Û mîrê Kelsûmê jî temsîliyeta otorîteyê dike. Yanî tiştê koçber, -wêne- di paşla Ferhad de mekanekî hilû de her gav dibe ku vegere makîneyekê şerî û dawîya wezîr bîne. Wezîr bi xwe jî bi gel li pey ketine wêneyên jina xwe amraza girtinê ye. her heft hevalên wezîrî jî amrazên wezîrî yên kontrolkerîyê ne wek polês, cerdewan, girtîgeh. Wezîr li pey ketina wan wêneyên bêcîwar, dixwaze wan wêneyan bicîwar bike û koçberîya wêneyan xilas bike yanî wan wêneyan di mekanekî de, cihekî de girûzî û bêbandor bike. Jixwe di dawîyê de jî vê yekê pêk tîne.

Di romanê yek ji hêmanakê bêcîwarîyê heye ku em dikarin vê yekê li ser têkilîyên cînselîyê û li ser hesta tolhildan û tundîyê vegêrînin. Lewra serlehengê romanê Ferhad, jinbaz, cînsîst hetta rasîstekî kurd e û sond xwarîyê ku ji xeynî jinên tirk, fars, û taybetî ereb têkilî bi jinên qewmekî din nebe. “Min sond xwaribû, şîrê dayika min li min ne helal be, ku ez xeynî tirk, faris, bi taybetî jina ereb zinê li gel jinên qewmekî din bikim”. (Pîrbal, 2014:43). Di vir de li ser vê gotina Ferhad helwesta wî û nêzîkbûna wî ya bo jinan dibe. “Di nav teorîya psîkanalîzê de, êrişkarî jî bi qasê têkilîyên cînsel, di veguhezîna saîqan de cihekê

giring digire”(Aliçavuşoğlu, 2012:15). Lê di vir de em dibînin ku Ferhad bi rêya saîqa êrîşkarîyê, têkilîyên xwe sînordar dike û bi vê rê jî têkilîyên xwe yên cînsîstî ne bi rêya saiqên xwe, bi rêya hestên xwe yên nefret û tolhildanê çêdike. Yanî Ferhad Kurdek e û welatê wî ji hêla wan qewmên ku digot hatîye dagirkirin her weha xudan nefretekê ye ji van dijminên xwe ra û dixwaze bi rêya cînsîstîyê hesta xwe ya tolhildanê û nefreta xwe li hemberî dijminên xwe, di kesayetîya jinên qewmên ku ji xwe ra wek dijmin dibîne biderîne. Yanî arezuya wê ya tolhildan û nefretê di dilê wî de bicîwar e û birêya cînsîstîyê jî wê arezuyê bêcîwar dike. Heyfa xwe bi rêya tundîya cînsîstîyê hildigire. Di vir de jî em dibînin ku bêcîwarîya Deleuzeyî li bigel psîkanalîza Lacanî re hesabekê dibîne. Lewra li gorî teorîya psîkanalîza Lacanî, cînsîstî psîşeyek e ku di serdemên zaroktîyê de dest pê dike û li gorî vê teorîyê geşedana cînsîstî di her insanî de li gorî rêzîknameyekî dîyar pêş dikeve di serdemên kahîlî de ev yek çênabe. Lê em dibînin ku hestên Ferhad vê teorîyê dihejîne di serdemên kahîlî de saiqên wî yên cînsîstî li gorî hestên wî yên tolhildan û nefretê vediguheze.

Di romanê de gelek xetên bêcîwarîyê hene lê ev xetana jî wekî xetên romanên berê me nîrxandibûn di heman paralelê de ne ji ber vê jî ji bo em nekevîne tekrarê em wan li vir nanivîsin. Lê em dikarin bikarin bibêjin ku ev xetên bêcîwarîyê yên di vê romanê de derbaz dibin piranîn li dor hêla otorîte û fikra koçberîyê de çêdibin. Hêmana ji romanên din cihêtir li ser cînsîstîyê bû û me ew jî anî ziman.

2.8. Penaberek Fransî li Kurdistanê.

Ev berhema Ferhad Pîrbal bi navê xwe yê resen *Penahendeyekî Ferensî le Kurdîstan* da di sala 2007an de nivîsandî li Hewlêrê di sala 2010an de ji Dezgehên Arasê hatîye çapkirin û belavkirin. Di sala 2015an de li Stenbolê bi wergêrîya Idrîs Farqîn ji Weşanên Avestayê hatîye çapkirin(Pîrbal, 2015a). Berheme, wek senaryoyekî sînemayê hatîye weşandin lê hemû taybetîyên romanê jî di xwe de deihewîne û ji 84 rûpelan pêktê.

Christope rojnamenûsekî Ferensî ye, tam di wextê şer de ku hêzên Amerîkî hatine Kurdistanê, ji bo lêkolînekî, ku dixwaze bizanibe çima kurd berê xwe didene Ewropayê û daxwaza penabertîyê ji welatên Ewropî dikan, hatîye

Kurdistanê. Ji xelet têgehiştinekî hêzên asayîşa Kurdistanê dikevine li pey Christophe. Wexta Christohe ji hêzên asayîşê direve xwe dispêre mala Şehrazadê û li wir tête girtin. Piştî xeletîyê têgehiştinê, asayîs û rêveberîya Kurdistanê ji Christopheyî lêborînê dixwazin û wî serbest dihêlin. Şehrazad keçeka kurd e û li demekê li Parîsê jîyaye û ji bo karên Christopeyî baş pêk bê daxwaza wergervanîyê ji Şehrazadê ra diken. Şehrazad demekî kurt ji Christopheyî ra wergêrî û rêberîyê dike lê birayê Şehrazadê piştî vê dihesa nahêle Şehrazad dewam bike.

Şehrazad bi awayekî sêhrî pêşbînîya him tiştan dike û rast jî derdikeve. Şehrazad bi vê pêşbînîyên xwe çend caran tête xewnê Christopheyî û wî çend caran ji mirinê xilas dike. Christopheyî va xewnên xwe û pêşbînîyên Şehrazadê ji hevalên xwe yê konsulxanya Ferensyê de bi hev ra dixebitin dibêje û ew hevalên Christopheyî wî bi sîxurîyê ve tewanbar diken. Piştî Şehrazad dev ji karê wergêrîyê berdide li Hewlêrê kuaforêkî vedike û têkilîya wê bi awayekî maddî ji Christopheyî vediqete lê bi gel pêşbînîyên xwe têtê xewnên Christopheyî. Christopheyî jî bi gel wergêr û rêberê xwe yê nû Rêbiwar re hem li Kurdistanê kar û xebatên xwe diken hem jî li Şehrazadê digerin.

Ji aliyekê din ve jî Qaleqoz cotkarekî kurd e û ji ber ku li Kurdistanê şer heye leşkerên Amerîkî, operasyonên leşkerî dikin. Di maweynekî yek ji van operasyonên leşkerî de jineka serbazê Amerîkî bi pareşûtê ve xeletî dikeve nav hembêza Qaleqozî û Qaleqoz wisa bawer dike ku Xwedê ev jina Amerîkî ji wî ra şandîye. Lê wan çaxan erdnîgarîya Kurdistanê, wek kurteya erdnîgarîya rojhilatanavîn bi aloz û tevlîhev e. Di heman demê hizbên islamî tînin jî jî bi darê zorê ji Qaleqozî direvînin. Qaleqoz jî ji bo jina serbaz a Amerîkî ji destê wan xilas bike, dikeve pey hizbên islamî.

Roman, di navbera du bûyerên serekê de gelek bûyerên din î kurt û girîng di xwe da vedihewîne û ji ber vê jî em dikarin bibêjin ku ev berheme bi şêwazekî post-modern ve hatiye hûnandin. Ferhad Pîrbal bi vê romana xwe xwîneran di navbera çûnûhata du bûyeran derdixîne rêwîteyekê nava şerê Amerîka û Îraqê û di vê rêwîtiya şerî da gelek pîrsgirek û çarenûsên penabertî û penahendîyê vedibêje.

2.8.1. Di Romanê Şopên Bêcîwarîyê.

Penaberekî Fransî li Kurdistanê, her çiqas di çarçoveya Deleuze û Guattarî de hêmanên bêcîwarîyê ew qas zêde di xwe de nehewandibe jî ji aliyê penabertî, penaxwazî, penahendîyê ve hêmanên girîng û deqên zelal vedigêre. Jixwe roman jî bi mebesta vekolandinê penabertîyê û penaxwazîyê weha despê dike:

“Christophe henaseyên bi lez dide. Paşî têdigehe ku Şehrazad dixwaze wî aram bike. Christophe û Şehrazad temaşe hevdû diken Christophe li beramberîya ciwanîya sihrewî ya Şehrazad şaş û mat bûye. Christophe ji Şehrazad dilnîya bûye ku pêwîst nake bitirse.

Dengê zarokên, ku li kolanê yariya saspsapanê diki tê.

Christophe:

They are every where.⁷

Şehrazad:

Hmm...

Christophe:

In Turkey, in Iran, in Syria, in Egypt, in Afghanistan... everywhere⁸

Şehrazad:

Not in Europe? Not in America.⁹

Christophe:

You mean the terrorists?¹⁰

Şehrazad:

Yes, the terrorists.¹¹(Pirbal, 2015a:8).

Di vê diyaloga navbera Christophe û Şehrazadê de diyar dibe ku erdnîgarîya ku tirs tê de hebe dê rev û ji wê erdnîgarîyê jî derketin hebe. Lewra Christophe hêzên asayîşê wek terorîstan dibîne û ji wan direve. Yanî tirsê hesta ewlehîya can û tendûrîstîyê xistîye nava dilê Christopheyî û ji ber vê jî ji wan direve. Jixwe destpêka rêya penabertîyê ku me berê jî gotibû bi revê dest pê dike û bi bêcîwarî û mişextîyê berdewam dike. Christopheyî ji reva xwe wek berteka tirsê pêk tîne û dixwaze ji destê hêzên asayîşê bêcîwar be û xwe ji destê wan xilsa bike.

⁷ Ew li her derê ne.

⁸ Li Tirkîyê, li Iranê, li Sûrîyê, li Misirê, li Efxanîstan.. li herderê ne .

⁹ Ne Ewropa û ne Amrîka?

¹⁰ Mebesta te ji terorîstan e?

¹¹ Belê, terorîstan e.

Bi me eger tevgerên penaberan baş bihêne xwendin dê analîza li ser vê xwendinê jî xwe bigehînte çarçoveyekê bêcîwarîya Deleuzyenî. Lewra têgeha penabertîyê parastina ku dewletek li hemberî dewleteke bîyanî dide hemwelatîyê wê dewletê yên ku ji ber azarê an gefên rijd revîyane. Belê rev an jî xetên revê xetên hebûnê ne. Takekeseke ku ji ber van sedeman bireve miheqeq ji bo xetên xwe yên hebûnê direve. Yanî dibe ku maf, ewlehî û jîyana takekeseke di bin zext û zordarîyê de be. Yanî em behsa kesekî bicîwar ku di nav pergalekî tund û totalîter de ye diken. Ev kes ji bo van zext û zordarîyan xilas bibe divê xwe ji pergala tundker û totalîter bêcîwar bike. Di vir de tevgerên penaberan xwe digehînit çarçoveya bêcîwarîya Deleuzeyî.

Di romanê de sedema hatina Christopheyî bo Kurdistanê di vê pasaja romanê de weha hatiye vegotin.

“Firoşkarek:

Penêrê tirkî, mastê, mastê îranê, hingivê siûdî, bacanê sor ê sûrî, birincê newzelandî, mirîşkê brezîlî... bi tek cumle. Me erzan kir!

Rêbiwar:

Kurdistan bi rastî bûye bazarek bo welatên cîran. Temaşe bike Christophe!

Christophe kamêra xwe pêdixê û dûmenan digire. Ji nişkê ve serê xwe dibe bin guhê Rêbiwar.

Rêbiwar:

Mam ev dema te baş.

Mamê dukandar:

Serçavan!

Rêbiwar:

Mam ev rojnamevanê frensî ye û dixwaze bizane ji ber çi kurd îro welatên xwe bicî dihêlin û diçin ewropa daxwaza penaberî dikin.

Mamê dukandar:

Belê!

Rêbiwar:

Ji te dipirse “hûn ji ber çi hingivê Siûdî gwîzê Tirkî difiroşin ku baştirîn hingiv û gwîz li welatê te heye?”

Mamê dukandar:

Vêca ev pirsyara te çi pêwendî bi babetê ve hey?

Rêbiwar:

Baş e xem nake. Dest ji vê berde. Ji te dipirse “hûn ji ber çi hingivê Siûdî, gwîzê Tirkî difiroşin ku baştirîn hingiv û gwîz li welatê we heye?”

Mamê dikandar:

Ji ber ku xelkê cotyar hemû hatine bajêr:

Rebiwar:

Çima hatine Bajêr?

Mamê dukanadar:

Eger li gundan nexweşxane nebe, pirtûkxane nebe, ceryan nebe, traktor nebe, xwendingeh ji bo zarokan nebe... erê tu jî bî serê xwe nagirî nayê bajêr? Baş e nabînî Hewlêr çend qerebalix bûye! Çi giranî ye peyda bûye!? Kirêya xaniyekî piçûk gihiştîye 500 dolar...(r. 34-35).

Di van diyalogan de piştî mebesta Christopheyî ya bo hatina kurdistanê tê vegêran. Çend agahîyên balkêş hene ku ewe jî bicîwarbûna sermayeyên welatên wek tirkî, surî, birêzil û siûdî. Bêcîwarî jî ber ku hêmanekê bi gel sermayeyê ve dişuxile em dixwazin vê yekê jî bînin ziman. Hilberînên aborî, cotyarîyê yên kurdistanê kêmtir bûne. Sermayeya welatên din li pîyaseya kurdistanê de jî xwe ra cih girtine. Evê yekê jî rê li ber lawazbûna bazara kurdistanê vekirîye. Yanî em li ser çi nêzîkê bêcîwarbûnê bibin mentiq û armanaca pêşîn ev e kudeqa lawazkirina kêmtirîyê de armanca xwe cihkirinê heye. Ji ber vê jî fikra bêcîwarîyê li hemberî van nêrînên despot û kolonyal reaksiyonekî serkeftî û encamdêr e.

ENCAM

Yekem tevgera bêciwarbûnê bi gel geşedana modernîteyê dest pê kiriye û ev tevgera yekem li ber bêciwarbûna takekesan bi tenê tevgerekî biçûk e. Lewra modernîte ji bo berdewama heyîna xwe û ji bo xurttir kirina hêza xwe takekesan sînordar dike û qadên wan ên hereketê tengav dike. Bi vê awayî jî wan ji azadiya wan dike. Takekes, ji bo ji bandora modernîteyê derkevin û ji qada kontrola modernîteyê xwe xilas bikin xwe bêciwar diikin. Qesta me ji otorîteyê, hemû celebên taakkûmker in. Ev celeb otorîte di malbatekî dibe ku bav be, di karxaneyekî de dibe ku hostayek be, di erdnîgarîyekî de dibe ku rejîmekî totalîter be. Mirov bi revê, yanî ji serwerîya van otorîteyan dikare xwe xilas bike û azadiya xwe bi dest bixin. Ev rev, têgeha Deleuze'yî bêciwarî bixwe ye. Yanî takekesi bi rêya bêciwarbûnê dikarin xwe ji otorîteyan razberînin û ji qada kontrola wan derkevin. Şerê navbera modernîteyê û takekesan, rê li ber çêbûna rîzoman vedike. Ev rîzomên ku Deleuze û Guattari behsê diken kesên tekîl in ku dikarin bi her awayî hereket biken bi vê awayî jî bi fikra koçberîyê nav valahîyekî înnîsyatîk de bi awayekî serserî û bi gel pirjimarîyên din dikarin peywendîyan daynîn. Wexta bi gel pirjimarîyên din jî peywendîyê didanin pirjimarîyekê tekîl çêdibe û ev avahî jî heyîna otorîteyêan di xwe de bêciwar diken.

Yek ji rêyên bêciwarbûnê “bedenên bê organ” têgehekî Deleuze û Guattari ye ku ji bo mirovên bêciwar hatîye darişandin. Li gorî wan modernîte wekî li ser her tiştê, li ser bedenên mirovan jî dişuxile. Ev organên em behsê diken ne organên xudan organîzmeyekî zindî ne. Bo mînak îro kiravatek organekî modernîteyê ye. An ku cilekî leşkerî dibe ku bibe organekî modernîteyê, merivekî çenteyê xwe pişt dike û heroj wekî makîneyekî diçe li ser kar; xwedî organên modernîteyê ne. Mirovên xwedî organên modernîteyê, di bin tehakûma modernîteyê de ne jî. Yanî ev mirov, mirovên azad nînin. Lewra bedenên me bi organ û amûrên modernîteyê ve hatine peçavtin. Deleuze, ji bo bi destxistina azadiya takekesî, li hemberî “bedenên bi organ” fikra “bedenên bê organ” avêtîye holê. Eger mirov xwe ji organên modernîteyê bişo û li hemberî wan organên modernîteyê bi tenê bi gel bedenên xwe xetên xwe yên revê pêk bînin dê bikaribin azad bibin.

Becîwarbûn ne bi tenê bi rêya arezuya takekesan çêdibe. Pirî caran ev prosesa azadker, bi destê otorîteyan jî bo takekesan tê bexşandin. Bo mînak mirovekî ku cihê lê dijî bizane ti ewlehîya can û fikrê wî nemaye an bi xwasteka xwe an jî bi darê zorê cihê lê mûkim e direve. Ev yek jî cureyekê bêcîwarîyê ye. Lewra ev yek jî cureyekî revê ye ji kontrola otorîteyê. Lê takekesekî ji welatê derketî li cihê xwe yê nû de heya xwe biafirne di kampên welatê mazuvan de wek penaber an jî penahend û koçber tê binavkirin. Takekesên penaber li kampên penabergehan de jî di bin nêrevanîya otorîteyê de dimînin. Lewra zîhnîyeta modern-dewletê li ser rêkûpekîyê xwe ava dike û rêkûpêkîyekî yek tîpî jî rê nade cihêrengîyê. Bi vê mebestê jî otorîteya ku me bi navê modern-dewletê binavkir qada tevgerên penaber û koçberan girûzî dike û bi vê awayî jî dibe astengê peywendî û têkilîyên rîzoman. Kampên penaberan ji ber van tîn çêkirin.

Yek jî têgeha Deleuze “makîneyên Şer”e ku ev têgehe ji bo koçberan hilberandîye. Koçber bi xwezayî ji kontrolê û ji otorîteyê hez nakin. Daîm bi awayekî tevgerî xwe li cihekî û li erdekî sabît nahêlin. Ji vê taybetîya wan jî em bêcîwarên esil û neguher in. Taybetîyekî din ê koçberan ev e ku biçine ku derê li wir bê kod dîkin, yanê bê yase û bê întîzam dîkin. Yanê cih û warê ku lê mûkim dibin ji otorîteyê û ji dewletê bêcîwar dîkin. Eger em gotinên xwe dene ber hev: Koçber, bi tevgerên xwe ne bi tenê xwe bêcîwar dîkin di heman demê de mekanî jî bêcîwar dîken.

Bêcîwarbûn, ji proseyekê hilberdar û azadbexş pêk tê. Em vê yekê gelek mînakên dîrokê de dibînin. Lewra mirovekî ji kokên xwe ji welatê xwe dûr bi zimanê xwe dikare xwe kokên xwe bibîne. Lewra ziman kokê mirovan e ku li ser şîn tî. Di vî warî de em dikarin bibêjin dahatûyên mişextî û penabertîyê çarçoveya hilberandîna edebî û hûnerî de tête ber takekesan. Lewra hema hema hemû berhemên serkeftî di mişextîyê de ji alîyê mirovên nefî ve hatine nivîsandin. Lewra nivîskarek çî qasê bi zimanê xwe binivîse ew qasê xwe ji êşa bêwelatîyê û bê warîyê dûr dike. Di mişextîyê de rolekî civakî yê nivîskar û rewşenbîrên nefî heye. Lewra rewşenbîr û nivîskar berpirsîyarê êşên civaka xwe ye. Li ku derê be divê ji wir nebe li hemberî otorîteyê qelema xwe xurt bike û binivîse. Bi terzekî Adornoyî divê li mala xwe de jî hest pê neke ku li mala xwe ye. Li ku derê be bila bibe divê bêcîwar be. Ji xwe ev taybetî ye mirovan dike rewşenbîr an ku nivîskar.

Deleuze, danasîna nivîskarekî weha dike: Nivîskarek wek nivîskar ne insaneke nivîskar e; miroveke politîk e, makîneyek e, miroveke ceribîye; ji ber vê jî kêzikbûn, meymûnbûn, kuçikbûn yanî heywanbûn an jî der-mirovbûn ji vê tê. Di romanên Ferhad Pîrbal de jî ev yek ji vê tê, penaberbûn, koçberbûn, caran meleyekî homoseksûel, caran penaberekî heşîşkêş hwd. Yanî Ferhad Pîrbal bi van karakterên xwe yên derasayî berteka jîyana yek-tîpî û homojen e. Xetên azadîyê di van karakteran de anîye ziman. Lewra tevgera kapîtalîzmê, bi gel bêtîwarkirina mirovan di heman demê d wan bi kod dike, kodên xwe li ser wan zeliqîne û wan dike metayek. Yanî mirovan ji mirovîyê derîne. Wan bigel kodên xwe binav dike.

Ferhad Pîrbal bi van karakteran yên ku homoseksûel, ressam, nivîskar, peykerçêker, leşker, rojnamevan, kuaför, werger, mele, akademîsyen hwd manîfestoya dijraberiya modern-dewletê vedibêje. Ferhad Pîrbal di wan romanên xwe de otorîte û statûkoya pergale bînpê kirîye û bêtîwar kirîye. Lewra dema me roman dixwendin nêrînekî dewletên Ewropayê hebû ku digot penaber her penaber e. Lê Pîrbal di berhemên xwe ev nêrîna serdest red kirîye. Anîye ziman ku nasnameyê wan penaberan heye, hest û ramanên wan heye, ji her tiştê wêdetir nasnameyê wan yê takekesî heye. Yanî bi van daneyan ve Pîrbal kodên modernîteyê nepejirandîye û ew karakter hemû bêtîwar kirine ku otorîte careke din nekare xwe bigehîne wan û kodên xwe li wan zeliqîne. Di van romanên de bi gel helwesta nivîskarî gelek şewazên xetên revê derketine ber me. Esilzanî nivîskar bi vê yekê xwestîye rîyekî li ber bêtîwarên otorîteyê veke û rêya xelasîyê bi vê awayî jî daye me.

Di berhemên Ferhad Pîrbal de li gorî Felsefeya Deleuzeyan de gelek şopên bêtîwarîyê derketine pêşîya me. Pîrbal qey ji van teorîyên bêtîwarîyê haydar bûye û berhemên xwe li dor van teorîyan de honandîye. Nemaze di *Hotel Europe* û *Santiago de Compestelo* de li dor teorîyên Deleuze hema hema hemû karakterên girîng li ber xetên bêtîwarbûnê de bûne.

Ger em, berhemên ku di peywenda bêtîwarîya Deleuzeyî de nirxandî nêze wan bin em ê nekaribin wan berhemên di çarçoveyeka edebîyata mînor de bêxne skrukturekî. Her çiqas wexta em li edebîyata mînor û berhemên Ferhad Pîrbal binihêrin em şopên yek ji taybetîyên edebîyata mînorî ya politîkbûna kirdeyê û nasnameya kollektîvî bibînin jî. Ferhad Pîrbal di van berhemên xwe de her tiştê

karîye veguhezîne tiştên polîtîk. Ji ber vê jî kirdeyên romanên de derbaz dibûn hem ji aliyê nasnameyên xwe ve hem jî bi helwest û seknên xwe ve karakterên polîtîk bûn. Ji aliyekî din ve, ji ber ku berheman de heman tişt û heman temayên wek penaberî û danberheva jîyana rojhilat û ya rojava hebû karakterên romanê de xudan nasnameyeka kollektîv bûn jî ev her du taybetîyên edebîyata mînor di wan berhemên me vekolandi de hebin jî divê neyê ji bîr kirin ku edebîyat bi rêya zimên tê çêkirin û berhem bi kîjan zimanî ve hatibe nivisandin; ew berhem dibe malê wê neteweyê.

Ferhad Pîrbal, romanên xwe bi xwerû zimanê xwe yê dayikê û netewî nivîsandîye. Wexta me li romanên Pîrbalî xwendin me ji bilî çend têbînî û pêdivîyên li dor hêla honandina romanên de zimanekî bîyanî nedît. Jixwe, ji bo ku em bikaribin wan berheman di çarçoveyekî edebîyata mînor de bidene rûniştandin divîya bû Ferhad Pîrbal romanên xwe yan bi zimanê erebî an jî bi zimanê serwer ê cihê lê dijîya binivîsandîya. Ji ber van jî romanên Ferhad Pîrbal sade malê Edebîyata Kurdî ye.

Herî dawî em dikarin bibêjin ku di berhemên Ferhad Pîrbal de, li dor rasteqîniya otorîte û civakî de gelek şopên bêcîwarîyê hene. Bi gel şopên bêcîwarîyê Ferhad Pîrbal gelek êş û azarên penaber û koçberên ji rojhilatanavîn û welatê xwe di berhemên xwe de anîye zimên. Her weha problemên takekesên bêcîwar û koçber bi şayesandinên derûnî bi awayekî baş daye ber çav. Ligel vê jî di berhemên xwe da komplîkeyên takekesî û civakî li gorî xwe geştiyandîye çarenûsekî rîzomî. Berhemên Ferhad Pîrbal bi vê alî ve şayanê gelek xebatên din e jî.

ÇAVKANÎ

Adorno, T. W. (2012). *Minima Moralia: Sakatlanmış Yaşamdan Yansımalar* (7. Aufl; O. Koçak & A. Doğukan, Çev.). İstanbul: Metis Yayınları.

Adsay, Fexrîya. (2014). “Bîrewerîyeke Birîndar: Bênavîya Welatekî û Bajarên Wî Di Romanên Firat Cewerî De Bîrewerîya Nivîskar û Rewşenbîrîyê”. *Wêje û Rexne*, (1), 152-161.

Ahmadzadeh, H. (2011). *Romana Kurdî û Nasname* (Çapa 1; Fahriye Adsay, Çev.). Beyoğlu, İstanbul: Avesta.

Ahmedzade, H. (2015). “Nasname û Ziman”. *Wêje û Rexne*, (4), 49-63.

Akay, A. (1996a). Sürgün Kimliği. İçinde F. Andaç (Ed.), *Sürgün Edebiyatı, Edebiyat Sürgünleri*. Bağlam.

Akay, A. (1996b). Yersizyurdsuzlaşma Üzerine. *Toplum Bilim Dergisi Giles Deleuze Özel Sayısı*, (5), 19-21.

Alan, R. (2013). *Folklor û Roman: Li dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn* (Çapa yekem). Stenbol: Peywend.

Alan, R. (2019). *Keşkûl: 2010-2019* (Çapa yekem). Zeytinburnu, İstanbul: Peywend.

Albay, N. (2020). Cervantes’in Don Kişot’unda ve Yaşar Kemal’in Dağın Öte Yüzü adlı Üçlemesinde Hayalgücünün Rolü. *Uluslararası İnsan Çalışmaları Dergisi*, (6), 270-282.

Aliçavuşoğlu, E. (2012). Psikanaliz, Freud ve Sanat. *Sanat Tarihi Yıllığı*, (20), 1-16.

Altıngezer, F. (2011). Sürgün ve Sürgünde Travmatik Olan. *Sürgün ve Psikanaliz*, 77-92. İstanbul: Bağlam.

Alver, K. (2006). Edebiyat ve Kimlik. *Bilgi Sosyal Bilimler Dergisi*, (2), 32-43.

Andaç, F. (1996). Sürgün Sözlernin Anlamı. İçinde F. Andaç (Ed.), *Sürgün Edebiyatı ve Edebiyat Sürgünleri* (ss. 11-18). İstanbul: Bağlam.

Anık, M. (2020). An Analysis of the Sociology of Literature on Don Quixote in the Context of Its Emphasis on Modern Individual and Reader. *Uluslararası Kibris Universitesi Fen-Edebiyat Fakultesi*, 26(104), 919-933.

Aytaş, M., & Ulutaş, S. (2021). An Analysis On The Film “A Tale Of Three Sisters” Within The Framework Of Home And Deterritorialisation. *Idil Journal of Art and Language*, 10(77), 53-62.

Barkin, E. (2014). 1951 Tarihli Mülteciliğin Önlenmesi Sözleşmesi. *Ankara Barosu Dergisi*, (1), 331-360.

Bauman, Z. (2018). *Kapımızdak, Yabancılar* (E. Borca, Çev.). İstanbul: Ayrinti.

Baydar, O. (1996). Yazmaya Sürgünde Başlamak. İçinde F. Andaç (Ed.), *Sürgün Edebiyatı, Edebiyat Sürgünleri* (ss. 41-44). İstanbul: Bağlam.

Beber, Ö. (2010). Yok-Yer, Yersizleşme ve Yersizyurtsuzluk Kavramları Üzerine Bir Sorgulama. *İdealKent*, 2(3), 142-157.

Beter, Ö. (2006). *Sınırlar Ötesi Umutlar: Mülteci Çocuklar*. Ankara: Sabev.

Bilgin, N. (1995). *Kollektif Kimlik*. İstanbul: Sistem Yayıncılık.

Bingöl, C. (2018). Toplumsal Bellek, ‘Sürgün’ Ve Belgesel Sinema. *Asya Studies*, 4(4), 51-57.

Bogue, B. (1996). Örnek Bir Okuma Parçası Kafka’nın Köksapsal Yazı Makinası (N. A. Şüküroğlu, Çev.). *Toplum Bilim Dergisi Giles Deleuze Özel Sayısı*, (5), 121-128.

Braidotti, R. (1996). Nomadism with a difference: Deleuze’s Legacy in a Feminist Perspective. *Man and World*, 29(3), 305-314.

Cervantes, M. S. (2019). *La Mancha’lı Yaratıcı Asilzade Don Quijode* (28.Baskı; R. Hakmen, Çev.). İstanbul: YKY yayınları.

Cortazar, J. (1996). Sürgünlüğün Bin Yüzü. İçinde F. Andaç (Ed.), & N. Işık (Çev.), *Sürgün Edebiyatı, Edebiyat Sürgünleri* (ss. 21-24). İstanbul: Bağlam.

Çalışkan, A. (2015). Edebiyat Estetiği Ve Edebiyat Uygulaması (II). *Studies of The Ottoman Domain (Osmanlı Hakimiyet Sahası Çalışmaları)*, 5(9), 1-29.

- Çörekçioğlu, H. (2016). *Deleuze: Yaşamla İlişkisinde Felsefe ve Edebiyat* (H. Akyüz, Ed.). İstanbul: Minör Yayınları.
- Deleuze, Gilles, & Felix, G. (1996). Uygar Kapitalist Makîna (D. Fırat, Çev.). *Toplum Bilim Dergisi Gilles Deleuze Özel Sayısı*, (5), 81-85.
- Deleuze, Gilles. (2005). *Perikles ve Verdi: François Chatelet'nin felsefesi* (A. Akay, Çev.). İstanbul: Bağlam Yayınları.
- Deleuze, Gilles. (2011). *Spinoza, Pratik Felsefe* (U. Baker & A. Nahum, Çev.). İstanbul: Norgunk Yayıncılık.
- Deleuze, Gilles. (2014). *Anti-ödipus: Kapitalizm ve sizofreni*. Ankara: Bilim ve Sosyalizm.
- Deleuze, Gilles, & Felix, G. (2014). *Anti-ödipus: Kapitalizm ve sizofreni* (F. Ege, H. Erdoğan, & M. Yiğitalp, Çev.). Ankara: Bilim ve Sosyalizm.
- Deleuze, Gilles, & Guattari, F. (2015). *Kafka: Minor Bir Edebiyat İçin* (I. Ergüden, Çev.). İstanbul: Dadalus.
- Deleuze, Gilles, Guattari, F., & Ilgaz, T. (2001). *Felsefe Nedir?* İstanbul: YKY.
- Deleuze, Gilles, & Parnet, C. (1990). *Diyaloglar* (A. Akay, Çev.). İstanbul: Bağlam.
- Descamps, C., Eribon, D., & Maggiori, R. (1996). Bin Yayla Üzerine (K. M. Orağlı, Çev.). *Toplum Bilim Dergisi Gilles Deleuze Özel Sayısı*, (5), 95-100.
- Doğan, H. M. (1996). Sürgündeki Dil. İçinde F. Andaç (Ed.), *Sürgün Edebiyatı, Edebiyat Sürgünleri* (ss. 29-35). İstanbul: Bağlam.
- Ekici, S., & Tuncel, G. (2016). Göç ve İnsan. *Birey ve Toplum Sosyal Bilimler Dergisi*, 5(1), 9-22.
- Eren, G. (2011). Edward Said: Yersiz Yurtsuz Bir Kimlik Arkasındaki Sürgün. *Edward Said*, (19), 12.
- Erkan, Ü. (2019). Gilles Deleuze Felsefesinde Temel Kavramlar ve Yeni Toplumsal Hareketler. *OPUS International Journal of Society Researches*, 13(19), 2627-2652. <https://doi.org/10.26466/opus.589030>

Ertuř, A. (2022). “Namık kemal’in İntibah Romanında Othello Sendromu”. *Uluslararası Anadolu Sosyal Bilimler Dergisi*, 6(1), 178-195.

Fox, R. (2019). *Roman Ve Halk* (1. basım; F. B. Aydar, Çev.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Galip, Ö. (2014). Serpêhatîyên Bêcihûwarbûnê: Di rabêja Romana Kurdî da Weke “Warê Demkî” Dîyaspora. (O. Delîkaya, Çev.). *Wêje û Rexne*, (1), 143-151.

Gazagnadau, D. (1996). Deleuze ve Göçebeler (A. Akay, Çev.). *Toplumbilim Deleuze Özel Sayısı*, (5), 61-62.

Gilles, D. (1996). Göçebe Düşünce (A. Kayhan, Çev.). *Toplum Bilim Dergisi Gilles Deleuze Özel Sayısı*, (5), 63-67.

Goodchild, P. (2005). *Deleuze & Guattari: Arzu Politikasına Giriş* (R. G. Öğdül G. Rahmi, Çev.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Guattari, F., & Deleuze, G. (1990). *Kapitalizm ve sizofreni 1-2: Bin Yayla : Göçebebilimi İncelemesi : Savas Makinası* (Akay, Ali, Çev.). İstanbul: Bağlam.

Gürsel, N. (1996). Sürgün ve Yazın. İçinde F. Andaç (Ed.), *Sürgün Edebiyatı, Edebiyat Sürgünleri* (ss. 29-31). İstanbul: Bağlam.

Hatıplı, M., & Daşkıran, S. (2021). Etkileri ve Sosyo-Psikolojik Boyutuyla Göç. *Sosyal Bilimler Araştırma Dergisi*, 10(3), 714-728.

Holland, E. W. (2005). *Gilles Deleuze’de Toplum ve Denetim* (1. bs; B. Başaran, Çev.). İstanbul: Bağlam Yayınları.

Kaplan, İ. (2019). *Kurdish Writers In Turkish: A Case Of Minor Literature* (İstanbul Şehir Üniversitesi). İstanbul Şehir Üniversitesi, İstanbul Şehir Üniversitesi / Sosyal Bilimler Enstitüsü / Kültürel Çalışmalar Ana Bilim Dalı.

Geliş tarihi gönderen

https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/tezDetay.jsp?id=ocivPtfYzgXu4697DQIU7w&no=JyqZ-b_eKE7xipKSvHWvow

Kara, O. E. (2019). *Yapabileceğimizi Yapmak: Minör Siyaset ve Türkiye Örneği* (1. baskı). İstanbul: İletişim Yayınları.

Karaca, B. (1996). Rus Edebîyatında Sürgün Motifleri Ve Sürgün Yazarlar. İçinde F. Andaç (Ed.), *Sürgün Edebiyatı Ve Edebiyat Sürgünleri* (ss. 181-188). İstanbul: Bağlam.

Kaya, M. (2020). Türkiye'deki Suriyeli Mülteci Gruplara Yönelik Şiddet. *Türkiye İnsan Hakları ve Eşitlik Kurumu Akademik Dergisi*, (4-5), 231-243.

Kenan, S. (2003). Edward W. Said. *İslam Araştırmaları Dergisi*, (10), 171-177.

Kılıç, S. (2021). İn Deleuze and Guattari: What is The Minor Writing? From the Perspective of Difference and the Minor Literature. *Kare Special Issue*, (Special Issue), 133-149.

Kızılay, Ş. E. (2008). *Deleuze ve Guattari de Şizoanaliz ve Arzu* (Yüksek Lisans Tezi). Afyon Kocatepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Sosyoloji Anabilim Dalı, Afyonkarahisar.

Kornberger, M., Rhodes, C., & Boss, R. (2016). Deleuze ve Bukowski Sıradüzenin Öekileri: Örgütlenmemenin Rizomatiği. İçinde Erden Kosova (Çev.), *Giles Deleuze ve Amerîkan Edebîyatı* (ss. 7-34; Kitap Editörü C. Bukowski, W. Burroughs, & J. Kerouac). İstanbul: 6:45.

Kurt, M. (2020). Resimandina Penaberên Ji Surîyê Di Kovarên Karîkatûran de Yan jî " Ez Ya Din e ". *Kovara Derûnnasîyê Psychology Kurd*, (11), 46-52.

Küey, A. G. (2011). Sürgün Geçmeyen Zaman. *Uluslararası Psikanliz Buluşmaları*, 35-43. İstanbul: Bağlam.

Lee, E. S. (1966). A THEORY OF MIGRATION. *Demography*, (3), 47-57.

Lidar, V. (2021). Minör Edebiyat Perspektifinden Being There Romanı. *Littera Turca Journal of Turkish Language and Literature*, 7(4), 1427-1438. <https://doi.org/10.20322/littera.963625>

Luit, R. (1996). Sürgünlük Stratejisi. İçinde F. Andaç (Ed.), & A. Karaçoban (Çev.), *Sürgün Edebiyatı Edebiyat Sürgünleri* (ss. 67-70). İstanbul: Bağlam.

Maffesoli, M. (2011). *Göçebelik Üzerine İnisiyatik Başboşluk* (M. E. Keskin, Çev.). İstanbul: Bağlam Yayınları.

- Metin, H. (2021). Sürgünün Verdiği Oğul: Cemal Süreya. *Hars Akademi Uluslararası Hakemli Kültür Sanat Mimarlık Dergisi*, 4(8), 539-555.
- Moran, B. (2003). *Edebiyat Kuramları Ve Eleştiri* (9. Baskı). İstanbul: İletişim.
- Moran, B. (2017). *Edebiyat Kuramları Ve Eleştiri* (27. bs). İstanbul: İletişim.
- Mutluer, M. (2003). *Uluslararası Göçler ve Türkiye: Kuramsal Ve Ampirik Bir Alan Arastirmasi*. İstanbul: Çantay Yayınları.
- Neuamn, L. F. (1996). Sürgünde Entellektüeller. İçinde F. Andaç (Ed.), & Ü. Oskay (Çev.), *Sürgün Edebiyatı, Edebiyat Sürgünleri* (ss. 91-105). İstanbul: Bağlam.
- Odman, M. T. (2020). *Tarihsel Gelisim Sürecinde Güncelleştirilmiş Mülteci Hukuku (Dünya’da Ve Türkiye’de İlticanin Gelisim Süreci)*. Ankara: Yetkin.
- Özbay, E. (2020). A Postmodern Novel In the Light Of Deleuzian Nomadism: Sunset Park. *Sosyal Bilimler Dergisi*, 1(10), 252-261.
- Özcan, E., & Güneş, F. (2021). Deleuze Ve Guattari’de Dramatizasyondan Arzulama Makinelerine Öznellik Üretimi. *Sosyoloji Araştırmaları Dergisi*,
- Özdemir, O., Özdemir, P. G., Kadak, M. T., & Nasiroğlu, S. (2012). Kişilik Gelişimi. *Psikiyatride Güncel Yaklaşımlar*, 4(4), 566-589.
- Özer, I. (2004). *Kentlesme, Kentlilesme Ve Kentsel Degisme*. Bursa: Ekin Kitabevi.
- Özsari, M. (2016). Marksist Eleştiri. *Akademik Kaynak*, 4(7-8), 53-67.
- Papadaupolos, R. (2020). Tûrikê Koçberîyê (L. Turhan, Çev.). *Kovara Derûnnasîyê Psychology Kurd*, (11), 28-33.
- Pîrbal, F. (2012). *Hotel Europe* (Çapa 2.; B. Mistefa, Çev.). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Pîrbal, F. (2013). *Santiago De Compestela: Roman* (2013. bs; B. Mistefa, Çev.). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Pîrbal, F. (2014). *Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr* (Çapa yekem; Çetoyê Zêdo, Çev.). Beyoğlu, İstanbul: Avesta.

- Pirbal, F. (2015a). *Penaberekî Fransî li Kurdistanê* (Î. Farqîn, Çev.). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Pirbal, F. (2015b). *Reîs Remezan (Ekan* (1. bs; Ç. Zedo, Çev.). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Polat, L. (2019). *Çil Romanên Kurdî: Danasîn, Nirxandin, Şîrovekirin* (Çapa yekem). Van: Sîtav.
- Sağır, A. (2012). Sürgün Sosyolojisi Bağlamında Göçün Sosyo-Politiği: Sovyet Rusya Örneği. *Avrasya İncelemeleri Dergisi*, 1(1), 355-391.
- Said, W. E. (1996). Entellektüel Sürgün: Göçmenler ve Merjînaller. İçinde F. Andaç (Ed.), & B. Birkan (Çev.), *Sürgün edebiyatı, edebiyat sürgünleri* (1. basım). İstanbul: Bağlam.
- Sarilar, B. E. (2018). Türk Basınında, Ana Akım Medyada Mülteci/Sığınmacı Temsili. *Istanbul Aydın Üniversitesi Dergisi*, 10(1), 139-157.
- Sezen, Y. (2002). *Çagdaslasma—Yabancilasma ve kimlik*. İstanbul: Ragbet.
- Sezer, M. (2020). Destpêka Romana Kurdî; Panoramaya Romana Êwra Kavkazê. İçinde M. Z. Ertekîn & M. Yıldırımçakar (Ed.), *Destpêka Romana Kurdî Gotarên li ser Romana Êwra Kavkazê* (1. Baskı, ss. 23-48). Wan: Weşanên Peywend.
- Shamilov, A. (2009). *Şivanê Kurmanca: Roman* (Çapa 1; M. Aydoğan, Çev.). Yenişehir, Diyarbakır: Lîs Basın-Yayın.
- Solmaz, M. (2019). Reich, Deleuze & Guattari ve Lyotard'ın Arzu Anlayışlarından Hareketle Kapitalizm ve Arzu İlişkisi The Relationship of Capitalism and Desire with Reference to Desire Understandings of Reich, Deleuze & Guattari and Lyotard. *Gaziantep University Journal of Social Sciences*, 18(1), 140-161.
- Sökmen, M. G., Said, E. W., Ertür, B., & Heinrich-Böll-Stiftung (Ed.), şahiner, D., & Ertekin (Çev.). (2010). *Edward W. Said anısına: Barbarları beklerken* (1. basım). İstanbul: Metis Yayınları.
- Şêr, F. (2014). Cihwarekî Estetîk: Tuwalet. *Wêje û Rexne*, (1), 182-195.

Tepealtı, F. (2019). Avrupa Birliği'ne Yönelik Türkiye Geçişli (Transit) Göç Hareketleri Ve Türkiye'nin Düzensiz Göçle Mücadelesi. *Doğu Coğrafya Dergisi*, 24(41), 125-140.

Tilêrmanî, Y. (2021). *Li Ser Sansûr û Sirgûnê Bi Yaqob Tilêrmanî Ra Hevpeyvîn* (S. Ay) [Mal].

Timur, K. (2017). Bilinmez Diyarın Garîb Misafiri: Sürgün Ve Bireye Etkisi. *Hikmet - Akademik Edebiyat Dergisi*, (7), 26-34.

Turna, M. (2020). Hayvan Çiftliği Romanında Alegori. *Edebi Eleştiri Dergisi*, 4(1), 38-57.

Uzun, M. (1996). Bir Hüzündür Ayrılık. İçinde F. Andaç (Ed.), *Sürgün edebiyatı, edebiyat sürgünleri* (1. basım, ss. 49-58). İstanbul: Bağlam.

Wacquant, L. (2019). Sürgün Bölgelerini Yeniden Düşünmek: İleri Marjinalliğin Teşkilinde Sınıf, Etnisite ve Devlet (A. Akçaoğlu, Çev.). *İDEALKENT*, 10(26), 128-145.

Yardimcioğlu, M., & Kaplan, M. (2018). Capitalism And Schizophrenia: Deleuze And Guattari. *G. Ü. İslâhiye İİBF Uluslararası E-Dergi*, 2(2), 77-87.

Yıldız, S. (2020). *Hevpeyvîn bi Saîfîye Yıldız re.* (N. Nine; A. Akan, Çev.) [Elmanya].

Yûsiv, H. (2011). *Romana Kurdî: (Kurmancî û Zazakî), 1930-2010* (Çapa 1). Yenişehir, Diyarbakır: Ronahî.

JÎNENÎGARÎ

Agahîyên şexsê wî:

Nav û Paşnav: Mekî AĞDAL

Aidîyet : T:C

Perwerdehî: Beşa ku lê Xwendî **Sala jê Derçûyî**

Lîsans

Ziman û Edebîyata Kurdî

2018





VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



10/08/2022

Tez Başlığı / Konusu

DÎ ROMANÊN FERHAD PÎRBAL DE ŞOPÊN BÊCÎWARÎYÊ

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 123 sayfalık kısmına ilişkin, 10/08/2022 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından %5 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 5 (Yüzde beş) dur.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi inceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

10/08/2022

Meki AĞDAL

Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Meki AĞDAL

Öğrenci No :19950001001

Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Programı : Örgün Eğitim

Statüsü : Y. Lisans X

Doktora ☐

DANIŞMAN

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

10/08/2022

**ENSTİTÜ ONAYI
UYGUNDUR**

.../.../2022

Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Enstitü Müdürü